# Mehmed Uzun

## ROJEK Jİ ROJÊN EVDALÊ ZEYNİKÊ



# ROJEK Jİ ROJÊN EVDALÊ ZEYNİKÊ

ROMAN

***Mehmed Uzun***

Mehmed Uzun,
berhemên wî yên çapbûyî;

Roman
* TU 1985
* MIRINA KALEKÎ RIND 1987
* SIYA EVÎNÊ 1989

Werger
* ZIMANÊ ÇIYA - Harold Pinter 1990

# ROJEK Jİ ROJÊN EVDALÊ ZEYNİKÊ

ROMAN

***Mehmed Uzun***

**WEŞANÊN WELAT**

**Stockholm 1991**

Weşan: 7
ROJEK JI ROJÊN EVDALÊ ZEYNIKÊ
Çapa Yekem

© Mehmed Uzun
Pergela berg û rûpelan: Apec-Tryck
Wêneyê berga pêşîn: Rebwar Said
ISBN: 91-971254-5-8

*Xanî ji kemalî bêkemalî*
*Meydana kemalî dîte xalî*
*Hasil ji înad eger ji bêdad*
*Ev bidhet e ger xilafî mi'tad*
*Safî şemirand vexwar dirdî*
*Manendî derî lisani kurdî*
*Înaye nizam û întizamê*
*Keşaye cefa ji boyî amê*
*Da xelk nebêjitin ku ekrad*
*Bê me'rifet in bê esl û binyad*
*Enwa'î milet xudan kitêb in*
*Kurmanc bi tenê di bê hesêb in*
*Hem ehlî nezer nebên ku Kurmanc*
*Eşq nekirin ji bo xwe amanc*
*Têk da ne di talib in ne metlûb*
*Vêk ra ne mihib bin ew ne mehbûb*
*Bêbehre ne ew ji eşqbazî*
*Farix ji heqîqî û mecazî*
*Kurmanc ne pir di bê kemal in*
*Em-ma di yetîm û bê mecal in*
*Filcimle ne cahil û nezan in*
*Belkî di sefîl û bê xudan in*

EHMEDÊ XANÎ

*Ji bo bîranîna Dr. Nureddin Zaza*
*û*
*Dr. Abdulrehman Qasimlû*

## GOTİNA MİN

Navê min Ehmed e. Ehmedê Ferman. Ehmedê Fermanê Kîkî. Yanî Ehmed navê min e. Ferman hem paşnav hem jî siûda min e. Kîkî jî ji Kîkan tê, navê eşîra min e. Hin navên min ên din jî hene; dengbêjê kovarê, stranvanê Hawarê û h.w.d...

Heta carina ji bo min weha jî tê gotin; "dengbêjê me yê delal, kalemêrê Kîkan, roniya çavan, îxtiyarê civatan, berdevkê maqûl û axan û berdilê ciwan û xortan..."

Gava meriv zarşêrîn be û bixwaze dilê yekî xweş bike, gotin û qise pir in.

Belê, rast e; ez dengbêj û stranvan im. Ji stran, kilam, çîrok, mesele, serpêhatî û gotinan pê ve, ez bi kêrî tu tiştî nayêm. Gotin jîna min e. Gava ez hatim dinê û bi tiştan hesiyam, tiştê yekemîn car bi ber guhê min ket, lorîna diya min bû. Qewlê min ê mirinê jî weha ye; eger Yezdanê pak û dilovan mirineke pak nasîbê min bike, ez dil dikim ku dengbêjekî dengxweş û xwedî adet û ûsil li ber serê min rûne û lorîna diya min bi min biguhezîne.

Di vê jîna xwe ya dirêj de, min her celeb kirêtî û xirabî dîtin. Her celeb tofan û nisûbetî ket pêsîra

me kurdan û bû siya me. Mirin, kuştin, şewat, nalîn, qîrîn û hawar bûn nan û ava me. Welatê me bû xirbe û kavil. Xwedayo... niha ew çiya, zozan, deşt, şikeft, bajar û gundên welatê Kurdistanê bikaribûna bipeyiviyana û serpêhatiyên xwe bigotina! Hey lê gidî... wan çi dîtin, çi nedîtin!.. Hema meriv çavê xwe li van bûyerên 34 salên dawîn bigerîne... ji 1900'î û vir ve, ji nîv milyonî bêtir kurd hatin kuştin. U welatê kurdan bû çar parçe. Şerê malkambax ê cîhanê bi sed hezaran kurd birin gorê. Di serîhildanên kurdan ên 1925, 1927-28, 1930 an de jî, dîsan, bi deh hezaran kurd serê xwe danîn. Ba û bahozên mirinê bi ser welatê kurdan de hat. Welatê kurdan bû warê Ruhistîn. Herçî Yezdanê mezin e, wî jî rû ji kurdan bada... Û ez... Tevî kurdan fermana min jî rabû û ez ketim ber pêla xerîbiyê. Ferman, xerîbî û hesret bûn navê min, qedera min.

Ez niha li vir, li welatê xerîbiyê, li Şamê, rûniştime û li hal û hewalê xwe difikirim. Hay lo, li min gidiyo hay... Eger ev gotinên kurdî nebûna, min ê çi bikira? Ma eger jîna min bi stran, kilam, dîlan û gotinên kurdî nehatiba risandin, ez ê nebûma dîn û neketima çolan?.. Ew nan û ava min in, heval û hogirên min in, yara min in. Ew her tiştê min in. Ji wan pê ve tu kesê min tune.

Ew bûne stariya min, welatê min.

Lê hûn werin ji min rebenê Xwedê bipirsin ka çi bi serê qise û gotina şêrîn a kurdî hatiye. Ew îro bûne qedexe. Iro li Tirkiyê kesên ku bi kurdî dipeyivin, tên cezakirin. Ceza gotineke kurdî qurişekî ye. Du gotin, du quriş, sê gotin sê quriş... Hey gidî dinya malkambax hey!.

Lê li milê din jî kêfa min tê ku ez îro ne li Kurdistanê me. Ez bi tirkî nizanim û tûrikê min tijî gotinên kurdî ye. Min ê çawan hewqas ceza bida?

Mal û milkên beg û mîran jî dê têra cezayên min nekira... Bi xêra Xwedê ku ez ne li wir im.

Belê, ez niha li Şamê me. Li taxa Muhacirîn, li mala Mîr Celadet Bedirxan. Iro ji rojan yekşemb e. Meh nîsan e, sal 1934 e. Dinya germ e. Biharê dest pê kiriye. Min jî xwe daye beroşkê. Kursiyeke hûrik jî li ber min e û ez di deftereke hûrik de van rêzan dinivîsim.

Ez rebenê Xwedê û nivisîn!..

Hûn ê niha bipirsin ka Mîr Celadet Bedirxan kî ye? Mîr Celadet heye û birayê wî yê biçûk Mîr Kamiran heye. Her du jî du mêrên qenc, zilamên xurt û têgihîştî, merivên pak û dilovan in. Ew ji mala Ezîzan, ji malbata mîrên Cizîra Botan in. Ew kurên Emîn Alî Begê Bedirxanî û neviyên mîrê dawîn ê Cizîra Botan, Mîr Bedirxan in. Herwekî bav û kalên xwe, dilê wan jî bi miletperwerî û welatevîniya kurdî hildavê. Wan dane ser şopa bav û kalên xwe û ew li pey heq û hiqûqên kurdan in. Li milekî ew di nav tevgera siyasî de ne û li milekî jî ew bi kar û xebata ziman û edebiyata kurdî rabûne. Ew jî bêgav mane û ketine welatê xerîbiyê û niha li Şamê dijîn.

Çima ez qala van merivên mêrxas û yekta dikim? Ji ber ku siûda min û wan bûye yek. Em bûne şirîkê qedereké. Em bi hev re bûne malek. Ez bê wan nabim. Ew jî, carina, bê min. Ew bûne lawên min. Ew bûne bavê min. Ez li mala Celadet Beg dijîm. Ez û ew û xezaleke delal û çar kewên ribat û celab û du tahjiyên no û bi hezaran kitêbên wî, bi hev re, dijîn. Pir caran stran, dîlan û çîrokên min jî dibin hevalên me. U li gora qewlê mêrê qenc, heta mirinê, em ê li cem hev bin. U ez li vê derê jî dibêjim; min ji Yezdanê dilovan tikayek jî heye, ne bi dû wan re, lê berê wan, ez serê xwe dayinim diyarê rehmetê, axa gorê.

Eger Xwedê quwet û taqetê bide min, ez ê rojekê behsa xwe û serpêhatiyên xwe jî bikim. Lê ne niha. Niha min bi hênceta Evdalê Zeynikê rahiştiye qelemê. Ez ê behsa Evdalê Zeynikê û çîroka wî bikim. Eger ji min were...

Min dengbêjiya hin mîr, beg û paşayên kurdan kiriye. Dengê stran, tembûr û bilûra min û gotina kurdî şevên wan dineqişandin. Stran û dîlanê reng dida qesr, qonax û koşkên wan. Digel meclîs û odên van qesr û koşkên bi mîs û ember, min zêrzemînên wan jî dîtine. Li wan deran zîndanên tarî hene. Xwedê merivan ji wan zîndanên sar û genî star bike, lê belê, ez divê li xwe mikur jî werim; strana delaltirîn û baştirîn a zîndanan e. Ew li ber dilê min pir ezîz in.

Axir... ew dewr û dewran bihurîn. Şerê cîhanê mîna hûtekî bi ser serê me de hat û nefes li me çikand. Paşê jî pişta welatê kurdan hat şikandin û dijminan ew kirin çar perçe. Çar perçên ku her nexweş in û êdî bi zehmetî sax dibin. Bi dû vê kirêtiyê jî, dijminê kurdan navê kurd û Kurdistanê ji defteran derxistin û welat kirin wêran. Hingê min ê evdalê Xwedê çi bikira? Ez ne şervanekî bûm ku min rahişta tifinga xwe û bikaribûya bi ser warên eskerên dijmin de bigirta. Ez ne alîm û zanayekî bûm ku rahiştima qelema xwe û dinê bi hal û hewalê kurdan bihesanda. Ez ne mîr, beg, axa û şêx bûm ku min xelk li dora xwe bicivanda û bi karê siyasî rabûma. Ez dengbêjekî reben bûm. Ma ji destê dengbêjekî pêncperan çi tê? Ji bilûr û stranên min pê ve, tu tiştekî min tune bû. Min ew hildan û pişta xwe da feleka kambax û berê xwe da oxirê. Ez çûm gundên asê ku xwe li quntar û kendalên asê veşartibûn. Min li wir reşa xwe girêda û xwe spart stranan. Stran bûn lehî. Ew bûn berfende. Stranên

kevn stranên nû welidandin. Her bûyer û her şehîd bû qehremanê straneke nû.

Dengê bilûrê û stranan di spêda rojan û serê çiyan de olan didan.

Rojekê ciwanmêrekî gir û bi qelafet hat gundê ku ez lê dimam. Ew li pey min bû. Wî şopa min hildabû û hatibû gund û ji min dixwest ku ez pê re herim. Ew ji riya dûr hatibû, ji Şamê... Wî weha digot,

- Stran û çîrokên kurdî heyîn û dewlemendiya me ya herî mezin e. Heyam diguherin. Heke em lê xwedî dernekevin, ew ê winda bibin, ew divê bikevin defteran.

Belê wî dixwest ku em bi hev re, berê xwe bidin Şamê, herin û li wir heyîn û dewlemendiya xwe têxin defteran.

Ma kî dixwaze ji risqê xwe bibe? Ma kî dixwaze umrê xwe bike hîç û pûç? Stranên min umir û risqê min bûn. Hingê min ji kesekî re negot, lê min jî dixwest ku stranên min bibûna nemird. Pir kêfa min hat ku merivekî weha têgihîştî, qedirnas û qedirgiran qedr û qîmetê dide min, umir û risqê min. Min da pey wî û em hatin Şamê. Ji wê rojê û vir ve ye, ez, dengbêjê mîr û began, bûme dengbêjê zana û alîmekî.

Texmîna we rast e, ew ciwanmêr Mîr Celadet bû.

Berî niha bi du salan, wî dest bi weşandina kovarekê kir. Navê kovarê Hawar e û ew xwerû bi zimanê kurdî ye. Bi xêra wî, zimanê me yê şêrîn dikeve defter û kitêban. Ew dibêje, "HAWAR kursiya milet e, herkes dikare hilkişe ser û gotina xwe bêje." Hema çi bigire ji bo her hejmarî, ez jî hildikişim ser kursiya milet û gotina xwe dibêjim. Ev mêrê qenc qewlê xwe bi cîh tîne û stranên me dixe defter û kitêban.

Berî niha bi çend saetan, ew hatibû malê. Wî hejmara nû ya kovarê, bi xwe re, anîbû, hejmara 24-an. Ma hûn dizanin di vê hejmara nû de çi heye? Tê de, li kêleka "Çarînên Xeyam", strana "Delalê Beriyê" heye. Li bin sernivîsa stranê jî weha hatiye nivisîn; "ji devê Ehmedê Fermanê Kîkî..." Delalê Beriyê... yek ji wan stranên ku li ber dilê min pir ezîz e...

*"Hay lo dilo!..*
*Umrê dilê min pê re, de bajo*
*Vê êvarê min rebenê..."*

Ew hate malê, me bi hev re qahweyek vexwar û em dîsan li ser Evdalê Zeynikê peyivîn. Ew û birayê wî Mîr Kamiran dev ji min bernadin. Birayê wî jî alîmekî bi dilê we ye. Ew jî bi pênc-şeş zimanan dinivîse û ruhê xwe yê xemgîn dide ber hûnikahiya stranan. Pir caran, em hersê, bi hev re, rûdinin û heta stêrika sibê Gelavêj ji me xatir dixwaze, li ser stranên kurdî dixebitin. Hûn dibînin... ez jî niha mîna wan dipeyivim û dibêjim "dixebitin..." Yanî ez dibêjim û ew jî gotinên min diguhezînin ser kaxizan. Ez carina bi bilûrê, carina jî bi devkî dibêjim û pir caran jî stranan şerh dikim. Lê digel vê hindê, ev ked û westîn ne bi dilê wan e. Ew her dipirsin û dixwazin her tiştî, digel her celeb kit-kitê, bizanibin. Yanî ew bîhn li min diçikînin! Bi tenê gava Mîr Celadet tifinga xwe ya zîvhilî hildigire û dere nêçîra bet û xezalan û Mîr Kamiran jî, ji bo qesta felekê, dere Beyrûdê, hingê ez hinekî bîhna xwe berdidim. Lê piştî çend rojan, ew dîsan vedigerin. Hingê şev dîsan li me dibin heram. Dîlan û stran ronahiyê direşîne ser şevên tarî. Hingê heyv û stêrik jî dibin guhdarên stranan. Hewa û miqamên cihê dîsan li

pey hev tên. Stran li pey stranê, çîrok li pey çîrokê... Ew dibin rûbara biharê. Yanî di şevê de ronî diçirûsin.

Lê belê, ez divê rastiyê jî bibêjim, digel ku ez diwestim û pir caran eciz dibim, ji kêfa min re payan tune. Ez bi karê xwe radibim û alîm û zanayên miletê me jî qise û gotinên min, bi rûmet û rêzdariyeke bilind, dikin nemird.

Sed hemd û spas ji Yezdanê mezin re.

Lê niha wan serê min xistiye teşqeleyekî. Ew tiştekî ji min dixwazin ku ne îşê aqilan e. Heye ku we ji niha ve fahm kiriye ka ew ji min çi dixwazin... Ew ji min dixwazin ku ez qala Evdalê Zeynikê bikim. Ew ji min dixwazin ku ez çîroka pîrê dengbêjên kurdan Evdalê Zeynikê bibêjim. Ew dixwazin ku ez çîrokê tevî her kit-kitê bibêjim. U hûn dizanin, ew wekî din çi dixwazin? Belê, ew dixwazin ku ez çîrokê binivîsim û bavê stran û gotinên kurdî Evdalê Zeynikê ji nû ve vejînim!..

Ez evdalê Xwedê û vejandina Evdalê Zeynikê!

Ez dikim, nakim, ew dev ji min bernadin. Ew bûne pêtên agir û ketine pêsîra min, her û her pitepita wan e. Ma ez çi bibêjim? Ew zulmê li min dikin, bavo... Ez li wan vedigerim û bi qîrîn dibêjim,

- Lawo, ezbenî, dev ji min berdin. Herwekî ku me heta niha kiriye, vê çîrokê jî ez ji we re bibêjim, hûn binivîsin. Lawo nivisîn ji min nayê, ez hosteyê gotinê me. Ez dikarim bi gotinê dilên ku bûne goristan ji nû ve vejînim, dostan bidim kenîn, dijminan bidim girîn, agir û tofanê li ser serê nemerd û xiraban bibarînim... lê ez ketime tor û bextê we, min şerpeze mekin, ez ji hal û hewalê nivisînê tu tiştî fahm nakim. Stran kêfxweşiya min in, dîlan jî roniya çavê min. Feqet, ez bi edeb û terbiya niviskî

ranebûme. Ez nikarim bilûra xwe bikim qelem. Ez nikarim siya dengê xwe bireşînim ser kaxizan... Heyran, weha li min mekin.

Lê, ew li min guhdarî nakin. Her bi ken û pîqepîq, ew dibêjin,

- Ji te pê ve tu kes nikare bavê stranvan û dengbêjan Evdalê Zeynikê salix bide. Dengbêj ji hal û hewalê dengbêjan fahm dikin. Eger em niha rahêjin pênûsan û tiştên ku tu li ser Evdalê Zeynikê dibêjî, binivîsin, bila yeqîna te ji Xwedê be, Evdalê Zeynikê jî dê reng biguherîne û ew ê bibe wekî me, yekî ji me. Me heq tune ku em neheqiyê lê bikin. Ew ne mîna me bû. Ew merivê çax û heyama xwe bû. Kî dikare wê çax û heyamê, wî dengbêjê yekta li me vegerîne? Kî?.. Ne em, lê tu...

U do, wan defter û qelemeke nû anîn û danîn ber min û bi ken, bi hev re, weha gotin,

*Sala par vê çaxê, ez Evdalê Zeynikê bûm,*
*Ez şah'irê dinê bûm,*
*Şalûrê erdê bûm,*
*Bilbilê ber perê rojê bûm,*
*Dengbêjê mîrekî welatê kurdan bûm,*
*Di hidûdê Ecem de rûniştî bûm,*
*Mêrekî çê bûm, siwarê hespê bûm,*
*Aşiqê pelê Gulê bûm...*

Xwedayo... min ê çi bigota?

Hawar, hawara Evdalê Zeynikê bi xwe bû. Deng, dengê wî bû. Ez bêgav mam, min bi hêdîka, bêdeng, defter û qelem ji wan wergirtin. Çare nîn bû. Dewsa bilûrê, min ê niha rahişta qelemê... Wan weha digotin,

- Ma gotin ne her û her gotin e? Çi niviskî, çi devkî? Herwekî tu dibêjî, tu dê welê jî binivîsî.

Rast e, gotin her gotin e. Digel vê hindê jî, bi ya min, qiseyên nivîskî û devkî ji hevûdu cihê ne. Ez nizanim ka ez çawan bûm dengbêj, çawan bûm hosteyê stran û kilaman. Ji roja ku min hay ji xwe heye û vir ve, ez dengbêj im. Ez nizanim ka gotin ji kû tên û çawan ew li pey hev, mîna yaqût û lûleyan, rêz dibin û diçirûsin. Ez dikarim niha rûnim û bi rojan ji we re bistrêm. Lê herçî nivisîn e, ew dûrî min e. Qayide, şert û awayên wê cihê ne... Gava ez niha van rêzan dinivîsim, bi tenê Xwedê dizane, ez çi eza û cefayê dixwim. Ez li ser her gotinê bîskeke dirêj difikirim û paşê dinivîsim. Welê dixuye, nivisîn jî mîna zêrkeriyê ye. Jê re wext, sebir û hunermendiya zêringerekî divê.

Bavê min ê rehmetî her gav digot; gerek her teyr bi refê xwe re bifire. Dengbêj bi dengbêjan re, nivîskar bi nivîskaran re. Lê mîrên min vê yekê qebûl nakin. Ew niha kirasê nivîskariyê jî li min dikin. Ez dizanim, ev kiras ê li min neyê û ez ê pir çewtiyan bikim û peyv û gotin ê, mîna stranê, neherikin. Ji lewre, hûn divê li min û kêmaniyên min negirin.

Min çavên xwe bi stranên Evdalê Zeynikê vekirin, bavê min ew her gav ji min re digotin. Car bi car. Ma li welatê kurdan kîjan dengbêj bi stran û çîroka Evdalê Zeynikê mezin nebûye? Evdal pîr û mîrê me dengbêjên kurdan e. Ji alîkî ve ev yeka û ji aliyê din jî, ez ji Mîr Celadet û Mîr Kamiran pir hez dikim û ez dizanim, daxwaz û niyeta wan qenc e. Loma heta ji min were, ez ê hewl bidim û bixwazim dengê Evdalê Zeynikê biguhezînim we.

Çima ez niha van rêzan dinivîsim? Ev jî, dîsan, li ser daxwaza wan e. Piştî ku min defter û qelem wergirtin, ez çûm û li quncikekî rûniştim. Qelem di destê min de, ez bi qasî çend saetan fikirîm û paşê

min dest bi çîroka Evdalê Zeynikê kir û rêza xwe ya yekemîn weha nivisî; "wê rojê her tişt bi misteke ronahî û bi dengekî zelal dest pê kir..." Lê, ev jî ne bi dilê mîrên me bû! Wan weha gotin,

- Apê delal, berî ku tu dest bi vejandina Evdalê Zeynikê dikî, divê tu gotina xwe jî bibêjî da ku xwendevanên me yên ezîz bizanibin ku te ew nivisiye.

Gelo we niha fahm kir çima ez bi van gotinên xwe yên nehêja we eciz dikim? Lê, ez ê êdî we zêde eciz nekim. Piştî çend qisên din, em ê vê behsê bibirin.

Çawan min got, min navê Evdalê Zeynikê cara yekemîn ji bavê xwe bihîst. Berî niha, hema hûn bibêjin, bi şêst salan. Bavê min şivan û bilûrvanekî yekta bû. Gava me pez di deşt û zozanan de diçêrandin, wî bi awaza Evdalê Zeynikê zinar dihelandin. Wî deng, awaz, stran û çîroka Evdalê Zeynikê guhezand min û ez jî wan diguhezînim we. Tê de tiştine hene ku bavê min lê zêde kirine û tiştine hene ku min lê zêde kirine... Ma jixwe gotin, stran û mesele ne wekî ava Firat û Dîjlê ne ku di kahniyê de teng û hûr in, lê belê peyderpey kûr û fireh dibin û bi coş diherikin?..

Em dengbêj hevûdu dinasin. Em mîna malbatekê ne. Evdalê Zeynikê bav û pîrê me ye. Em wî jî dinasin. Lê, herçend em wî dinasin, ewçend jî em wî nas nakin. Ew di wext û heyama xwe de dijiya, herwekî me, dixwar, vedixwar, digot, hez dikir... her tiştê ku meriv dike, dikir. Herçî îro ye, ew bûye efsane û li ser zimanê me ye. Ji lewre, gotinên ku em davêjin serê, heye ku bi tenê perçeyekî biçûk ji jiyan, dewr û dewrana wî be. U tiştên ku em lê zêde dikin, di esasê xwe de, hal û hewalê me bi xwe be, ne yê Evdalê Zeynikê... Gotina min a dawîn ev e; umrê

çûyî venagere, risqê çûyî nayê dewsê, dewr û dewrana bihurî bi eynî rengî li me venagere, awaz û olana dengê windabûyî rengareng e.

Ez ê bi dengê xwe bang li dengê Evdalê Zeynikê bikim û rojekê ji jiyana wî li me vegerînim. Belê, bi tenê rojekê. Mixabin, zêdetirê rojekê ji min nayê. Di vê payiza umrê min de, min ne teqet û ne jî keramet heye ku ez bikaribim ji rojekê zêdetir lêkim.

Em ê niha gotina xwe li vir bihêlin û bên cem Evdalê Zeynikê, bavê deng û dengbêj, stran û stranvanên kurd...

# BERBANG

# 1
# Sîpanê Xelatê

Wê rojê her tişt bi misteke ronahî û bi dengekî zelal dest pê kir. Roj, rojek ji rojên Xwedê bû û ji ser Newroza biharê, 21'ê adarê re, 40 roj derbas bûbûn.

Stêrik hê neçûbûn ava. Stêrka sibê Gelawêj diçirûsî. Tava royê hê xwe nedabû xuyan. Lê ji dûr ve, şewqa çend tîrêjên tavê xwe diqulipandin ser serê çiyayê Sîpanê Xelatê û dibiriqîn. Belê, li wê derê Sîpanê Xelatê hebû, çiyayê dostê ewr û ezmanan, serî bi mij û dûman, warê dilketî û evîndaran, şêr û pilingan, stariya keserkûr û bextreşan... Li jorê Sîpanê Xelatê, teyrên eylo û baz difirîn û didan perwazan, li jêrê jî, çem û av û golên Mirad û Firad û Wanê diherikîn û pêl didan.

Dinya bêdeng û sakîn, esman bêewr û zelal bû. Ji xuşexuşa avê û gufegufa sivik a bayê sibê pê ve, tu deng tune bû. Ji wê bêdengî û aramiyê beyan bû ku roj ê bibûya rojeke yekta, bibûya sebebê stran û meselên nû û biketa devê dengbêj û stranvanan.

Lê belê, ew ê çi biqewimiya? Çêyî, rindî, xweşî û dilşadiyê zora neçêyî, nerindî, nexweşî, êş û keseran bibira? Yan jî, ji bervajiyê, êş, jan, keser û derd

ê bibûna du qat û meraq û hesreta dilan ê bibûya kozeke agir û biketa pêsîra merivan? Yan ji çêyî û neçêyî, rindî û nerindî, xweşî û nexweşî, kêf û keser, henek û derd ê biketana nav hev û wekî hêlekanan li ser dilê merivên qenc biçûna û bihatana?

Gelo wê rojê dê çi biqewimiya?

Em niha bi vê yekê nizanin. Em ê lê binihêrin û pê re, bi çîroka xwe re herin û bibînin ka riya mesele û çîroka me çi rûbarî me dike.

Lê belê, di berbanga wê roja Xwedê de, dengekî zelal li xuşexuşa avê û gufegufa bayê sibê zêde bû. Deng, dengê Evdalê Zeynikê bû ku bavê dengbêjan, kokimê civata kurdan û qehremanê vê çîrokê bû. Gava dengê Evdalê Zeynikê li dengê av û bayê zêde bû, dengê Evdal bêdengiya dinê û hawirdorê xira nekir. Ji bervajiyê, dengê Evdal bêdengiya dinê neqişand. Evdal merivê deng bû, ne bêdengiyê. Ew merivê stran, dîlan û govendê bû. Lê çaxa derd û keser lê dihatin xezebê, mîna berbanga wê rojê, bêdengiyeke boş di nav stran û kilamên wî re diherikîn.

Wekî her carî, wê rojê jî, ew berî teyr û rawirên Sîpanê Xelatê hişyar bû û weha deng da,

*Wey li min felekê,*
*Felekê, te çima li min weha kir?*
*Te kumê xwe li min xwar kir,*
*Korbûna Evdalê Zeynikê, kalbûna wî li dinê,*
*ji xwe re, feyde û kar kir.*

Guhdar û xwendevanên ezîz, we ji strana wî derxist, belê, Evdalê Zeynikê kor bû û jê re tu çare nîn bû. Berî wê rojê bi heft salan, rojekê ji rojên Xwedê, ava reş bi ser çavên wî de hatibû û ew ji şewq û ronahiya dinê bêpar mabû. Eger em bêkeys nekevin û

wext li me teng nebe, em ê vegerin ser korbûna wî. Lê ne niha.

Wê berbangê, ew rabû ser xwe, ji konê xwe derket û gopalê wî di destê wî de, li dora xwe nihêrî, bêyî ku tu tiştî bibîne. Li serê kiras û şalên dirêj û spî hebûn. Dinya hinekî hûnik bû. Rojeke ji rojên meha gulanê dest pê dikir. Kokimê kor, bi hêdîka, li ser kevirekî ku hinekî ji kon bi dûr bû, rûnişt û bi dengekî nizm dest bi stranê kir. Bi qasî bîskekê, heta jina wî Gulê ji kon derket û hat û destê xwe da pişta wî, wî hêdî bi hêdî deng li siûd û qedera xwe ya xirab kir. Gulê bi qasî hilmekê li ser serê wî sekinî û paşê, li kêlekê rûnişt. Wî dizanîbû, kesê ku hatiye û li cem wî rûniştiye, Gulê ye, dosta umrê dirêj, şirîka deng û gotina kurdî. Bêyî ku Evdal lê vegere, jê pirsî,

- Gula minê, mehrûmê... Ma tav li me hilatiye?

Wê jî, bi hêdîka, bersîv dayê,

- Evdalo, mehrûmo... tav hê li me hilnehatiye, lê xwezî te niha ev xweşiya dinê bidîta. Serê Sîpanê Xelatê bi mij û dûman e û reng bi reng e. Esman şîn, dar û ber hêşîn, av spî ye. Tîrêjên sor ku hiltên, qutiya dilê min germ dike. Roja gulanê û tav ji esmên û ji serê Sîpanê Xelatê, bi hêdîka, nêzîkî li me dikin. Dinya hişyar dibe.

- Gulê, zarşêrînê, dilê min pê re'yê... Ma ev roja xweşik ê çi bi me beyan bike? Ma xeberên ku dê ji riya dûr werin, xeberên xweş û rind nebin? Bira, halê Temo û Zînê çi ye? Zarokê wan hate dinê? Tu bûyî dapîr? U ka qulingê bextreş û bêçare li kû ye?

- Kokimo Evdalo, li ber dilê min ezîzo... Roj, roja Xwedê ye. Ji Rebbê Alemê hêvî nayê birîn. Li ser vî çiyayê Sîpanê Xelatê, gerek xelata rojeke weha zelal, xweş û rind jî xweşî û rindî be. Dilê min dibêje, îro, xweşî û rindî dê li me vegerin... Temo û

Zînê li konê xwe ne. Gelek pîrejin jî li wir, li ser serê Zînê ne. Zarokê wan hê nehatiye dinê, lê jê re pir wext nemaye. Herçî quling e, di binê kon de, li benda te ye.

Hêdî bi hêdî, kesên din jî ji konên xwe der- diketin û dihatin, li ser serê wan dicivîn. Evdal û Gulê ne bi tenê bûn. Bi tenê konê wan nehatibû vegirtin. Li dora wan pir kon û kesên din jî hebûn. Ew çiqas bûn? Kes bi vê yekê nizane. Hin dibêjin, ew bi sedan bûn, hin dibêjin, bi hezaran. Ew pir bûn û roj bi roj pirtir dibûn. Hemû welatê kurdan dizanîbû ku Evdalê Zeynikê berê xwe daye çiyayê Sîpanê Xelatê û xwe li sebr, hîkmet û qudreta wî girtiye.

Derdê Evdal derdekî xedar bû. Dilê wî bi kul, sebra umrê wî kal bû. Şagirt, berdevk, heval û dostên wî û xelkê welatê kurdan jî xwe li dengê wî girtibûn û hatibûn da ku bikaribin xwe bigihînin hawara wî.

Ew kor bû, lê derdê wî, kesera dilê wî ne bi tenê ev bû. Serpêhatiya zirkeça wî Meyro û dilketiyê bextreş û şagirtê Evdal Bengîn jî kuleke bêeman xistibûn dilê wî. U di ser de, derdê qulingê birîndar jî bûbû derdê wî. Roja Newroza şêrîn, wî berê xwe dabû Sîpanê Xelatê, warê Xecê û Siyabendê. Ji roja Newrozê û vir ve, ew ji çiyê daneketibû jêr. Wî û kesên din konên xwe, bi awayekî peregende, li ber quntarên çiyê vegirtibûn. Li kêleka daristaneke rengîn û li ber devên kahniyên pak û şêrîn.

Evdal ne ji bo nimêj û niyazê hatibû Sîpanê Xelatê. Ew ji bo gotinê hatibû. Gotina ku dermanê dilê wî, hekîmê keser û kulên wî û hogira umrê wî bû. Wî dîsan xwe spartibû gotinan. Dîsan gotin ê bibûna dermanê derd û kulên wî.

Gelo Evdal, Evdalê lawê Zeynikê kî bû?

Ew ji maleke neçar, lawê Zeynê bû, bêkes û sêwî

bû. Ew evîndarê dengbêja delal Gulê, bavê Temo, zirbavê Meyro, xwediyê qulingê birîndar bû. Ew dengbêjê mîrê kurdan Tahar Xan, siwarê hespê kihêl Gogerçîn, heval û dostê giregir, beg, mîr û zanayên kurdan bû. Ew dengbêjê welêt bû. Bi dengê wî çiya diheji, birûsk diguri, ava golên girtî û genî diheriki û pelên darên behîf û hinaran hêşîn dibû. Ew merivê civat, dîlan û govendan bû. Wî bi dengê xwe birînên birîndaran dicebirand, dilê bêkes, bî û sêwiyan germ dikir, xewn û xeyalên keçên destgirtî û qelindayiyan dineqişand. Ew ne bi tenê dengbêjê merivan, herweha dengbêjê teyr û tilûr û heywan û rawiran bû. Bi dengê wî keriyên pêz diçûn çêrê, keriyên xezalan berê xwe didan ava Mirad û Firadê, refên teyr, bet û qulingan xwe li zozanan digirtin. Di ser wî re, tu dengbêj hê nehatibû welatê Kurdistanê. Bê westan, wî bi şev û ro, bi meh û bi salan stran digotin. Çawan rûbara nîsanê bi xêr û bereket dibari, çemên Firat û Dîjlê bi nazî û delalî diherikîn, herwekî wan, dengê Evdal jî nedihate birîn û xwe digîhand serê çiyan û esmanan.

Wî cîh nehîştibû, lê geriyabû, li welatê kurdan, ecem û ereban... gav bi gav. Carina li ser hespê kihêl Gogerçîn, carina peyatî, carina jî bi kerwanan. Ew ji cîh, der, dever, wext, dewr û dewranên dûr, pir dûr dihat. Wî li çolên ereban, bi alîkariya stranên xwe, leylan qulipandibû rastiyê û av ji qûmê deranîbû, li welatê eceman, le ser xalîçe û balgîhên ecem, wî şîîra Fîrdewsî kiribû stran û deng dabû ser hal û hewalê "Ferhad û Şêrîn." Li welatê kurdan jî, wî li ser gora şaîrê mezin ê kurd Ehmedê Xanî ruh û can dabû destana "Memê Alan" û destana din a mezin "Siyabend û Xecê" bi dengê wî bûbû lehiyeke boş û bêdawî. Wî pişta xwe dabû xirabî û nerindiyê û berê xwe dabû xweşî û rindiyê.

Lê feleka malkambax xirabiyeke welê bi serê wî de anî ku ne karê gotinê bû. Pêşî çavên wî kor bûn, hevalê şewq û ronahiyê kete nav reşe-şeva bêbinî. Paşê jî zalim û xedaran Meyro û Bengîn, dildarên li ser zimanan, revandin. Loma dilê wî bi birîn, dengê wî zîz û bixem bû. Loma wî xwe spartibû çiyan û nêzîkî li ewr û esmanan kiribû.

Pênc çiyayên welêt li ber dilê wî pir bi qedir bûn; Agirî, warê xurtî, serbilindî û biratiya kurd û ermenan; Nemrûd, warê kahniya medeniyetan; Cûdî û Herekol, cîhên tarîxeke kevnar, îbret û dersan û çiyayê Sîpanê Xelatê, gora Siyabend û Xecê, hêlîna evîndar û dilketiyan.

Derd û kulên Evdalê Zeynikê li serpêhatiya Siyabend û Xecê dihat û dengê wî li wir, ji her cîh û deverî bêtir, dibû dengê şalûl û bilbilan. Roja Newrozê wî Gulê, Temo û çend şagirt û dostên xwe yên dengbêj li dora xwe civandin û ji wan re weha got,

- Gulê, mehrûmê... Temo, lawo... dostino, birano... Şagirtino, qedirgiran û çelengino... barê min giran, derdê min bêeman e. Iro Newroz e, dinya bihar e. Iro rindî zora xirabiyê dibe. Tarîtî kêm, ronahî dirêj dibe. Di vê roja bi xêr û bereket de, li min beyan bûye, dermanê şevereşa min li ser Sîpanê Xelatê ye. Bi tenê mezinahî û dilovanî, dar û berî, av û kahniyên Sîpanê Xelatê dikarin birîna ku qedera Tavbanû û Bengîn xistiye dilê min, bikewînê. Ez ê xwe bavêjim bextê çiyayê serîbilind û lê hawar bikim. Ez ê we biterikînim, qulingê birîndar jî bigirim û herim. Hûn li min megirin, ez mêrekî kor, bavekî kal û kokimekî li ber deriyê gor û goristanan im. Çavê min vekirî, lê dinya li ber min reş e. Ez ê herim û bang û awaz lê bidim. Heye ku dermanê hekîm û loqmanan li wê derê be. Ew

dermanê ku hekîm û bijîjkan nikaribûn bidina min, heye ku Sîpanê Xelatê bide min...

Ne Gulê û Temo, ne jî heval û şagirtên wî, hingê, tiştekî gotin. Wan, bêdeng, lê guhdarî kirin. Lê gava Evdal rahişt gopalê xwe û bi rê ket, wan jî dan pey wî. Gulê ket bin milê wî, Temo jî qulingê birîndar xiste destê xwe, heval û şagirt jî li kêlekê, wan bi hev re, berê xwe dan Sîpanê Xelatê. Peyatî, bi stran û kilam. Li her gund û warê ku ew tê re derbas bûn, xelk li wan civiyan û guh dan stran û gotinên Evdal. U li her derî, yekî, duduyan, pêncan, dehan dan pey wan. Ew bûn pênceh, ew bûn sed, ew bûn du sed û çaxa ew gihîştin ber Sîpanê Xelatê seriyê dawîn ê komê nedixuya. Pêla xelkê rabûbû...

Gava Evdal xwe gîhand kahniyek ji kahniyên Sîpanê Xelatê û ji ava hûnik hinekî vexwar û tîha dilê xwe şikand, hingê wî bîskekê bîhna xwe da û paşê destê xwe bir ber guhê xwe û dîsan, lê îcar ji çiyayê Sîpanê Xelatê, deng da,

*De wayê, wayê, sed carî wayê,*
*Bira qeda bêye te dinyayê,*
*Zeman xayin e, bi min re nayê,*
*Ez Evdal im, Evdalê Zeynikê me,*
*Aşiq û serwerê kêfê me,*
*Gulek li rûyê dinê me,*
*Lê îro li ser firara malê me...*

Em ê niha, hinekî, li çîroka xwe vebin û Evdal li ser çiyayê Sîpanê Xelatê bihêlin û werin cem bermaliya wî Gulê û serpêhatiya evîna navdar a Evdal û Gulê.

## 2
## Evîna Evdal û Gulê

Evdal dengbêjekî navdar û stranvanê mîrê kurdan Tahar Xan bû. Xortiya wî di nav civat, dawet, dîlan û odên beg û mîran de derbas bû. Ew her ro li derekî bû. Wî her kesî dinasî, herkesî ew dinasî. Ew peyakî zimanşêrîn, bejndirêj û xweşlihevhatî bû. Rûyê wî, her gav, bi ken, simbêlê wî badayî bû. Wî şal û şapikên hewreşîmî li xwe dikirin û simbêlê xwe bi rûnê gûz û behîfan dibiriqand. Herçî dengê wî bû, Xwedê ew dabûyê. Şalûl û bilbil jî li ber dengê wî bêdeng diman.

Ma keç û jina ku bikaribûya xwe li ber wê bejnê, endam û cemalê bigirta hebû? Ma dengê wî yê mîna qedîfe qutiya dilê kîjan keç û jina bedew venedikir?.. Loma jî ew ji xwe razî û bi cemal û dengê xwe serbilind bû. Ew hosteyê deriyê dîlan û kêf û henekan bû... Ew ne zewicî bû û dil tune bû bizewiciya jî.

Lê rojekê ku êdî salê wî li ser sîhî re bû, birûska evînê li ser dilê wî veda. Hingê wî, bi rastî, fahm kir ka evîn çi tofan û xezeb e. Ew bi carekê, bi taya evînê ket. Wî, Evdalê dengbêj, roniya heyva çardehê mehê dîtibû. Wî keça ermen Gulê dîtibû...

Begekî bajarê Xamûrê Evdal ezimandibû daweta lawê xwe. Hatina Evdal ji beg re şeref, ji xelkê re şênahî bû. U ji Evdal re jî jiyan bû. Wî hespê xwe Gogerçîn ji tewlê derxist, lê siwar bû û berê xwe da Xamûrê, dawetê. Wî hespê xwe rakir çargaviyê û riya nîvrojî bi çend saetan birî. Gava ew gihîşt Xamûrê, meydana dawetê, tiştê ku wî, berî her tiştî, dît, koma govendê û serkêşa wê ya nazdar bû. Serkêşa govendê Gulê, keça xama û delal bû... Evdal di cîhê xwe de sar bû. Rengê wî, ji heyecan û coşê, qulipî, bû mîna rengê miriyan. Dilê wî pihêt hilavêt.

Tiştê ku bi serê Evdal de hatibû, li ber çavan bû, jê re gotin ne lazim bû.

Piştî ku ew ji hespê peya bû û çû rûyê mazûbanê xwe, wî jê pirsî,

- Begê min, daweta we bi xêr, mirazê te bi cîh be. Xwedê umrê te dirêj, lawê te şad û bextiyar ke û govendê ji mala te kêm neke... Gelo serkêşa govenda we kî ye?

- Evdalê ezîz, gotina te li ser seran û çavan e. Tu bi xêr û xweşî hatî. Te em dilşad, mala me şên, daweta lawê min geş kir... Serkêşa govenda me, keça keşîşê ezîz ê bajarê Xamûrê Gulê ye...

Em niha çawan û bi kîjan gotinan bikaribin Gulê salix bidin?.. Ew çilkeke zêr, dilopeke şîr bû. Porê wê zer û dirêj, bejn û endama wê wekî periyan bû. Bi narînî û bedewiyê kes nedigihîşte wê. Umrê wê nû ji çardan derketibû û ketibû panzdan.

Li wir, heş ji serê Evdal çû. Ew, bi rastî, bû evdal. Piştî çend gotinan û hal û xatir pirsînê, ew çû li cem beg, li ser xalîçe û balgîfan ku ji bo mêvanên maqul hatibûn raxistin, rûnişt, li govenda meydanê û serkêşa govendê nihêrî û dest bi stranê kir,

*Ez hatime Xamûrê, nav dawetê,*
*Min bala xwe dayê, Gula Xamûrê destmal*
*hildaye, ketiye sergovendê,*
*Dilê Evdalê malxirab hingê hildavê,*
*Lê, lê, yamanê, lê, lê delalê,*
*Ez Evdal im, ez dengbêj im,*
*Ez çoga xwe didim rex çoka aşiq û sazbendan, li*
*îvanê began dibejîm,*
*Ji kerba narîna dawetê, ez îro him ker im,*
*him gêj im...*

Belê, Evdal bûbû evdal û heş ji serî çûbû, lê ji destê wî jî tu tişt nedihat. Ji ber du sebeban; Gulê keçeke file bû û ew destgirtî bû. Qelinê wê jî hatibû birîn û herkesî pê dizanibû. Her çiqas serê Evdal bi ol û oldariyê nexweş bû jî, dîsan, ew ji maleke misulman dihat. Misulman û filan ji, zû bi zû, keçên xwe nedidan hev û ji hev nedizewicîn,

Evdal hunermend û ziravbihîstiyar bû. Li ber dilê wî, file jî bi qasî misulmanan, ermen jî bi qasî kurdan ezîz bûn. Ev ne bi tenê dengbêjê kurdan, herweha dengbêjê gelên din ku li welatê Kurdistanê dijiyan, ermen, suryan, keldanan bû jî. Gava ew diçû nav kurdên êzîdî ku ji alî ol, rabûn û rûniştin, edet û ûsil ji kurdên din cihê bûn, şênahiyeke mezin dikete nav wan û wan bernedidan ku Evdal, bi mehan, bi derekî de here... Herkesî qedir û qîmeta Evdal digirt û jê hez dikir.

Lê niha hal, ne halê dengbêjî û hunermendiyê bû. Niha hal, halê evîna malkambax, kesera dilan bû. Adet û ûsilên halê keçxwestin, zewac, mahrbirîn, xelat û dawetê jî, li welêt, ji hesinê pola jî hişktir û dijwartir bû.

Piştî dawetê, Evdal hespê xwe li tewlê beg girêda û çûlê xwe li mala wî raxist û dest pê kir li dora

mala Gulê çû û hat. Agirê dilê wî dijwar bû û ro bi ro dijwartir dibû. Herkes bi agirê dilê wî hesiyabû, lê heşê kesî jê tiştekî nedibirî; keçik file û destgirtî bû. Lê qewlê Evdal, qewl bû; wî dê edetê mîna hesinê polatê bihelanda û bigihîşta mirazê xwe.

Em çîrokê dirêj nekin, Evdal li bajarê Xamûrê bi cîh bû û bi alîkariya heval û dostan, ew bi bavê Gulê, keşîşê dêra Xamûrê re bû dost û dest bi çûyin û hatina mala wan kir. Bi vî awayî, wî nêzîkî li Gulê kir.

Herçî Gulê bû, ew bi vê yekê ne razî bû, çavê wê ne li Evdal bû. Ew bi Evdal qayil nedibû. Lê deng, gotin, stran û hunerê, li wir jî, hostetiya xwe nîşan da... Gulê ne bi tenê keçeke delal û sergovendeke jîr, lê dengbêjeke bi dilê we bû. Nav û dengê wê nîn bû, lê bi deng, jîrî û hunermendiya xwe, di nav keç û jinên welêt de, dengbêjeke wekî wê, bi zehmetî dihate dîtin. Vê yekê dilê Evdal hîn bêtir geş kir û jê re bû hêncet ku ew stranan bavêje ser Gulê.

*Ez ji teyran, teyrê mij im,*
*Ji kerba Gula Xamûrê kerr û gêj im,*
*Cîhê Gulê rûne, ez ê tobe kim, ez rûnanim, ez nabêjim...*
*Gulê, mehrûmê, ji erdên Tahar Xanê heta Xamûrê, ahenga vira,*
*Min koma heval û hogiran, dîwana mîrê xwe Tahar Xanê temam terikand,*
*Seba çavên te yên reş û belek hatime vira...*

Pêşî wî bi tena serê xwe stranên xwe gotin û bi xwe lê guhdarî kirin, lê paşê gava agirê dilê wî bi herkesî eşkere bû, wî li nik xelkê jî dest pê kir bibêje. Kesî lê nedigirt, xelkê digot,

- Evdal e, bi zimanê xwe nikare. Zimanê wî ser-

best û azad e, lê mekin qusûr, ew dengbêj û hunermend e û wekî her hunermendî hinekî dînik e. U meriv çi bike?.. agirê aşqê germ e, dikeve nav hestî û çerm e, ne dibê fedî ye û ne jî şerm e.

Bav û diya Gulê ku bi agirê dilê Evdal hesiyabûn jî digotin,

- Qîza me bi qîma xwe ye. Ew çi, çawan bixwaze, em ê welê bikin.

Her tişt li ser Gulê bi xwe mabû. Lê Gulê nerm nedibû. Rûyê wê bi ken, gotina wê na bû. Ew wekî hesinê pola bû. Evdalê reben nikaribû tu tiştî bikira. Ji gotin û stranan pê ve, çiyên wî hebûn? Wî jî tiştê ku ji destê dihat dikir; hîn bêtir zor dida gotin û stranê.

- Min bi stranên xwe teyrê baz kiriye bilbil, şêrê dirende kiriye pisîk. Ma ez ê nikaribim vê kafirbavê bînim rê?.. wî digot.

U Evdalê evdal welê kir ku şevekê, li mala bavê Gulê, li oda mezin, di nav mêvanan de, wî bang li Gulê kir, ew da anîn û di nav mêvanan de da rûniştin û dest pê kir stran avêtine serê. Herçî Gulê bû, wê şerm nekir û rû jê ba neda. Ew li maleke serbest mezin bûbû û bi xwe bawer bû û bi têra xwe hebû. Dewsa ku ew bireve, here aliyê jinan, wê bi xurtî xwe ragirt û bersîva Evdal da û wê jî dest pê kir stran avêtine ser Evdal. Li wê derê şerekî yaman hate pê û Evdal û Gulê bi dengan avêtin ber hev. Evdal hoste û bi tecrube bû, wî bi hêdîka, bi nermî gotinên xwe li hev danîn û li pey hev rêz dikirin. Gulê ciwan, xurt û b'aqil bû, wê pir zû gotin li hev danîn û hê gotina Evdal nediqediya, bersîva wî dida... Kesekî hê şerekî weha xweş û geş li wê deverê nedîtibû. Ji aliyê jinan, diya Gulê û jin û keçên din jî hatin odê. Ji kêfa guhdaran re payan nîn bû. Wan bi çavan li dengbêjan dinihêrîn û bi guhan li wan

guhdarî dikirin.
Û Evdal digot,

*Gulê, tu were, em herin mala me ye,*
*Ji te re daynim bahlîf-doşegê çi dare ye,*
*Her kî xelkê got, "îkrama Gulê ji te re çi ye?"*
*Ez ê bêjim, "îkrama Gulê ji serê heft bavê min zêde ye."*

Gulê di bin gotin û qisên Evdal de nedima û hema lê vedigerand,

*Evdal çavê min reş e, bela ne,*
*Min rojê heft caran bi kilê sibhanê kil dane,*
*Lê heft dengbêjê mîna te, ji bo min jinên xwe berdane.*

Evdal, dîsan, davête serê,

*Gulê, mehrûmê, hatime Xamûrê, defê nav dawetê,*
*Gula Xamûrê xemilî bû, ketibû sergovendê,*
*Dilê min Evdalê Xwedê çiqas ketê.*

Bêyî ku Gulê bisekine û li gotinên Evdal guhdarî bike, wê hema gotina xwe digot,

*Evdal, mehrûmo, ji axa mîrê te Tahar Xanê heta vira,*
*Xwîna sor neqitî ser keviran,*
*De tu were ji min re bêje "xwişkê",*
*Ez bêjim, "lo, bira..."*

Qebqeba wan, hema çi bigire, heta destê sibê dewam kir. Her du alî jî ji xwe razî bûn û heta destê

sibê, bê westan, hevûdu birin û anîn. Evdal, wekî teyrê bazê ku xwe berdida ser nêçîra xwe, êrîş dibir ser Gulê. Gulê jî, wekî bilbileke xurt û nazdar, bi dengê xwe êrîşên wî dişikand û bi gotinên xwe dilê wî dikizirand.

Wê şevê, Gulê bi xurtî li hember Evdal sekinî, lê pêla dilê wê jî ber bi Evdal qulipî. Gotinê, dîsan, bi ya xwe kiribû; Gulê nerm bûbû.

Gotin, stran û hunerê alîkarî li Evdal kir û piştî keft û lefta çend mehan, Evdal bi ser ket. Gulê got "erê..." Ew roja ku Gulê got "belê", bilûr û tembûr ji destê Evdal neketin û wî ji hilatina royê heta dîsan hilatinê stran gotin.

Piştî ku Gulê gote "belê", êdî tiştên din bi leza birûskê li pey hev hatin. Qelinê destgirtiyê Gulê li mala bavê lêwik hate vegerandin. Sozê Evdal û Gulê hate birîn. Evdal, Gulê, dê û bavên Gulê, heval û dostên her du seriyan li hespan siwar bûn û çûn deverên Evdal, erd, qesr û qonaxên Tahar Xanê. Li wê derê, Tahar Xan ji Evdal û Gulê re daweteke welê li dar xist ku xelkê bi mehan û bi salan qal kirinê. Daweta Evdal û Gulê sê roj, sê şevan dewam kir. Dengbêj, stranvan, çîrokbêj, tembûrvan û govendkêşên welêt, ji her alî, hatin dawetê. Neçar û feqîran sê roj û sê şev xwarin û vexwarin. Şeva sisiyan, derengê şevê, Tahar Xan bi xwe, Evdal û Gulê xistin oda zavê.

Dotira rojê, gava Evdal ji xewê hişyar bû, wî şeş dilop xwîna sor li ser çarşefa spî dîtin. Piştî ku wî xwe şuşt, hemamîş kir û simbêlê xwe bada, ew daket bexçe û li wir, wî du kewên spî û pir xweş ji kewên Tahar Xanê firandin û ew azad kirin. Wî bi qasî bîskekê, li bexçê, li firîna kewan nihêrî.

Wî, li wir, ji Yezdanê pak hêvî kir ku Yezdanê mezin jê re lawekî bide...

Niha em ê evîna Evdal û Gulê li vir bihêlin û werin cem lawê wan Temo.

## 3
## Temo

Piştî dawetê, roj bi roj, zik li Gulê mezin bû; zarokekî li rê bû. Evdal bi kêf bû. Ew dihat li dora bermaliya xwe diziviri û bi ken stran digotin. Evdalê bibûya bav. Bi rêdana Yezdanê dilovan, ew ê bibûya bavê lawekî. Zarok hê nehatibû dinê, lê wî stran li ser "lawê" xwe çêkiribûn...

Neh meh û neh roj û neh saet û neh deqîqe, piştî dawetê, Rebbê Alemê lawek da Evdal û Gulê. Gava lawik hate dinê, Evdal ne li malê bû. Ew, tevî Tahar Xan, çûbû seyd û nêçîrê. Bi dû bûyina lêwik re çar rojan, Evdal hate malê. Li ber derî, wî dengê zarok bihîst. Hingê hindik mabû ku ew ji kêfa bifiriya. Ew kete hundir, oda Gulê û çû eniya Gulê û her du çavên wê ramûsandin. Paşê wî zarok ji hembêza Gulê wergirt û kir hembêza xwe û lê niherî. Hingê Gulê jê re got,

- Evdalo, mal bi nûro, Xwedê mirazê te kir, tu niha bûyî bav, bavê lawekî... lawekî ku li ser rû çirûskên nûrê dibarin.

Evdal lê vegerand,

- Gulê, mehrûmê... ma rast e? Xebera te ya pîroz

rast e, ev niha lawik e?

Evdal bi guhên xwe bawer nedikir. Wî xwest bi çavan bibîne û destê xwe avêt paç û pêçekên zarok û ew jê kirin û li nav şeqan nihêrî. Li wir, di nav şeqan de, bilik û gunikên biçûk wekî sê libên zeytûna hêşîn dibiriqîn.

Hingê Evdal ji xwe çû, bi qasî bîskekê, bêdeng, li lawê xwe nihêrî û lawik li hembêzê, çû li kêleka nivînên Gulê rûnişt û hêdî hêdî, ji ber kela dilê xwe, giriya. Evdalê sêwî û bêkes bûbû bav û xwedî lawekî.

Ma heşê we jê dibire ku Evdal di rojeke weha pîroz de, bê stran bihewiya? Naxêr. Piştî ku ew bi têra xwe giriya, wî dest bi stranê kir,

*Hay lê Gulê, canê Gulê, şemamoka ruh û canê,*
*Lê, lê, Gulê canê, diya lawê minê, lê, lê,*
*Kevoka serê bircanê,*
*Sêva sorê ser dikanê,*
*Kes vê sêvê nade destê xortên ku pê nizanê,*
*Hay lê Gulê, roniya çavê minê, diya lawê minê...*

Wî, bi dûr û dirêjî, stran avêtine ser jina xwe, bi dû re, ew li lawê xwe vegerî, lawik hilda û wekî ku ew pê re dipeyivî, bi dengekî zîz û melûl, wî dest bi xeberdanê kir,

- Lawo, nûra mala mino, kurê Evdalê sêwiyo, delalê diya xwe Gulêyo... tu bi xêr û xweşî, li ser seran û çavan hatî. Em li hêviya te bûn. Tu hêviya me yî. Te mala me ya feqîr şên û geş kir. Tu ji pişta min ketî, tu dê bibî pişta min. Tu dê bibî heval û dostê min, roniya çavê min. Tu dê bibî tîmsalê xurtî û ciwanmêriyê. Tu dê, bi îlim û zanîna xwe, ronahî bireşînî ser mala me. Tu dê bibî nêçîrvanekî jîr û dengbêjekî yekta, ji bavê xwe jî çêtir û rindtir. Tu dê, mîna teyrê baz xurt û dûrbîn, mîna şalûlê dilo-

van û bîhnfireh bî... Lawo, çira mala meyo, de xwe bilivîne, bilezîne ta ku zû mezin bibî.

Her çiqas Gulê digot ku li ser rûyê lêwik nûr dibarî, lê Evdal çilka nûrê li ser rûyê lêwik nedît. Ew zarokekî reş û hinekî gulover bû. Çavên wî hê baş venebûbûn, yek hinekî vebûbû, yê din hema çi bigire, bi temamî girtî bû. Lêwik xwe di hembêza Evdal de dilivand. Evdal destê wî yê biçûk xiste nav destê xwe û bi qasî bîhnekê li lêwik, nihêrî. Em nizanin çima, lê hingê hilma tirs û xofekê kete dilê Evdal.

- Lawo, stûna mala mino, singê konê mino... lawo, bila qeder û siûda te baş û qenc be, bila felek rû ji te banede û çerxa felekê li ser te xwar nebe.

Em ê li vir bibêjin, heyf, hezar heyf. Ji ber ku daxwaz û mirazên Evdal bi cîh nehatin, tiştên ku wî lê hêvî dikirin, neqewimîn. Ji bervajiyê, tiştên ku wî nedipan, qewimîn. Felekê, dîsan, kumê xwe xwar kiribû û çerxa xwe bi lez dizivirand.

Piştî ku lawik hate dinê, meclîsa Tahar Xanê geriya ji bo ku zêr û xelatan bidin lêwik û navekî lê bikin. Tahar Xan got,

- Evdalo, zarşêrîno, dengxweşo, em navekî li kurê te kin.

- Mîrê mino, xwedanbext û merivê çêyo, li meclîsa te, ez ne bi destê xwe me. Tu bi qîma xwe yî. Hema te çi nav lê kir, navê lawê min, xulam û koleyê te, ew e.

- Eger welê ye, em ê navê wî bikin Temo. Temo, kurê Evdal. Bila Xwedê umrekî dirêj û mirazekî rind bidiyê.

Bi wî awayî, navê lawê Evdal û Gulê bû Temo. Roj û meh derbas bûn, lawik hinekî bi ser xwe de hat û rengê wî vebû. Hingê Evdal û Gulê dîtin ku di çavê rastê yê lêwik de şaşiyek heye; çav bi temamî

venabe û li serê spiyek heye. Wan lawik birin ser hekîm û doxtoran, şêx û melan, lê ji çavê lêwik re tu çare nedîtin. Lawik her welê ma. Bi vî terhî, lawik hinekî din jî mezin bû. Lê, îcar jî ew nikaribû bipeyiviya. Heta salê wî bû çar-pênc jî, wî bi tenê çend peyv wekî "bavo, dayê, apo, evdo..." dikarîbû bigota. Evdal, dengbêjê dengbêjan pir bi vê yekê dêşiya. Ew bi xwe hosteyê gotinê bû û ji devê lawê wî jî gotin dernediket. Lê bi dû salekê, salek û nîvî re, bi carekê, zimanê lêwik vebû û dest bi xeberdanê kir. Icar jî, kesî nikaribû ew bida sekinandin. Hema çi dihat ber devê wî, wî digot û li kesî guhdarî nedikir. Qise û gotin nediketin serê wî. Evdal dikir, nedikir, nikaribû tiştekî pê bida fahmkirin.

Gava umrê lêwik gihîşt neh-deh salan, Evdal mele û mamosteyên xwedî îlim û îrfan dan anîn da ku îlim û terbiyê fêrî Temo bikin. Lê Temo û îlim û terbiye gelekî ji hev dûr bûn. Wî tiştekî fahm nedikir. Heşê wî ne kemilî bû û ne jî li gora umrê wî bû.

Temo gêjokî bû. Ne bi temamî gêj, lê nîvgêj. Wî tiştên sivik û basîd fahm dikirin. Lê ne zêdeyî wan.

Halê Temo bû kul û derd û kete hundirê Evdal. Evdal hunermend bû. Fikirîn, bîrbirin, afirandin, pêkanîn hunera wî bû. Heş û mêjî her tiştê wî bûn. Ew hunermendekî yekta bû. Wî ji tiştên çewt, şaş û nîvçe hez nedikir. Lê niha lawê wî, lawê ku wî ewçend jê hêvî dikir, weha bû.

Evdal rûdinişt, bi saetan, bi rojan, jê re stran û çîrok digotin da ku ew jî hîn be. Lê bala Temo ne li ser stran û çîrokan bû. Evdal ew bi xwe re dibir seyd û nêçîrê. Lê wî ne ji seyd û nêçîrê tiştek fahm dikir, ne jî jê hez dikir. Evdal ew bi xwe re dibir meclîsa Tahar Xanê, lê yan Temo direvî, diçû malê, yan jî dihat, wekî zarokekî dergûşê, li ber çoga Evdal rûdinişt.

Hasilî kelam, em dirêj nekin... her çi ku Evdal ji Temo hêvî dikir, berevajiyê wî bû. Temo ne bû tîmsalê xurtiyê, ne bû alîm û zana, ne jî bû dengbêj û nêçîrvan. Temo bû laweki nerm, dilovan, dilgerm û bêdeng. Wî ji Evdal û Gulê pir hez dikir, bê wan nedibû. Ew li kû bûn, Temo jî li wir bû. Wî ji teyr û tilûr û heywanan pir hez dikir. Bi xêra Temo hejmara axur, pîn û qefesên mala Evdal û Gulê zêde bû. Evdal, Gulê û xelkê din nikaribûn tiştekî, serrast, bi Temo re bipeyivin. Lê Evdal û Gulê jê re çi digotin, Temo ew bi cîh dianî. Bi vî terhî, Temo mezin bû, kete sala bîstan.

Evdal û Gula reben ê çi bikirana? Ma ji destê wan çi dihat? Wan cîh nehîştin, serî danê, lê tu çare nîn bû. Bextê wan weha bû. Felekê carekê çerxa xwe li ser serê wan xwar zivirandibû. Wan ji lawê xwe pir hez dikir, lê hal û hewalê Temo jî agir bera dilê wan dida. Temo lawê wan bû. Bê Temo kesekî wan nîn bû. Bi dû Temo re, Gulê bi nexweşiyê ketibû û hew jê re zarok dibû. Hêvî û daxwaza wan ew bû ku gava rojekê ji rojên Xwedê, wan serê xwe danîn axa goran, diyarê rehmetê, ew warwenda û kurdûnde nemana û zarokê wan bida ser riya wan û li ser erdê dinê hebûna wan bidomanda...

Lê halê Temo jî ne tu hal bû.

Lê jîn e, bi dek û dolab e; çaxa Temo rojekê qulingek li ber devê avekê dît û ew girt û anî malê, tiştek lê qewimî. Wekî ku ew ji xewneke kûr û dirêj hişyar be, yan jî bi carekê veciniqî be, ew hinekî bi ser xwe de hat. Bi tenê hinekî. Lê ew hinekî jî qîma gelek tiştî kir.

Temo quling, hema çi bigire, salekê berî wê roja ku Evdal berê xwe da Sîpanê Xelatê, dît. Quling birîndar bû. Temo û quling bûn dostên hev. Dostiya wan alîkarî li Temo kir û ew bêtir bû serwext û bêtir

li hal û hewalê bavê xwe yê kor pirsî û li serê fikirî. Hingê umrê Temo gihîştibû sîhî û spiha ser çavê wî hîn mezintir bûbû. Bi qasî mehekê bi dû dîtina quling re, Temo dest bi doza mêranî û zewacê kir. Wî ji diya xwe re, diya wî jî ji Evdal re got. Hingê ji kêfan, dilê Evdal mîna deryan rabû. Bask û perwaz tune bûn ku Evdal pê bifiriya. Evdal û Gulê, hema di cîh de, keça dostekî wan ku bi xwe jî dengbêj bû, ji Temo re xwestin û keçik anîn. Evdal ji taqetê ketibû, wî îmkan nîn bû ku daweteke mezin li dar xista. Wan bi daweteke biçûk Temo û keçik ku navê wê Zînê bû, zewicandin.

Piştî çend mehan, Temo simbêl bada û hat mizgînî da dê û bavê xwe; Zînê giran bû. Hingê Evdal kumê xwe firand û rahişte tembûr û bilûrê.

Berbanga wê roja ku Evdal, li ser çiyayê Sîpanê Xelatê, bi dengê xwe roja nû hişyar kir, herkes li benda welindandina Zînê bû. Jê re ne roj, lê saet û deqîqe mabûn...

Em ê Temo û Zînê jî, niha, li vir berdin û werin cem quling û li hal û hewalê wî binihêrin.

# 4
# Quling

Gava Temo û hevalên wî quling li deştê dîtin, li ser korbûna Evdal re şeş sal derbas bûbûn. Temo û çend hevalên wî li deştê bûn. Bihar hatibû, der û ber hêşîn bûbû. Dinya kirasê xwe yê rengarengî li xwe kiribû. Bîhneke xweş ji erdê radibû û hawirdor vedigirt. Xelk, gundî û eşîr hazirî dikirin ku hilkişiyana zozanan, cîhên hûnik û havîngehan. Xelkê digot,

- Bihara welatê Kurdistanê li kesî guhdarî nake û ew wekî keçeke nazdar, di nav kincên rengîn de, tê û ronahî li welêt direşîne.

Xelk û eşîr li ber haziriya zozanan bûn, lê teyr û tilûran berî xelkê, xwe bi zozanan gîhandibûn. Ew ji deverên germ û dûr hatibûn û xwe li berrî, deşt, çiya, zozan û daristanan girtibûn. Teyr, çivîk, legleg, hacereşik, quling û h.w.d. ref bi ref hatibûn.

Temo quling rojekê ji wan rojên biharê dît. Ew û hevalên xwe di ber avekê re dibihurîn. Hingê wî dengê teyrekî bihîst û xwe li deng girt. Piştî sed, sed û pêncî gavî, wî qulingek li kêleka sazê dît. Digel ku quling jî Temo dît, ew nefiriya. Wî li çavên Temo

niherî. Temoyê pepûk li cîhê xwe mat ma û wî jî, bi qasî bîskekê, li çavên quling niherî. Xwedayo, ew çi çav bûn! Coteke çavên belek, xweşik û melûl. Temo ber bi quling, bi hêdîka, çû û li ser serê wî sekinî. Quling nefiriya. Wî xwe livand, lê nefiriya. Hingê Temo sêlika dest xwe ku tijî kulîlk û çîçek bû, danî erdê û li ser totikan, li ber quling rûnişt û destê xwe bir ser serê wî û ew hêdî hêdî mist da. Quling kir qîrîn, lê dîsan ew nefiriya. Temo tiştekî jê dernexist û wî bang li hevalên xwe kir. Gava hevalên wî hatin û li quling niherîn, wan fahm kir ku quling birîndar e. Her du baskên quling jî şikestî bûn û birîna wî pir xedar bû. Temo quling da bin çengê xwe, sêlika kulîlk û çîçekan jî xist destê xwe yê din û wî û hevalên wî berê xwe dan malê.

Li malê, Evdal, Gulê û Temo li ser quling civiyan. Evdal destê xwe li nukil, çav, serî, stû, pişt û lingên quling gerand û paşê, bi her du destan, her du baskên quling mist dan. Hingê qîreqîr bi quling ket. Evdal quling nedidît, lê derdê quling fahm kir,

- Lawo, Temo... quling birîndar e û birîna wî xedar e. Ew hew sax dibe û baskên wî hew dicebirin. Lawo, ew jî mîna min bi derd û kul e. Ez ji ronahiyê, ew ji firînê, ez ji rengê biharê, ew ji şinahiya esmanan bêpar e. Qedera me yek e. Ez însan, ew teyr, lê siûda me wekhev e. Lawo, Temo... de bilezîne, tu û diya xwe derman û giyayên şîfayê bînin, em dayinin ser perwaz û birînên quling. Heye ku Rebbê Alemê li gunehê wî binihêre û şîfayê xêrê bidiyê.

Ne derman û ne jî giyan alîkarî li quling kir. Ew her welê ma. Evdal, Gulê û Temo ew birin ser hekîm û doxtoran jî, lê digel vê yekê, jê re çare nedîtin. Hevalên quling, teyr û tilûr, li ser serê wan difirîn, dixwendin û didan perwazan. Lê qulingê reben her li ser erdê bû. Evdal bi quling dêşiya û digot,

- Gulê, mehrûmê, ma tu halê quling nabînî? Refên teyr û qulingan gihîştine zozanan. Feqet qulingê me yê bextreş bi şûn de maye ji heval û hogiran. Gulê, teyr bi refê xwe re mesûd û bextiyar e. Herçî quling e, bê deşt û zozanan nabe. Quling teyrê deşt û zozanan e, ew xwe li deşt û zozanan digire. Ew teyrê biharê ye. Bihar li kû, ew li wir e. Sibê roj, gava germiya havînê û serma zivistanê bi ser me de hatin, hingê em ê çi bikin? Hingê em ê qulingê belengaz çawan bihewînin û ji mirinê star bikin? Mehrûmê Gulê, em divê jê re çareyekê bibînin...

Ew li çare digerîn, lê çare bi xwe, bêyî ku wan hay jê hebe, hate. Çare tembûr, saz, bilûr, dengê Evdal û Gulê û germiya malê bû. Quling, mîna merivekî, hînî malê û wan bû. Temo ew dibir li deşt û zozanan digerand, Gulê ew dişuşt û pak dikir û Evdal jî pê re dipeyivî û jê re stran digotin. Ew bûbû lawê duwemîn ê malê. Mal bûbû çar kes. Wan wekî merivekî li quling fedikirin.

Evdal û quling bûbûn du dostên qenc. Gava dengê quling bi guhê Evdal nediket, ew eciz dibû û gava Evdal li tembûr an jî li bilûrê nedixist û stran nedigot, îcar, quling dikir qîreqîr. Pir caran, Evdal quling digirte hembêza xwe û pê re dipeyivî. Quling jî, ji halê xwe razî, bêdeng, li dora xwe dinihêrî. Tiştên ku Evdal jê re digotin, bêtir, li ser derd û kulên her duyan bû. Evdal weha digot,

- Qulingo, çavbeleko, perhêşîno... dinya, dinyayeke malkambax e, ew, dinya derd û kulan e. Kêfxweşî û bextiyarî ji min û ji te dûr e. Ez kor, tu baskşikestî yî. Ez di nav şeveke xedar, tu di nav êşekî yeman de yî. Eger çavên min ronî, perwazên te sax bûna, me dê rindî, comerdî û bextiyarî nîşanî dinya kambax bida. Me dê bi dengê xwe gulveda, deşt û berrî bixemilanda, esman bi reng

bineqişanda, teyr û çivîk têr bikira, şadî û bextiyarî bida meriv û însanan. Eger dinya min tarî, perwazên te giran nebûna, me dê heft welat û dêwel bida bin ling û perwazên xwe û me dê deng bida ser hal û hewalê dinyayê.

Pir caran jî, Evdal stran davêtine ser quling,

*Qulingo, perhêşîno,*
*Rabe baskan li hev de, serê çengan pê re bihejîno,*
*Xwe bi hekîm û doxtorên dinyayê tev bigihîno,*
*Hekîm û toxtoran li min bicivîno,*
*Her du çavên min kor in, tu sax bike her du baskên şikestîno,*
*Baskên xwe bi çavên min ve bicebirîno,*
*Şalûl û bilbil li halê me dixwîno...*

Hatina quling hêz û quweteki nû da Evdal. Dilê wî yê birîndar dîsan geş bû û devê wî vebû. Quling jê re bû hêncet ku ew derd û keserên xwe bike stran. Wî stranên nû çêkirin, ên kevn bedewtir û xweştir kirin. Evdal hunermendekî kevn bû. Xebat û tecrubên salan deng, ûslib û awazeke taybetî dabû Evdal. Li welêt herkesî bi vê yekê dizanîbû. Kê digot, bila bigota, li her derî stranên Evdal diyar bûn. Xelkê stranên wî û yên dengbêjên din, pir bi hêsanî, ji hev derdixistin. Tu dengbêj û stranvan ji aliyê deng, awaz, ûslib û lihevanînê, nedigîşte Evdal. Evdal hoste bû. Ew hosteyê hostan bû. Hostehiya wî jî ev bû; dengekî xweş û kemilî, guhekî vekirî, ruhekî bi coş û heyecan, sebir û taqetekî yekta, meraq û daxwazeke germ û ji karê xwe hezkirin. Bi kurtayî, her tiştê wî lihevhatî û bi aheng bû.

Korbûnê ew xist. Serpêhatiya Bengîn û Meyro ew hîn bêtir xist. Demên dawîn bîhna wî teng, nefesa

wî çikyayî bû. Wî her stran digotin, lê ne bi heyecan û kela kevn. Tiştê herî girîng jî, wî wekî berê nikaribû stranên nû li hev bianiya.

Heta ku quling hat. Quling ronahî reşand şevên Evdal ên bêbinî û ruhê wî vejand... Digel gotin û stranê, baweriya dengbêjê hoste jî, ji nû ve, xurt bû. Dîsan wî dest pê kir, bawerî bi xwe û bi dengê xwe anî... Herweha bi ronahiya tavê jî. Gerçî ew kor bûbû, lê wî tu carî baweriya xwe nebirî ku wî dê, rojekê, bi çavan roniya tavê bidîta û çavên wî dê, ji nû ve, vebûna. Hatina qulingê birîndar vê bawerî û daxwazê jî xurttir kir.

Gava ku wî berê xwe da Sîpanê Xelatê, wî xwest ku quling jî pê re bûya. Çaxa ew bi rê ket, wî weha got,

- Gulê, mehrûmê, Temo, lawo, heval û dostino... ez li rê me, ez ê stran bavêjime ser qedera xwe û quling, ez ê deng bidim ser bextê reş ê Bengîn û Tavbanûyê. Edî heta çavên min û baskên quling sax nebin û ez xeberekê ji Bengîn û Tavbanûyê nebihîsim, ez hew ji Sîpanê Xelatê dadikevim... Ez ê her stranan bibêjim û xwe li quwet û hîkmeta çiyayê Sîpanê Xelatê bigirim.

Em niha çîroka quling jî li vir biterikînin û vegerin cem Evdal û çiyayê Sîpanê Xelatê.

# PIŞTÎ NÎVRO

# 1
# Evîna Siyabend û Xecê

Ro hilatibû û hatibû li ser serê çiyayê Sîpanê Xelatê sekinîbû. Tîrêjên royê li ser eniya çiyê diçirûsîn. Ava kahnî û golan dibiriqîn. Dinya germ, hawirdor hêşîn bû. Wîçewîça teyr û çivîkan ji doralî û daristanê dihat. Bîhneke xweş hawirdor girtibû; meriv bi bîhna çîçek, kulîlk, dar û ber sermest dibû. Sîpanê Xelatê di nav xweşiyeke ecêb de bû. We digot qey haya çiyê ji ziyareta Evdalê Zeynikê û xelkê hebû û çiyê jî, ji bo wê ziyaret û serîdanê, xwe xemilandibû.

Lê çi mixabin ku Evdal ew xweşî nedidît.

Xelk ji konên xwe bi dûr ketibûn. Ew hilkişiyabûn serê çiyê û li wê derê, bi awayekî peregende, kom bi kom rûniştibûn. Çûyin û hatin û tevger xurt bû. Ji her derî deng bilind dibû. Zarok, xort, keç, jin, mêr, kal û pîr ketibûn nav hev. Mîna gotina gotinbêjan, wê rojê dê weledê xwe avêtibû. Roj bi roja mahşerê dima. Serê çiyayê Sîpanê fireh bû. Ew bi dar û ber bû û li navendê jî goleke hûr û pir xweş hebû. Ji bin gir û zinaran kahniyên avê derdiketin û bi rengekî spî wekî berfê diherikîn. Ava

wan ewçend sar bû ku destê merivan tê de ditevizî.

Li wê derê, koma mezin, bêguman, koma Evdal bû. Gulê, Temo, heval û dostên wî, şagirtên wî û gelek kes ji xelkê, li dora Evdal civiyabûn. Evdal û dora wî, nû, ji ser firavînê rabûbûn. Herçî xwarin bû, serê Evdal pê ne xweş bû. Wî qîma xwe bi pariyekî nan dianî. Li ser sifre û di dîwan û meclîsên beg û mîran de jî, wî bi tenê pariyekî nan dixwar. Xwarina wî ya rojane weha bû; taştê, pariyekî nan; xwirînî, taseke şîr û nanê hişk[wî nanê xwe dixist nav şîr]; firavîn, pariyekî nanê nerm, seriyekî pîvaz, hinekî sebze, çend tîke goşt û taseke mast; şîv, pariyekî nanê nerm, çend serî penîr, taseke dew û eger hebe, hinekî pîvazê hêşîn. Mîna paşîv jî wî hinekî şîrinahî dixwar.

Wê rojê jî, wî firavîna xwe bi nanê nerm, seriyekî pîvaz, sê tîke goştê xaşayî, hinekî sebze û bi du tasên biçûk mast kir.

Bi dû firavînê re, wan xwe spartin siya çend daran û ew li wir, li ser cil û kulavan, rûniştin. Bi qasî hefteyekê bû ku Evdal, her piştî nîvroyê, rûdinişt û ji şagirtên xwe re qala "Siyabend û Xecê" dikir û çîroka wan, ji nû ve, li gora xwe, vedijand. Geh bi stran, geh bi gotin. Li ser "Siyabend û Xecê" wî weha digot,

- Şagirtino, xortên çelengino... destana Siyabend û Xecê li ber dilê min pir ezîz e. Ew mîna lehiyekî diherike. Ew avahiya miletê me, rê û rêçên tarîxa me ye. Di nav wê destanê de, meriv milet û însanê kurd baş dibîne. Adetên me û rabûn û rûniştina welêt tê de baş dixuyin... Sîpanê Xelatê hêlîna Xecê û Siyabend e, bi serpêhatiya wan navdar e. Min xwe bêsebeb li Sîpanê Xelatê negirtiye. Hûn bi serpêhatiya Bengîn û Tavbanûyê dizanin. Serpêhatiya wan jî, hema çi bigire, mîna

serpêhatiya Siyabend û Xecê ye. Lê min ji xwediyê erd û esmanan tikayek heye ku dawiya Tavbanû û Bengîn nebe mîna dawiya Siyabend û Xecê.

Evdal hefteyekê destana "Siyabend û Xecê" gotibû û ew êdî hatibû dawiya destanê. Wî hêvî hebû ku destan wê rojê biqediya. Keneke li ser rû, wî hêdî hêdî serî li dora xwe zivirand, gopal û bilûra xwe danî kêleka xwe, çend caran serê xwe hejand û dest bi gotinê kir,

- Ez we nabînim, lê bi we dihesim... Kor bi tenê ne, korbûnî tenêbûn e. Feqet ez ne bi tenê me, ne jî di nav tenêtiyê de me. Kêfa min ji tenêbûn û tenêtiyê re nayê. Xwedê ji we, ji Gulê, Temo û quling razî be... De Temo lawo, quling bîne, bide min û ez dest bi dûmahîka destana Siyabend û Xecê bikim.

Temo quling anî û li ber Evdal berda. Quling hat û xwe avêt hembêza Evdal. Hingê Evdal kenî,

- Qulingo, bextreşo, quling dîsan, ref bi ref, bi aliyê berriyê firîne. Wext, wexta wan û zozanan e. Wey qulingo, malxirabo, tu mayî, dîsan, bi şûn de. Ez kor im, çavên min nabînine û nikarim alîkarî li te bikime. Per û baskên te şikestî ne. De were, em ji xwe re, bibêjin û bilorînin da ku çavên min vebine û tu bifirî û xwe bigihînî bi refên hevalane.

Civat li Evdal fireh dibû. Wî guhên xwe vekiribûn, li deng û pejnan guhdarî dikir. Çavên wî vekirî bûn. Serê wî dilivî, destê wî yê rastê li ser pişta quling bû. Pêşiya wî şevereş, hundirê wî ronî û bi hêvî bû. Wî şevereşa xwe û ronahiya hundirê xwe kiribû yek û jê stran û meselên giranbiha derdixistin. Şagirtên wî, dengbêjên din û xelk, bêdeng, li dora wî civiyabûn û li benda gotina wî bûn. Wî berê xwe da esmanan û bi hêdîka, dest bi destana Siyabend û Xecê kir,

- Gelî guhdaran... bila tava royê û germiya

tîrêjên wê ji ser serê we kêm nebe... Gelî guhdaran, dinya ji evîndar û dilketiyan hez nake. Dinya jî mîna min kor e. Ava reş çavên min, kîn, rik û nefretê jî çavên dinê kor kirine. Felek çerxa xwe ya xwar li ser serê dildaran dizivirîne û govenda xwe li dora wan digerîne... Xecê û Siyabend jî, herwekî ku hûn dizanin, dilketî û evîndarên hevûdu bûn. Ev bûn çend roj ku ez her qala serpêhatî û serencamên wan dikim. Ev bûn çend sedsal ku dengbêj û stranvanên me behsa bextreşiya wan dikin... Belê, ew bextreş bûn û ketibûn ber xezeba dinya kambax. Hûn pê dizanin; wan xwe pir êşandin da ku xwe bigihînin hev. U çaxa ew gihîştin hev, dinya li wan hate xezebê... Bi dû derd, bela, keser, lec û şerên salan re, Siyamend û Xecê gihîştine hevûdu. Siyabend bi destê xezala xwe Xecê girt û ew danî ber xwe, ser pişta hespê xwe yê navdar Deybilqiran û berê xwe da Sîpanê Xelatê. Wan riya du rojan bi nîv rojî birîn û xwe bi çiyê gîhandin. Ew li serê çiyê, li ber kahniyekê peya bûn, li wir konê xwe yê reş vegirtin. Kêf kêfa wan bû. Derd û bela, kuştin û xwînrijandin li pey mabûn. Her du evîndar di nav dar û berî, av û kahnî, teyr û xezalan de, bi tena serê xwe bûn. Li wir, li ser kahniyê, Siyabend destê xwe bir stûyê Xecê û ew hembêz kir, ramûsaneke evînê jê stand. Hingê şik, guman û xem ji Xecê bi dûr ketin, tu xem di dilê wê de nema. Ew, ne xewn bû. Ramûsana Siyabend ku wê hewqas lê xeyal dikir, niha bûbû rastiya wan. Heta derengê şevê, wan kêf û henek kirin û paşê çavên xwe berdan xewa şêrîn.

Serê sibê, Xecê ji xew hişyar bû, ji kon derket û bala xwe dayê, panzdeh pezkûvî ji nav daran derketin û berê xwe dan kahniyê. Pezkûvî, yek bizin bû, yanzdeh nêrî bûn. Xecê dît ku nêriyekî kinik û gulover û qelew, stirîhên wî donzdeh şax jê diçin, li her

dehên din dixist û ew ji ser bizinê vedigerandin. Hingê Xecê keniya û got, "eynî mîna Siyabendê min ê Silîvî, xwediyê tîr û kevanê zîvîn e." Herçî Siyabend bû, rebenê Xwedê, haya wî ji bayê feleke tune bû û hê di xewa şêrîn de bû. Bizin hate ser kahniyê, bi çavan, li Xecê nihêrî û devê xwe xiste kahniyê. Nêriyê kinik û gulover li dora bizinê çû û hat û bi quloçan li wan deh nêriyên din xist. Hingê Xecê keniya û kir pîrqîn. Bi pîrqîniya Xecê re, Siyabend ji xewa şêrîn çavê xwe vekir û ji kon derket û hate cem Xecê. Pezkûvî, ji wan bi qasî bîskekê bi dûr, diçêrîn û av vedixwarin. Nêriyê kinik lotik davêtin. Xecê bi destê Siyabend girt û gotê, "Siyabendo, ez bi qurbano, li min û kena min megire, ez ji muhebeta te têr nabim... bes, li van pezkûviyan binihêre. Ew donzdeh heb in, yek bizin, yanzdeh heb nêrî. Li wî yê kinik û gulover binihêre, stirîhên wî bi donzdeh şaxî ne. Ew li wan deh nêriyên din dixîne, wan ji ser bizinê vedigerîne û xwe li bizinê digire. Ez kenîm, min got, ew eynî mîna Siyabendê min ê Silîvî, xwediyê tîr û kevanê zîvîn e..."

Hingê Siyabend eciz bû û gotê, " Xecê, pepûkê... ez evçend li dinya geriyame, min kesî fêriz û pêlewan, wekî xwe, nediye. Tu nêriyê pezkûvî bi min dişibînî... Hay lê, Xecê, hay lê... umrê pezkûviyê nêrî dê, îro, xelas be. Ew bikeve ku derî jî, ez ê serê wî jêkim û wî bînim, tu ji me re bike şîv û xwarin. Hingê tu dê Siyabendê xwe, bi çavên xwe, bibînî." Bi vê gotinê, Siyabend çû hundirê kon, xwe şidand, rahişt tîr û kevanê zîvîn. Xecê li cîhê xwe sar bû. Tirsekê kete dilê wê û dest bi rica û emanê kir, "Siyabend, ez qurbano, gotina min ne bi xirabî bû. Ez ketime bextê te, dev ji nêrî berde. Ez ditirsim. Bi tenê şevekê em li cem hev mane, me hê baş hevûdu nedîtiye. Hesreta dilê me hê daneketiye. Qeda li

nêrî keve, berde, bila ew di riya xwe de here..."

Lê Siyabend li Xecê guhdarî nekir, li Deybilqiran siwar bû û berê xwe da pezkûviyan. Li spêda çiyayê Sîpanê Xelatê nêçîr, rev û beza destan û çîrokan dest pê kir. Siyabend lezand, ha li vir, ha li wir, xwe bi donzdeh pezkûviyan gîhand. Nêçîrê nikaribû xwe ji nêçîrvanê yekta bi dûr xista. Siyabend bala xwe dayê ku ew nêriyê kinik û gulover, qiloçên wî bi donzdeh şaxî, li kêleka bizinê direvî. Siyabend, li ser pişta hespê rewan, tîr û kevan hazir kir, berda nêrî, li kêleka rastê xist, di kêleka çepê re derxist. Orînî bi pezkûvî ket. Hevalên wî revîn, ew di cîhê xwe de gevizî û li wir ma. Siyabend çû serê, ji hespê peya bû, li ser sekinî û lê nihêrî. Ma li dinê kesekî mîna Siyabend hebû, eger hebûya jî, Siyabend ê dinê lê nekira zîndan?.. Siyabend bi lingên nêrî girtin û ew kişand bi serê Sîpanê Xelatê û gîhand zinarekî bilind. Wî kêrika xwe ji bêrîka xwe derxist, serê wî jê kir, xwîna wî rijand ser zinarê bilind. Siyabend lingê xwe danî ser quloçê wî ku stûyê wî biqurfîne. Laşê nêrî hê germ bû. Gava Siyabend dest avête stirîhê wî, wî xwe dawşand, quloçê wî kete ranê Siyabend û ew bi ser serî, ji Sîpanê Xelatê xist. Siyabend bi ser kema belalûkê û dara çeqemê ket û çeqem û kem li pişta wî ketin û di sînga wî de derketin. Axîneke kûr ji Siyabend rabû û got, "wey felekê, tu çiqas li min xayin î!"

Herçî Xeca reben bû, wê çavên xwe li riya Siyabend digerand, dikir, nedikir, Siyabendê xwe, bi çavan, nedidît. Wê zû daw û delingê xwe hilda, kete pey şopa pezkûviyan û lezand. Ew çû ser serê Sîpanê Xelatê, laşê pezkûvî, li serê çiyê dît. Wê bala xwe dayê, nalîneke kûr ji binê Sîpanê dertê. Wê hema reşahiya Siyabend û çeqem û kem dîtin. Dilê Xecê hêja bû, lê bi kul û keser û bi birîn bû, wê dest bi

qîrîn û giriyê kir û hêstirên çavên xweşik bi ser hinarê rû ve barandin. Xecê bi qîrîn got, "ho lo, lo, lo, Siyabendo, ezbeniyo, dinya ye, xweş dinya ye, bîhn û hilma wê li min û te tê, bi gulat e; di ser te re zinarekî bilind e, di bin te re riya kerwanan e, li kêleka rê jî ava Miradê û Firat e; Siyabendo, cîhê min hazir bike, ez hatime ba te." Siyabend, bi nalîn, lê vegerand, "hê, lê, lê, lê, mala bavê şewitiyê, xwe bigihîne bi gundan; werisê heft gundan û biskê heft rindan li hevûdu bicivîne; tu bi destê nexweş û birîndarê mala bavê xwe bigihîne; Siyabendê Silîvî, fêriz û pelewanê dinyayê, ji binê Sîpanê Xelatê, ji ser kem û çeqeman bi derîne."

Xecê lez kir, lezand, gihîşt war û gundan, kir qîrîn û fîgan, werisê heft gundan, tevî zilaman, bi xwe re anî Sîpanê Xelatê. Her kesekî weris bi ser hev ve kir û bi Sîpanê Xelatê re berda, lê tu çare û îmkan nîn bû, kesî nikaribû xwe bigîhanda Siyabend. Bi vê terhê, bû êvar, herkesî berê xwe da malê û Xecê bi tenê ma. Xelkê şîret li Xecê kirin û gotin, "tu bi ya me bikî, tu dê dev ji Siyabend berdî, tu çara wî nîn e." Xecê, bi girîn, li wan vegerand, "na, nabe, Rebbê jorîn şahîdê min e, dilê min bi Siyabend re ye. Tiştê ku hatiye serê min, bila neyê serê kesî. Dev ji min berdin."

Piştî çûyina xelkê, Xecê li kêleka zinarê xopan rûnişt û bang li Siyabend kir, "ho, ho, ho, lo... Siyabendo, quloçên pezkûvî pir biçûk in, Siyabendê min berdaye bin Sîpanê Xelatê, ser kema belalûkê. Tev bi rehma Xwedê bû, ji gunehên evd û însanan bû, ji hev qetandiye destê zava û bûkê." Siyabend, ji jêrê, bi nalîn, lê vegerand, "hê, hê, hê, Xeca minê...lê, lê... quloçên pezkûvî pir mezin in, Siyabendê te berdaye ser dara çeqemê, binê zinarê. Her çawan min ji hev qetandiye destê nêrî û bizinê, wî

wisan ji hev qetandiye destê mêr û jinê." Hingê Xecê got, "lo, lo, Siyabendo, lo, lo, mala bavê şewitiyo, pezkûviyo, pişthêşîno Siyabendê min dixapîno, li ser zinar û çiyan wî digerîno, bi ser kema belalûkê ve dixîno... felekê ev çi tofan e, bi serê me de aniyo, destê bûk û zavê ji hev diqetîno."

Halê Siyabend ne tu hal bû, hêdî hêdî, ruh ji canê wî derdiket. Wî bi xîreta dawîn ji Xecê xwest ku Xecê dev jê berde û here ji xwe re mêrekî bibîne, "carina navê Siyabendê xwe yê Silîvî bi bîr bîne, Xecê... ez ketime bextê te, tu xwe bernedî, dinya ronî ye, ruh şêrîn e." Xecê bersîv dayê, "ho, lo, lo, Siyabendo, rûgeşo. Ez zînê hespê Deybilqiran li serê naşidînim; ez cilê te li xwe nakim û xwe naxemilînim; ez li Deybilqiran siwar nabim û naxerînim; ez xwe bi bajaran nagihînim; ez çavê xwe li xortan nagerînim; ez tu dilan bi ser dilê te re nahebînim... Ez Xecê me, Xeca dîn im; ez, va ye, destmala xwe ji bêrîka xwe dertînim; ez ê li ser çavên xwe yên xweşreşan û li ser hinarê rûyê xwe bişidînim; ez ê, vê gavê, destê xwe jî bi destê Siyabendê xwe bigihînim..." Bi dû gotina xwe re, Xecê bi destmalê çavên xwe girêdan û xwe ji serê Sîpanê Xelatê berda, bi ser dara çeqemê de ket, dar şikand, tevî Siyabend, gêrî jêr, bin newalê bûn. Ruh di canê Siyabend de nema û ew mir. Xecê hê dijiya.

Piştî demekê kerwanekî dirêj di bihurê re derbas bû. Yekî ji rêberên kerwan dît ku zilamek û keçek li erdê bûn. Kerwan tev li hev civiyan, li ser laşên wan sekinîn. Xecê hê dinalî. Wan jê pirsîn ka çi qewimîbû. Xecê bi dengekî zîz li wan vegerand û got, "Gelî xortan, ez ketime bextê we û Rebbê jorîn, kes pirs û suwalan ji min mekin. Hûn xêrê ji çav û destên xwe bibînin, eger hûn dixwazin xêrê bikin, hûn ê gora min û vî zilamê li tenişta hev bikolin. Ez

ê jî niha bimirim û li vê dinyayê namînim. Hûn ê navê me li ser kevirê gora me binivîsin. Navê min Xeca Resûl e, navê vî çelengê jî Siyabendê Silîvî ye. Hûn ê tasekê bînin, zincîr bikin, serê zincîrê bavêjine gorê, tasê daynine ser devê kahniyê, li dora me darên spîndaran biçînin. Gava kesên xwedîxêr hatin, bila ew avê bi wê tasê li qurmê darê bikin. Hûn ê li ser tirba me weha binivîsin."

Gava Xecê xeberdana xwe xilas kir, ruhê Xecê ji canê wê bi dûr ket. Serokê kerwan rabû û got, "ez li vê xêra hanê qesidîme, ez ê bi gotina vê keçika mehrûm bikime." Ew rabûn, gora Siyabend û Xecê kolan, navê wan li ser tirbê neqişandin, darên spîndaran li dora gorê çandin, tasek anîn, zincîrek pê ve kirin, serê zincîrê bi serê kevirê gorê xistin û tas li ser kahniyê danîn...

*Ez bi xêr, hûn bi silamet,*
*Gotina min çû deştê,*
*Dê û bavê hazir û guhdaran çûn bihuştê...*

Xwendevanên ezîz, bi vî awayî, Evdal serpêhatiya Siyabend û Xecê dawî anî. Herwekî hûn pê dizanin, gotina devkî û gotina nivîskî bi hev namînin. Gotina devkî jîn e, gotina nivîskî siya jînê ye. Ew gotinên ku ji devê Evdal derketin û me li jorê nivisîn, bi tenê kurtebirekî biçûk ê wî danê êvarê ye. Ji ber ku, gava Evdal destana dildaran digot, ew pê re diçû. Wî bi awayekî welê digot ku şagirtên wî û guhdar li rojên Siyabend û Xecê vedigerîn û dibûn heval û hogirên wan, siûda evîndaran dilê wan vedigirt, ew zîz û kelgirî dikirin. Evdal serpêhatiya Xecê û Siyabend bi gotin got. Lê, wî xeberdanên Xecê û Siyabend bi stran guhezandin guhdaran. Ew, pir caran, disekinî, bîhna xwe dida, li

dengên dora xwe guhdarî dikir û paşê dom dikir. Bi hezaran dengbêj û stranvan destana Xecê û Siyabend gotibûn û digotin. Lê tu kes nedigihîşte katê Evdal. Stran, serpêhatî, destan, bi alîkariya Evdal, dibûn perçeyekî jiyana xelkê. Evdal, pir caran, ji şagirtên xwe re digot,

- Şagirtino, rûgeşino, bi xwe bawer, bi zimanê xwe şêrîn, bi dengê xwe xweş, bi gotina xwe fesîh û sivik bin. Hunermendî; daxwaz, coş, sebir, înad, xebat, nermî û ziravbihîstiyarî ye. Bila çar tişt ji we kêm nebin; jîrî û ciwanmerdî, comerdî û xêrxwazî. Bila çar tişt ji we bi dûr bin; qelsî û namerdî, çikosî û xirabîxwazî. Ev her çar tişt, jîrî, ciwanmerdî, comerdî û xêrxwazî dê alîkarî li hunermendiya we bike. Gava hûn bi xwe û bi gotina xwe ne bawer in, mebêjin. Li serê bixebitin, lê hûr bin da ku hûn pê bawer dibin. Gava gotin û stran we nahejîne, kela dilê we hilnade û bi germî ruhê we venagire, hingê hûn wê gotin û stranê mebêjin. Wê çaxê kêmaniyek heye, lê bifikirin. U ji bîr mekin, hûn bijarteyên xelkê ne. Hûn ji xelkê werdigirin û didinê. Jê bi dûr mekevin, rê medin ku ew ji we bi dûr keve.

Jîn û hunermendiya Evdal jî li gora gotinên wî bûn. Ji lewre, ew bûbû dengê xelkê.

Piştî ku Evdal serpêhatiya Xecê û Siyabend bi dawî anî, şagirt û guhdar jî, bi qasî çendekê, bêdeng man. Ji kesî deng dernediket. Ew çûbûn wext û dewranên Siyabend û Xecê. Bi tenê quling xwe dilivand û dikire qîreqîr. Qîreqîra quling ne ji bêdengiya doraliya Evdal bû, lê ji bo dengên ku ji jor, ji esmên dihatin. Ro diçû ava. Hawirdor ketibû nav rengekî sor. Erd, esman, çiya bi rengekî sor dibiriqîn. Ro di kêleka çiyê re diçû ava û ji haziran û civata Sîpanê Xelatê xatir dixwest. Li esmên jî, teyr û tilûr, ref bi ref, difirîn û dixwendin. Qîreqîra

quling ji bo vê yekê bû. Ew li serê erdê, hevalên wî di nav ewr û esmanan de bûn.

Evdal westiyabû, bêdeng, serê xwe dizivirand û dipojinî. Gulê quling ji hembêza Evdal wergirt. Hejmara guhdaran gihîştibû sedan. Ew hemû bêdeng rûniştibûn û li dengbêjê ku nikaribû bi çavan wan bibîne, dinihêrîn. Dengê dengbêjê dilronî dilê wan vegirtibû û ew biribûn kûrahiya destan û serpêhatiyan. Wekî ku Evdal îlmê sihêrê li serê wan xwendibû. Evdal, li wê derê, di nav kirasên xwe yên spî de, bi xwe bûbû lehengê efsane û destanan. Lehengekî zirav, dirêj, rûgeş û çavvekirî. Meriv digot qey, ew ji dewr, dewran û sedsalên kevnare hatibû.

Paşê, hêdî hêdî, civata Evdal belav bû, her yek bi derekî de çû. Edî êvar dibû. Xelk ber bi konên xwe diçûn. Evdal, Gulê, Temo, quling û çend dost û şagirtên Evdal, bi qasî bîskekî din jî, li bin daran man. Serpêhatiya Siyabend û Xecê Meyro û Bengîn, bi xurtî, bi bîra Evdal anîbû. Evdal, bêdeng, dipojinî. Bi me welê tê ku jixwe sedema wê bêdengiya boş ku piştî xelasbûna destana Siyabend Xecê di nav şagirtên Evdal û xelkê de hate pê, dîsan, ji ber Meyro û Bengîn bû. Siûda Xecê û Siyabend heşê guhdaran biribû ser hal û hewalê Meyro û Bengîn. Kesî nizanîbû ka çi bi serê wan de hatiye û ew ber ku de çûne.

Meyro û Bengîn kî bûn û çi bi wan qewimîbû? Em ê, hêdî hêdî, bên ser wan jî. Lê niha, jê re hê wext heye.

Dinya hinekî çiksayî bûbû. Gulê hate û kulavekî şivanan avête ser milê Evdal û taseke dew dayê. Gava Evdal weha destan û stranên dirêj digotin, Gulê jê re dew çêdikir û carina taseke dew didayê. Evdal, bêdeng, tasa dew wergirt û ew vexwar.

Tîrêjên roya ku diçû ava, li rûyê Evdal dixist û rengê rûyê wî yê spî diqulipand rengê sor. Li spêda Sîpanê Xelatê govenda rengan bû.

Evdal rabû ser xwe, gopalê xwe girte destê xwe, kirasê xwe dawşand û çend gav ber bi pêş çû, li wir, li pêşiya xwe, li asoya fireh û rengîn fekir, -bêyî ku tu tiştî bibîne. Hingê wî devê xwe vekir û bi keser got,

- Xwedayo, tu li gunehê Bengîn Tavbanûyê mêze bikî, tu wan ji siûda Siyabend û Xecê star bikî. Ew xort û evîndar in, gulên nûbişkovî ne, haya wan ji xirabî û kirêtiyan tune, wan nekî pariyê xirab û kirêtan.

Hingê Gulê xwe gihand cem Evdal û jê re got,

- Evdalo, mehrûmo, dîwar ji nemê dikevin, meriv ji xemê dikevin. Xem mexwe, roj bixêr, xeber pîroz e. Binihêre, ev du hevalên me ji riya dûr, aliyê çiyayê Şengalê hatine. Sado û Biro. Berî niha bi çend saetan, ew hatin, lê me nexwest ku te gotina xwe bibiriya. Xebera wan pîroz e, ew dibêjin, rêber û qilawizan şopa Meyro û Bengîn hilanîne û dane pey şopê. Vê êvarê, îşev, sibê, hema çi bigire, di nav avaçûn û hilavêtina tavê de, ew ê xebereke bigihînin me. Rêber, qilawiz, xort, dengbêj, gundî û şervan li rê ne. Ew derin û tên û her tiştî bi me digihînin. De were, tu hinekî bîhna xwe bide, hinekî rakeve. Ev bûn çend roj ku qet xew neketiye çavê te.

- Gulê, mehrûmê, zimanxweşê... tu xweş dibêjî, lê dilê şikestî nacebire. Şevereşa min, derdê Bengîn Tavbanûyê bûne kul û ketine dilê min. Ma ez rebenê Xwedê çi bikim?.. Eger dinya weha li ber min reş nebûya, eger mîrê min Tahar Xanê mêrxas û qedirbilind niha bijiya û em, xelkê vî welatê neçar weha peregende nebûna, ma halê me dê ev hal bûya? Ma

ez çi bikim? Yekbûn gir û çiyan dixîne, lê ew jî tune... Ma ji destê feqîrekî belengazê mîna min çi tê? Li milekî derd û kulên me, li milekî jî bêgaviya me...

Em ê niha Evdal, Gulê û yên mayî li serê Sîpanê Xelatê bihêlin û vegerin ser wan rojên ku dinya hêdî hêdî li ber Evdal bû zîndaneke reş û dinya wî ji ronahiyê qulipî reşahiya şevan.

## 2
## Pêveçûna Evdal û Gulê bi Şêx Silê re

Dinya çerx û felek û dolab û dewran e. Bayê felekê ji wir de tê, di vir re diqulipe. Iro şahî û şênahî, sibê nalîn û şîn e. Dinya, dinyeke kambax e, namîne ji tu siltan, hakîm, beg û mîran re. Rind zû derin, xirab singê xwe dadiçikînin meydana dinê û dimînine.

Tahar Xan hebû, kalemêrekî rind, yek ji mîrekên kurdan, bavê feqîr û fiqaran, dostê alîm û zaneyan, xwediyê heq, hiqûq, edalet, edet û toreyan. Erdê Tahar Xanê fireh û têrzad, hikmê wî nerm û adîlane bû. Heta bi deriyê tixûbê welatê Ecemê, bi deriyê tixûbê welatê çiyayên Qafqasê, deriyê mîrekanên Kurd Bêdlis û Heqarê hemû li ber hukmê wî bû. Koşk û qonaxên wî mezin, avahiyên wî xweşlihevhatî, meclîsa wî her tim geş bû. Rûyê wî bi ken, gotina wî xweş, rîha wî dirêj û spî, simbêlê wî badayî bû. Şeş jin, bihîst û yek zarok [heft law, çardeh keç], û bi qasî çil xulam, qerwaş û cariyên wî hebûn. Gava ew derdiket seyd û nêçîrê, geşt û seyranê, sê sed fêriz, leheng û ciwanmêr jî pê re diçûn. Dostiya wî dostî, qewlê wî qewl bû. Sifra

wî hazir, meclîsa wî şên, kitabxana wî dewlemend bû.

U Evdalê Zeynikê dengbêjê mîrekî weha bû.

Welatê kurdan, mîna her gavî, hingê jî, perçe û peregende bû. Welatê bêmal, bêkemal û bêdewlet di bin nîrên hukimdariyên Ecem û Osmaniyan de bû. Wan welat ji hev xistibû û her perçeyek dabûn mîrekî kurd û hemû mîrekanên kurd bi xwe ve girêdabûn. Herçî Osmanî bûn, wan welatê kurdan kiribûn warê lec û şeran û mîrekanên kurd jî kiribûn şervanên xwe û berdevkê Alî Osmanî. Gava Osmanî diçûn sefer û talanên welatên din, wan haziriyên xwe li welatên kurdan dikirin, kurd jî bi çek dikirin û ew bi xwe re dibirin. Gava xelk û dewletên din davêtin ser Osmaniyan, Osmanî ew dikişandin welatê kurdan û li wir, ew vedigevizandin. Ji ber ku welat asê, xelk şerker, îklim li wir çetin bû. Kurdan digotin, "mêr dimire nav dimîne, ga dimire çerm dimîne" û xwe davêtin nav agirên lec û şeran. Welatê bêpişt û bêxwedî bibû kavil û xirbe. Hatin û dewlemendiyên welêt vediguhezîn Stembolê, payitextê dewleta Alî Osmanî û diketin nav sandûqên zêr û yaqûtan ên saraya Osmanî û neçarî û belengazî dibû para kurdan. Osmaniyan pişta kurdan mist didan û wan mîna "egîd, fêrize û canfedayên dewlet û xelkê" bi nav dikirin, lê deriyê îlim, îrfan, zanîn û dewlemendiyê li ser wan digirtin û nedihîştin kurd bibine yek û rû ji nezanî û neçariyê badin.

Tahar Xan, mîrê rîspî, bi vê yekê dizanîbû. Wî dewr û dewran dîtibû û bi caran rûbarî dek û dolabên Osmaniyan hatibû. Zanîn û tecrube bûbûn rêberê wî. Lê wekî herkesî, ew jî ditirsî û bîr û baweriyên xwe li her civat û meclîsî nedigot. Ji ber ku derdê wî ne bi tenê Osmanî û zordariya wan bû, her-

weha pismam û birarzî jî lê ne durist bûn. Daxwaza kambax a hukimkirinê û mal û milkên dinê rû li pismam û birarziyan reş kiribû, ew ji rê derxistibûn û kiribûn dûvik, berdevk û peyayên Osmaniyan. Destiyê bivir ji darê bû û pê dara qehîm û kal dibirî.

Ji lewre, Tahar Xan, bi tenê, ji dostên xwe yên pir nêzîk, aqilmend, zana û dengbêjê xwe re deriyê dilê xwe vedikir û bîr û bawerî, şik û guman û daxwaz û hesreta xwe digot.

- Dijminê bav û kalan nabin dostên me kurdan, wî digot. Nanê Osmaniyan li ser çoka wan e, meriv nikare li wan bawer be. Çiya dikare here ser çiya, lê xûyê Osmaniyan jê nabe cuda. Dostiyeke durû, siyaseteke fetbaz û awirekî zordar xûyê wan e. Lê kevir û kuçên Xwedê jî li serê me kurdan barîne. Em kurd jihevketî, bêser û bêber in. Nezanî û cahîliyê em dîl girtine, şerê birakujî û ezbenîtiyê em kirine xezan û belengazên pêncperan. Em kurd li hev hatine xezebê; birarzî li apan, xwarzî li xalan, bira li biran, cîran li cîran...

Gotina Tahar Xanê weha bû, lê ji destên wî jî çi dihat, wî texsîr nedikir; alîm, zana û hunermend li dora xwe dicivand û qedr û qîmet dida wan; hal û hewalên beg û mîrên din ên kurdan dipirsî û gava qise dihat ser qisê, gilî û gazincên xwe ji wan re digot; bi rindî, nermî û edalet hukim li xelkê xwe dikir; wîjdan, serbestî û însaniyetê ji kesên nemuslîm, cihû, ermen, suryan, keldan, êzîdiyan kêm nedikir. U li aliyê eskerî jî, wî xwe bi quwet dikir.

U dengbêjê wî Evdalê Zeynikê jî dibû şahîdê vî hal û hewalî. Evdal ji meclîsa Tahar Xanê kêm nedibû û tim pê re bû. Evdal pê re xwarin dixwar, pê re radibû û rûdiniştin, pê re diçû sefer û ziyaretan, pê

re derdiket havîngeh û zozanan. Evdal hosteyê şixulê xwe bû. Di meclîsa şên û geş, şevên çile yên dirêj û rojên havînê yên germ de, wî destê xwe datanî ber guhê xwe û ji Tahar Xanê re distra.

*Ez Evdalê Zeynikê me,*
*Şahîrê dinê,*
*Şalûrê erdê me,*
*Ez dengbêjê Tahar Xanê kurdî me,*
*Ez bilbilê ber perê rojê,*
*Mêrekî çê, siwarê hespê Gogerçînê,*
*Aşiqê pelê Gulê me...*

Di wan rojan de ku Tahar Xan hê li ser xwe bû û dinya li ber çavên Evdal pak û ronî bû, rojekê ji rojên Xwedê, gava Tahar Xan û civata wî ji konaxa ku li ser donzdeh lingan avakirî û bi mermerê spî ferşayî bû, bi dernediketin û li derve fizîna bayê, gurîna birûskê û xuşîna baranê bû, hingê xeberek gihîşt qonaxê; kerwanek ji riyên dûr hatibû û xwe gîhandibû bajarê Tahar Xanê. Roj, rojên zivistanê bûn. Dinya aram, hawirdor tarî, hatin û çûyin kêm bû. Di rojên weha de, sebir û şênahiya civatê dengê Evdal, tembûr û bilûra wî bû. Wî qest li fizîna bayê, gurîna birûskê û xuşîna baranê dikir, bi kel û coş dengê xwe bilind dikir. Gava ew diwestî, jina wî Gulê, keça keşîşê bajarê Xamûrê, diya Temo, dengbêja dengxweş dihate hawara wî, dikire deng û dida olanê.

Hay lê yemanê, felekê yemanê, lê bêemanê Felekê... guhdar û xwendevanên delal, felekê di wan rojan de kumê xwe li ser Evdal xwar kir û ew ji ronahiya çavan, spehîtî û xweşiya dinê bêpar kir... Gava xebera gihîştina kerwan hate qonaxê, Evdal bi sermayê ketibû. Taya nexweşiyê ew bêhal

xistibû. Dengê wî ketî, devê wî qerimî bû. Nexweşiya wî gerçî sivik bû, lê jê re bîhnvedan û razan diviya. Eger wî hinekî li xwe biniherta, guh neda der û dora xwe, ew ê, dîsan, bi qesta ba, birûsk û baranê rabûya. Lê lîstikên bêxêr her gav dijminê daxwazên bixêr in.

Kerwan hatibû û li xanekî bajêr bi cîh bûbû. Baranê bernedida ku ew bi riya xwe de herin. Ew li xanê asê mabûn. Piştî çendekê, xebereke nû gihîşt qonaxa Tahar Xanê; dengbêjekî yeman jî bi kerwanê re bû û niha wî qest li ba, baran û birûskê kiribû. Navê wî Şêx Silê, dengê wî gur, awaza wî nerm, awirê wî xurt, stranên wî kemilî bûn.

Tahar Xan xeber şandê ku ew were qonaxê. Evarê, gava Tahar Xan meclîsa xwe gerand, Şêx Silê hat. Şêx Silê merivekî kin û jar, feqîr û neçar bû. Ew ne dengbêjê beg û mîran, dengbêjê rêvinge û kerwanan bû. Şêx Silê hate meclîsê, silav li Tahar Xanê û meclîsê kir û bêdeng, li ber devê derî rûnişt. Wext, wexta şîvê, sifra giran bû. Evdal jî, li jor, li kêleka Tahar Xanê rûniştibû. Tahar Xan deng li Şêx Silê kir û gotê,

- Mêvanê ezîz, silava te li ser seran û ser çavan e. Cîhê dengbêj û hunermendan ne li nav sol û pêlavan e, de fermo were kêleka min, nav dost û hevalan e.

Şêx Silê rabû, çû û li kêleka Tahar Xanê rûnişt. Niha Evdal li milekî, Şêx Silê li milekî rûniştibûn. Wan bi hev re, şîva êvarê, goştê pez û berxan xwarin. Bi dû xwarinê re, wan xwe dawşandin û qahwa xwe vexwarin û dest bi qise û axaftinê kirin. Meclîsa Tahar Xanê şên bû. Gelek axa, beg, giregir, alîm, zane û dengbêj û stranvanên kurdan li wir bûn. Gerçî axaftin û xeberê dest pê kiribû, lê kesên hazir li benda gotin û stranê bûn. Zimanê xelkê

bêhestî bû û wan weha digotin,

- Bavo, li gora gotinan, ev Şêx Silê jî ne kêmî Evdalê Zeynikê ye.

Piştî ku meclîs germ bû û meram û miraz hatin meydanê, Tahar Xanê deng li Şêx Silê kir,

- Mêvanê delal, me bihîstiye ku tu meriveki çê û dengbêjeki baş î. Çika tu dengekî derkeve û ji me re çend stranan bibêje.

Şêx Silê jî, jixwe, li benda qisê Tahar Xanê bû. Wî nav û dengê Evdalê Zeynikê pir bihîstibû. Niha ew hatibû û li kêleka Evdal rûniştibû û fersend ketibû destan ku xwe û hunermendiya xwe nîşanî hazir û guhdaran bide. Ew carekê-du caran kixuya, li dora xwe nihêrî û hêdî hêdî dest bi stranê kir,

*Li der rehma baranê ye,*
*Li hundir rehma Tahar Xanê kurdan e,*
*Deşt û zozanên Tahar Xanê di nav berf û pûkê de ne,*
*Ez rebenê Xwedê, Şêx Silê zimanxweş hatime ser sifra mezin, meclîsa girane...*

Bi vî awayî, bi pesn û qedirgirtin, bi rêz û rêzdarî, Şêx Silê bi qasî derengê şevê xweş kir û stran gotin. Derengê şevê, meclîs belav bû û herkes, yeko yeko, dudo dudo, derketin û çûn. Çend mêvanên Tahar Xanê hebûn. Wî Şêx Silê jî mêvan kir û berneda ku ew vegeriya xanê, cem hevalên xwe.

Dotira rojê qise, xeber û gotin, bi leza baran û birûskê, di nav bajêr de belav bûn. Xelkê digot,

- Bavo, Evdal hew dikare bibêje. Ew nexweş û kal e. Ev Şêx Silê dengbêjekî xweş, bi dilê we ye. Evdal xwe li nexweşiya giran datîne ku li hember Şêx Silê ranebe.

Hûn dibînin... xirabî weha nefesê li rindiyê diçikîne û tiştên kirêt li hev tîne. Ev qise û laqirdî çûn guhê Evdal, Evdal bû agirê pizot û kete meydanê. Wî hêkên xav vexwarin, şîr germ kir, rûn kiriyê û ew daqultand, qirika xwe girêda, cil û kulavên germ avêtine ser milên xwe, dengê xwe terbiye kir û ma li benda êvarê.

Evarê meclîs, dîsan, hate girêdan. Icar cîh tune bû ku meriv lê rûne. Meclîsa fireh û dirêj tijî bûbû. Hinan bihîstibûn ku Evdal ê jî wê şevê bigota, lê piraniya haziran ji bo dengê Şêx Silê hatibûn. Gulê û Temo jî dabûn dû Evdal û hatibûn. Gulê nedixwest ku Evdal rahişta stranan û bigota. Lê Evdal li kesî guhdarî nedikir. Ew dengbêjê welêt, şalûlê erd û esmanan bû. Tu kes bi ser wî re nîn bû.

Bi dû xwarin, vexwarin û xweşsohbetê re, meclîsê haziriya xwe û stran, gotin, ders û tecrubên wê şevê kir. Evdal, jixwe, hazir bû. Wî cîhê xwe rast kir, tembûra xwe xist destê xwe û ji Tahar Xanê xwest ku ew rê bidiyê da ku dest pê bike. Ev yeka ne bi dilê Tahar Xanê bû.

- Evdalo, dengbêjê min ê yektayo, tu nesax î, dengê te ketiye û tu dikuxî. De berde, bila mêvanê me, îşev jî, xweş bike, kul û birînan bikewîne, bi mexseda stranê, ders û tecruban bi meclîsê biguhezîne.

- Mîrê mino, Tahar Xanê dilpak, ez dengbêjê te, şalûrê erdê, şahîrê dinê, bilbilê ber perê rojê me. Ma di şeveke weha de, ez deng û awaza xwe bi esmanan negihînim û zora dengê baranê nebim, hingê dengbêjiya min li kû ma ye?

- Tu dizanî, Evdalê dengxweş. Hingê bila Gulê jî carina bê alîkariya te û gotina te bi gotina xwe rengîn bike. De baş e, hûn her sê dengbêjên navdar, Evdal, Şêx Silê û Gula bi nav û deng, bi tenê, bi

kilam û stranan bikine ceng. Em ê şevbihurkê xweş bikin û li we dengbêjan guhdarî bikin.

Bi ser gotina Tahar Xanê re, Evdal dest pê kir,

*Xweş e, şev xweş e,*
*Li der baran e, li meclîsa Tahar Xanê, dilê min bi kel û coş e,*
*Ev bûye çend roj û şev, ez diqîrim, naqîrim,*
*Sewta min dernayê, dengê min ketiye,*
*Icar gotin e, xweş gotin e, dermanê deng û bedena min e,*
*De fermo Şêx Silê, mêvanê pak e, gotina xwe bibêje,*
*Bi strana xwe rabe...*

Bi vê gotina Evdal, li wê derê, pêveçûneke welê dest pê kir ku ne îşê aqilan bû. Ew lec û pêveçûn bû efsane û çîrok û ket devê dengbêj û stranvanan. Di tarîxa welatê kurdan de, pêveçûneke welê nehatibû dîtin. Du dengbêj û hunermendê hoste ku tecrube, zanîn û dîtinên salan li pey wan bûn, rabûbûn hev. Lec, mîna lecê du teyrên sîmir, yan du direndeyên wekî şêr û pilingan, yan jî du lehengên efsanewî bû...

Guhdarên xwedîsebir, mixabin, gotinên me yên xav bi têra salixdana wî lecî nakin, lê lec bi dilê hazir û guhdaran bû. Evdal weha digot,

*Şev e, xweş şev e,*
*Çem û kahnî bi ser me de tên xuşexuş e,*
*Aliyekî me Rom e, yek Uris e, yek Ecem e,*
*Dengê min bilûr e, zimanê min qelem e,*
*Heval û dostên min, aşiq û dengbêjên vê dinê ne,*
*Ez ê îşev bibêjime, welle bibêjime,*
*Heta kurê kuran jî rabe, vê şevê bi bîr bîne...*

Şêx Silê jî, pêşî, bi bilûrê deng dida Evdal û paşê, bi gotinê, bersîv didayê,

*Lo yeman, lo hoste û qedirgiran,*
*Rast e, gotina te ye,*
*Şev e, xweş şev e, baran e dibare, xuşe xuş e,*
*Gelî hazir û guhdaran, ji bo navê Rebê Alemê, şahîd bibine,*
*Evdal e, dengbêjekî navdar e,*
*Rihana ber devê geliyan e, di wexta xwe de hêşîn dike, şax davêje,*
*Niha kalekî bi ço û gopalan e, sewta wî dernayê, dengê wî ketiye,*
*Hûn jê re bibêjin, de bila ew xwe bide aliyan e.*

Wê şevê heta destê sibê, her du dengbêjan stran û kilam gotin. Gotinên wan mîna dilopên avê li pey hev dihatin. Mixabin, me îmkan û ew hunermendî tune ku em niha wan dilopên zelal bireşînin ser van kaxizan. Lê belê, guhdar bi seriyekî mest û bi dilekî bi best ji meclîsê derketin. Gulê wê şevê devê xwe venekir û stran negotin, ji ber ku Evdal bi têra xwe bû.

Herçî Evdal bû, ji taqetê ketibû, heşê wî diçû û dinya li ber çavên wî bi mij û dûman bûbû. Evdal Gulê, Temo û çend dostên xwe şandin ser hekîm û xocan da ku ew jê re dermanekî peyda bikin û dengê Evdal pê vekin û ew dengê mîna lehiyekî boş, dîsan, here û xwe bigihîne keç û bûkên bajarên Stembol, Baxda, Tehran û Şamê. Gulê û hevalan xwe livandin, lezandin û dermanine bi Evdal gîhandin. Evdal ew li pey hev vexwarin û di ser de, hêkên xav, şîrê germ û hingiva şêrîn vexwarin.

Dotira rojê, danê êvarê, meclîsa Tahar Xanê dîsan geriya. Wê rojê kesî sebir nekir ku heta êvarê

bipa. Deriyên qesrê vebûn, mêvanên Tahar Xanê û xelk herikîn hundir. Xebera lecê dengbêjan li bajêr belav bûbû. Hewşa qesrê jî bi xelkê tijî bûbû. Xelkê kulav û cil avêtibûn ser serê xwe da ku xwe ji baranê star bikin û dengê dengbêjan seh bikin.

Bi dû gotinên Tahar Xanê re, Evdal û Şêx Silê, li hember hevûdu, cîhê xwe xweş kirin. Gulê û Temo jî li kêleka Evdal bûn. Evdal, bi gotin, dest pê kir,

- Mîrê min, gelî hazir û guhdaran, dîwan e, xweş dîwan e. Dîwan, dîwana Mîrê me Tahar Xan e. Em ê bibêjin bi îzin û destûr, heta em digihîjine derecê kûr.

Şêx Silê, bi gotin, lê vegerand,

- Rast e, gotina te ye. Xweş e, dîwana Mîr Tahar Xanê xweş e. Ez natirsim ji dengê baranê, ji ewrê reşe. Lê ez dibînim, halê te ne tu hal e, nexweşî li ber qirik û gewriyan e. Ez ji riya dûr hatime vira, meclîsa Tahar Xan e. Xwezî hinekî jî Gulê, diya Temo, dengbêja delal, dest pê bikira, bi min re bistira.

Gotina Şêx Silê ne bi dilê Evdal bû,

- Şêx Silê, heşê xwe berhevî serê xwe ke. Ez dengbêjê xelkê, dengê welatê me. Ez ji taqetê neketime, li her çar aliyê dinê geriyame. Min rewşa dinê, bûyerên dewr û dewranê kirine kilam û stranine. Gulê li vir e, li ba min e. Gava hewce be, ew ê xwe bi me bigihîne. Tu were, bala xwe li min vegerîne û bibîne ka dengê min çawan deriyê kahniya kilam û stranan vedike.

Lê belê, gotina Evdal jî ne bi dilê Gulê bû,

- Evdalo, malavayo, zarşêrîno... ma tu nizanî, ez Gul im, Gula dengbêj im. Ez li ber tu kesî xwe nahevînim. Ez çoka xwe didime çoka mêran û kilam û stranan davêjim mîna şêr û pilingan.

Bi dû vê gotinê re, ew li Şêx Silê vegeriya û gotina

xwe domand.

- Şêx Silê, ez Gulê me, ji jin û xatûnan hîn zêde me. Navê min Gulê ye, lê tu ji xwe re bibîne tevdîr û rêye. Ez ê vî danê êvarê stranan bavêjime ser teye. Ez Gulê me, gula Xamûrê me, kewaniya Evdalê lawê Zeynê me, diya Temo, dengbêjê dîwanan, serkara jinên welatê me.

Bi vî awayî, Gulê jî kete nav lec û şerê dengbêjan... Em gotinê dirêj nekin, pêveçûna dengbêjan du ro û du şevên din jî dewam kir. Tahar Xan, mêvanên wî, hazir û guhdar ji cîhê xwe nelivîn. Xwarin û vexwarin hatin û çûn. Li derve, xelk û şênî li hev civiyan, hejmara wan gihîşte bi sedan. Hewş, bexçe û ber dîwarên qonaxê tijî bû bi merivan. Baran nesekinî, ji bervajiyê, wê tewr şidand. Tişteki dê biqewimiya. Herkes li bendê bû. Lê çi?

Ew tiştê ku herkes li bendê bû, qewimî; ava reş bi çavên Evdal de hat. Dengbêjî hunermendî ye. Hunermendî jî ked, taqet û quwet e. Piştî pêveçûna çar rojan, Evdalê reben û nexweş, bi temamî, ji taqet û quwetê ket. Dinya li ber çavên wî reş bû, meclîs bû zîndan, çirûskên agirê tifikê bûn xalên tarî. Evdal di nav valahiyeke tarî de winda bû. Ew kete binê bîreke kûr û bêbinî. Çavên wî vekirî man, lê ronahiya çavan jê vekişî.

Ew wexta ku koranî bi ser Evdal de hat, dor, dora wî û gotina stranê bû. Ji nişkekê ve, wî dengê xwe birî û bi hêdîka li dora xwe nihêrî. Lê wî tu tişt nedît. Meclîs jî kete nav bêdengiyekê. Evdal çend car dest û tiliyên xwe li ber çavên xwe birin û anîn. Lê ji perda reşahiyê pê ve, wî tu tişt nedît. Hingê wî, bi keser û bi dengekî melûl, got,

- Tahar Xan, Mîrê mino... Gulê, mehrûmê... Temo, lawo... felek e, xayin e... Xayina felekê ev ji

bi min kir, ava reş bi çavên min de gêr kir, dinya li ber min heft qat binerd kir... Her du çavên min kor bûne, ji dengbêjî û stranan e. Temo, lawo... de rabe, bi destê bavê xwe bigire. Gulê, şêrîna ber dilê minê, de rabe, min bi doxtor û hekîman bigihîne...

Niha, piştî ku me serpêhatiya korbûna Evdal jî, bi peyv û gotinên xwe yên kêmbiha, weha salix da, em ê bi Evdal re herin û binihêrin ka çi pê diqewime.

## 3
## Salên reş û tarî

Dinya bi dor e, geh li jêr e, geh li jor e. Carina roj e, carina şev e. Ev, rê, adet û ûsilê dinê ye. Evdal, dengbêjê milet, bi carekê kor bû. Qudûma wî şikest, daxwaz û kêfa wî daket. Çaxa Evdal kor bû, salê wî nêzîkî şêstan bû. Birekî mezin ji jiyana wî, wekî ku birûskekî vede, hatibû û çûbû. Niha dinya wî guherîbû û heyameke nû dest pêkiribû; heyama reşahiya dinê û korahiya allemê.

Ji wê şeva ku Evdal kor bû û heta wê roja ku Evdal xwe li Sîpanê Xelatê girt, heft sal ji navberê bihurîn. Heft salên reş û tarî. Welê reş û tarî ku di her destpêka Newrozekê de, Gulê, ji kerba, digot, "sal bi sal, xwezî bi par."

Piştî ku Evdal kor bû, Tahar Xanê bijîjk, hekîm, şêx, melle û xoceyên dinê anîn ser Evdal. Wan çi derman li ber destên wan hebûn, dane Evdal, li serê xwendin, jê re berbejn, hicab û nivişt çêkirin. Lê çi feyde, dermanê Evdal tune bû. Korbûna Evdal li welêt belav bû. Ji her çar aliyên welêt, kalemêr, pîrejin, aqilmend, xwenda û zane, xwediyên îlim û îrfan, xwediyên kitêbên sihêr û

remlan hatin serîdana Evdal, lê jê re tu çare nedîtin. Ji wê rojê, Evdal têgihîşt ku çavên wî dê bi derman, giya, lêniherîn û xwendinê venebin. Ew têgihîşt ku şîfa çavên wî tişteki din e. Rojekê, gava oda wî, dîsan, tijî meriv bû, wî weha got,

- Gelî hevalan, nabe, ez bi Incîla Isa kim nabe. Ez bi Zebûra Nebî Silêman kim, nabe. Ez bi Qurana Mihemed kim, nabe. Heta miriyên sedsalan jî serê xwe ji tirbê hildin û ji gorê rabin, çavên bavê Temo û Tavbanûyê, ku ne bi emrê rehm, dilovanî û însaniyê be, bi hekîm û toxtoran qet sax nabe.

Herweha Evdal dest pê kir û kilam û stran avêtine ser korahiya xwe.

*Temo, lo lawo... ava Mirad û Firadê tê û gur dimeşe,*
*Tu rabe bavê xwe siwar bike li hespê kumeytî kapreş e,*
*Min ji av û çeman derbas ke, min bavê ser hekîmên Hebeşê,*
*Hekîmê bibê, Evdalê Zeynikê, çavên te kor bûn, eva çend e?*
*Ez ê bibêjim, çavên min kor bûne, îro bûye demek e,*
*Hekîmê bibê, Evdalê Zeynikê, çavên te ne koranî ye, ava reş e...*

Her heyam bi xwe re kirasê xwe jî tîne û li merivan dike.

Heyama nû guherînên mezin di jîn û mala Evdal de anî pê. Ew niha kor bû. Ew hew dikarîbû, her gav, her wext, li nik Tahar Xanê bûya. Gerçî Tahar Xanê ji qedr û qîmetê tu tişt kêm nekiribû û her tim hal û xatirê Evdal dipirsî, lê Evdal bi xwe, nedixwest bibe bar. Wî bi dilekî şikestî û keserkûr biryara xwe da;

wî dê hew dengbêjiya Tahar Xanê bikira û ji Tahar Xan tika bikira ku Şêx Silê bibûya cîgirê wî. Gava Tahar Xanê biryara Evdal bihîst, ew li ber biryarê ket. Biryar ne bi dilê wî bû. Lê biryara Evdal mîna hesinê pola bû, nedihate birîn.

Rojekê Tahar Xan, çend aqilmend û dostên wî û Şêx Silê, bi hev re, hatin mala Evdal û Gulê. Piştî silav û kilamê û hal, xatir pirsînê, Şêx Silê çû destê Evdal û ew ramûsî û got,

- Evdalê Zeynikê ye, pîrê me dengbêj û stranvanan e. Eger çewtî û qusûrekî min hebe, ez benî me, li min megire. Tu yî, dengbêjê xelkê, dengê welatê me û em hemû telebe û şagirtên te. Ez Şêx Silê me, li ser ders û şopa te. Bila derd û xem ji te dûr bine. Li min eyan e; li pey zivistanê bihar e, li pey tariya şevê ronahiya sibê ye.

Evdal destê xwe bir pişta wî û lê vegerand,

- Şêx Silê tu birarziyê min î, ez apê te me. Em dengbêj û hunermend mîna kurên malekê ne. Gava tiştekî li yekî qewimî yan bîhn li yekî çikiya, yê din berdewam e. Şîreta min li te, şîreta apan e; bi deng û hunermendiya xwe bawer û bilind, bi nefsa xwe camêr û rind be, deng û awazê Mîrê xwe, canfedayê zimanê welatê xwe be. Çi hekîm e, ji birînên xwe hînî hekimtiyê bûye. Bila riya te vekirî, oxira te bi xêr be. U ez dizanim; şevê here, roj ê bi ser min de were.

Tahar Xan jî bi derd û kul bû. Wî dikir, nedikir, tiştekî ji destê wî nedihat. Bêgavî û bêçaretiyê bîhn lê diçikand. Xwarin û vexwarina mala Evdal her li ser wî bû. Wî ji başan baş, ji xweşan xweş, tiştekî texsîr nedikir. Li welatên kurdan her beg, giregir û mîrekî bi dengbêjê xwe serbilind bû. Tahar Xan ji hemûyan serbilindtir bû.

- Evdalo, bextreşo, dengbêjê min ê yektayo, wî ji

Evdal re got. Tu bizanibî ku derdê te derdê min e, dengê te li ber dilê min e. Tu bizanibî ku ez dixwazim malê dinê, milkê Kurdistanê li ber lingê te birijînime. De bibêje, çi bi dilê te ye. Avahî û malekê ye? Mulk û aşekî ye?..

Hingê Evdal keniya û li Tahar Xanê vegerand,

- Mîrê mino, qeda bê mal û mulkê dinê, her tişt li aliyekî ye, ji meclîs û dîwana te bidûrketin derdekî bêhempa ye. Daxwaza min, sax û selametiya te, biserketina miraz û amanca te ye. Tu her hebî mîrê mino.

Lê mixabin, me çawan li jorê jî gotibû, di wan salan de, xirabî û nerindî li pey hev hatin. Bi dû korbûna Evdal re sê sal, Tahar Xan wefat kir, serê xwe danî axa sar, diyarê rehmetê. U bi axîn û nalîna hesreta welêt, axa bav û kalan.

Piştî korbûnê, bi qasî şeş mehan, Evdal û Gulê serê xwe dan ser hev, bi hev şêwirîn û xwe bi biryareke nû gîhandin; wan dixwest bajar terk bikira û xwe bispartina çiya û gundan. Evdal, bi alîkariya Temo, derket meclîsa Tahar Xanê û biryara xwe jê re got,

- Mîrê min, eger tu rê bidî, me dil heye ku em herin li gundekî bi cîh bin. Meriv divê pişta xwe yan bide mêrekî zexm, yan jî çiyakî asê. Min heta niha pişta xwe da mîrekî bêhempa, niha jî, em dixwazin, bi saya û alîkariya Mîrê xwe, pişta xwe bidin çiyakî asê.

Tahar Xanê ew bi dawet û dîlan, qedir û qîmet, deng û olan bi rê kirin. Evdal, Gulê, Temo, Bengîn, Meyro û sê dostên mala Evdal û Gulê yên dengbêj danê êvarekê dan rê. Bi qasî bîst siwarên Tahar Xanê jî, bi wan re, heta gundê ku ew ê biçûnayê, çûn û ew li wir bi cîh kirin. Gund li pala çend gir û çiyan ku li ser tixûbê Ecem bû, hatibû avakirin.

Di wan salan de, rewş li welêt, bi carekê, xirab bû. Li gelek deveran şer di navbera mîrekanên kurd, yan jî di navbera muslîm û nemuslîman de derketin. Welê dixuya ku tiliya dewleta Osmanê Alî di wan şeran de hebû. Ji ber ku bi geşbûna agirê şer re, Osmaniyan jî, bi ordiyên xwe, êrîş anîn ser kurdan. Wê demê du paşayên Osmanî Kör Reşîd û Pala Osman Paşayên malikşewitî welatê Kurdistanê bi ser û binê hev kirin û ew şewitandin. Her du Paşa jî dilxwar û zikreş, xwînî û mêrkuj bûn. Dewleta Osmanê Alî pê hesiyabû ku hin ji mîrekên kurdan li xwe vegerîbûn û bi doza yekitî û serbestiya welêt civat digerandin, xwe bi çek dikirin û haziriya şerekî fireh û dirêj dikirin.

Kör Reşîd Paşa ji bakûr, Pala Osman Paşa ji başûr, tevî ordiyên xwe, ketin welêt û çi hat ber wan, hilweşandin, şewitandin. Ordiyên wan bi quwet û bi hêz bûn. Kurdan nikarîbûn xwe li ber wan bigirtana û ew ji bo şerekî fireh ne hazir bûn. Her tişt, ji nişkekê ve, bi serê wan de hatibû.

Herçî Tahar Xan bû, ew bi xurtî li dijî kirinên Paşayên malxirab sekinî. Wî name şandin û meriv hinartin Stembolê û xwest ku Stembol rê li Paşayên zalim bigire. Lê wî tiştekî bi dest nexist. Ji bervajiyê, tiştên hebûn jî, ji dest çûn. Rojekê Kör Reşîd Paşa, tevî ordiya xwe ya stûr, avête ser erdê mîrekiya Tahar Xanê û di nav çend rojan de hemû mîrekî vegirt û çû li qonaxê Tahar Xanê rûnişt. Wî Tahar Xan, zar û zêç, alîm û aqilmend, rêber û kumandarên Tahar Xanê şandin Stembolê. Şêx Silê ku bûbû dengbêjê Tahar Xanê jî, pê re bû. Li Stembolê jî ew li giraveke pir dûr ku kesî nizanibû li kû ye, nefî kirin. Tahar Xan ji erdê bav û kalan, axa şehîd û evîndaran, warê şêr û pilingan, deşt û zozanan bi dûr ketibû. Ji navberê pir nebihurî, wî serê

xwe danî, li wir, li welatê xerîbiyê, çû rehmetê.

Bayê tofana ku li welêt rabûbû, pir bi zû, xwe bi gundê Evdal gîhand. Berî sê salan Evdal Tahar Xan û bajarê qedîm ê Tahar Xanê terk kiribû. U niha, piştê sê salan, bayê tofanê xwe bi Evdal jî digîhand. Gava Evdal xeber bihîstin, ew li cîhê xwe hişk bû, rengê wî qulipî, bû wekî rengê xweliyê. Ew bi hêdîka, li cîhê xwe, rûnişt û bi hêdîka got,

- Axxx feleke, xayinê axxx... te ev jî bi serê me de anî.

Bi dû vê cimlê re, çel roj û çel şev gotin ji devê Evdal derneketin û wî çel roj û çel şev, ji rojê taseke dew û gepeke nanê hişk pê ve, tu tişt nexwar û venexwar.

Em ê niha Tahar Xanê li gorê rehet bihêlin, li Evdalê Zeynikê, qehremanê çîroka xwe vegerin û wî bigirin û pê re herin cem şagirtên wî.

# 4
# Şagirtên Evdal

Bûyerên welêt û mirina Tahar Xanê dilê Evdal kir goristaneke wêran. Xem û keser bi ser wî de hatin, dilê wî bû payiza xem û keseran. Welê bû ku pir caran, ew bi rojan, li hundirê malê, li ser doşegan rûdinişt û bêdeng dipojinî. Bi dinya derve re têkiliya wî zêde nema. Bi tesîra bûyeran, ew hînî dinya koran bû. Perda sihêrîn a korahiyê li ser çavên wî vekişiyabû. Bêyî rengekî, rengên din ji ber çavên wî winda bûbûn. Bi tenê rengê reş mabû. Sorahiya hingurê, sipîhiya ewr û berfê, keskahiya deşt û zozanan, keskesora barana biharê, zerahiya ro û tavê winda bûbûn. Bi tenê reş, şevereş mabû. Gava ew ne kor bû û wî bi çavan ronahiya dinê didît, heşê wî qet neçûbû ser roj, danên rojê û guherîna rengên wan. Gelo rengê berbangê çawan bû? Wî rengî çawan xwe diqulipand ser rengê danê sibê? Danê êvarê, gava ro diçû ava, aso çawan xwe dineqişand û dixemiland? Ew zozanên bilind û asêyên welêt çawan kirasê zivistanê, berf û pûkê ji xwe dikir û kirasê biharê, nermî û germiyê li xwe dikir?

U ew şal, şapik, pişt, îşlik û kirasên rengîn ên

Tahar Xanê çawan dibiriqîn?

Di warên rengan de, Evdal şîn girêdabû. Edî ji mij û dûmana rengê reş pê ve, tu reng û celebên wan nîn bûn. Di wan salên reş de, pir caran, diya Evdal, jinebiya bextreş Zeynê dihate bîra Evdal... Em dikarin bibêjin ku Evdal bavê xwe nedît. Gava Evdal pir biçûk bû, bavê wî wefat kir. Ew maleke reben û belengaz bûn. Bavê wî şivanî û gavanî dikir û diçû ber pez û dewarên xelkê. Li welêt, zivistana berfa sor bi nav û deng e. Di wê zivistana berfa sor de, xela û nexweşiyê bi ser welêt de girtin û bi deh hezaran meriv birin gorê. Hingê bavê Evdal jî, Evdal û diya wî Zeynê li pey xwe hîştin û çû gorê.

Hembêza dê bû stariya Evdal. Zeynê nexwar, li lawê xwe da xwarin, li xwe nekir, bi lawê xwe da lixwekirin. Wê mêr nekir û li ber çoka lawê xwe rûnişt û ew xwedî kir. Mîna teyran, wê per û perwazên xwe bi ser lawê xwe de girtin û nehîşt ku felek û dewran li ser lawê wê bigerin. Hembêza Zeynê ji Evdal re bû warê germî, nermî, dilovanî, rehmet û şefqatê.

Lê diya Evdal, Zeyna bêçare, zêde umir nekir û çaxa Evdal hinekî mezin bû û êdî dikarîbû xwe bi hawara diya xwe bigîhanda, hingê Zeynê jî çavên xwe girtin. Evdal li meydana dinê bêkes û tenê ma.

Ew hembêza dilovan, gotin, çîrok, mesele û destanên şevan û xeberdanên mîna zêr û yaqûtan riya dengbêjî û hunermendiyê li Evdal vekir, jê re bûn kahniya jîn û afirandinê, hêz û quweta sebir û pêşketinê...

Hesreta malwêran dilê Evdal dikizirand. Wî bêrî li diya xwe Zeynê, mîrê xwe Tahar Xan û rojên xwe yên bihurî, kel û heyecana dil û dîtina çavan dikir. Lê ji destan çi dihat? Di wan rojan de, şevekê, Evdal xewnek dît. Wî di xewna xwe de her tişt bi çavan dît. Zeynê, Tahar Xan, Gulê, bavê Gulê, bavê Bengîn,

dengbêj û stranvanên welêt rûniştibûn û li çepikan dixistin û dixwestin ku Evdal stranan bibêje. Tevgera wan xurt, rûyê wan bi nûr bû. Wan bi kêf û henek bang li Evdal dikir. Şêx Silê jî li wir bû û li bilûrê dixist û rê li ber Evdal rast dikir ku Evdal destê xwe bibe ber guhê xwe û qutiya dilê xwe veke.

Dotira rojê, Evdal xewna xwe, bi girîn, ji Gulê re got. Girîna wî hem ji kêfxweşiyê hem jî ji xemgîniyê bû. Ezîzên ber dilê wî hatibûn xewna wî... lê, ew ê, êdî bi tenê, bihatana xewna wî. War û hebûna wan di jiyana Evdal de, êdî, xewn bû.

Gulê bi xebera xewnê kêfxweş bû û jê re got,

- Evdalo, mehrûmo, dermanê dil sebr e. Sebr jî ji xebat û şuxil pêkhatî ye. Xelkê baş gotiye; hesinê ku neşuxile, zengarî dibe. Ma te fahm nekiriye, ew bi çi amancî hatine xewna te? Ew dixwazin dengê de neyê birîn û dengê stranên te li esmanan be, lehiya dilê te nemiçiqe û her berdewam be.

Evdal bi hinekên din jî şêwirî. Wan jî mîna Gulê gotin. Bi ser gotina Gulê û dostên din, Evdal dîsan destê xwe bir ber guhê xwe û rahişte tembûr û bilûra xwe. Evdal Bengîn jî girt ba xwe û wan bi hev re, tarîtî û bêdengiya şevê qelaştin.

Bengîn êdî bûbû mêrekî çeleng û dengbêjekî jîr. Ew li ber destê Evdal mezin bûbû. Digel ku ew xort bû, dengbêjekî bi dilê we jê derketibû. Kemilandin û pêşketina Bengîn fikrek xiste heşê Evdal; ma wî nikarîbû xort li dora xwe bicivanda û ew hînî ders, adet û ûsilên dengbêjiyê bikira?.. Ev fikir kete heşê Gulê û heval û dostên Evdal jî.

Mekteba Evdal bi vî awayî hate meydanê. Hingê li welêt bi hezaran dengbêj hebûn. Hema çi bigire, di her war û gundî de, çend dengbêj hebûn. Dengbêjî, stranvanî, çîrokbêjî, govendgêrî bi qedir û qîmet bû. Welat feqîr û nezan, bi tenê û ji dinê dûr bû.

Xwendin û nivisîn kêm, qise û gotin bi quwet bû. Rêber, pêşeng û xwediyên qise û gotinê dengbêj bûn. Terbiye û perweriya dengbêjan ne bi xwendina mekteb, medrese û xwendegehan, lê bi ders û tecrubên jiyanê bû. Dengbêjî û hunermendî adetê bav û kalan bû, ji do hatibû, ber bi rojên bê diçû.

U pîrê dengbêjan Evdalê Zeynikê dest bi hînkirina ciwan û xortan kiribû...

Mekteba Evdal li welêt deng da. Ji gelek warî gelek xort hatin. Evdal li kêleka mala xwe du xanî dan avakirin û xort li wir bi cîh kirin. U axa, beg û mezinên kurdan bi mesref, xwarin û vexwarina şagirtan rabûn.

Hingê bîhna Evdal hinekî vebû, heşê wî hate serê wî. Ew mij û dûmana ku bi ser mala Evdal de girtibû, belav bû. Hilm û bîhna xortanî û şênahiyê li malê belav bû... Evdal bi kêf û daxwazî, bi karê xwe rabû. Wî dest pê kir û xort hînî adet, qayide, rê û ûsilên dengbêjiyê kir. Evdal dersên ziman û edebiyata kurdî jî dida û şaîr û nivîskarên kurd ên sedsalên 11-12-13-14-15-16-17-18-an bi şagirtan dida nasîn û şîîr û eserên şaîr û nivîskaran dixwendin. Evdal stran, destan, mesele û efsane şerh dikirin û kahniyên wan digotin. Dost û hevalên Evdal ên dengbêj jî dihatin, carina bi rojan, carina bi mehan, li wir diman û alîkarî li Evdal dikirin.

Evdalê dewr û dewran dîtî behsa tecrubên xwe dikir û şîretên xwe ji şagirtên xwe kêm nedikir. Carina wî weha li wan şîret dikir,

- Şagirtino, hêviya welatê mino... ji bîr mekin, dan û standina dengbêjekî û peyv û gotinê mîna dan û standina nêçîrvanekî û nêçîrê ye. Nêçîrvan divê hay ji rewşê û hal û hewalê dinê hebe; şop hilde, li şopê hûr be, xwe bide pey nêçîra xwe û wê bigire. U gava ew nêçîrê digire, dilovanî û nefsbiçûkî jê kêm

nebe... Dengbêjekî jî divê weha be. U hûn dizanin, gelo nêçîrvanê herî yekta kî ye? Ew kes e ku dizane riya nêçîrê ji kû dere û xwe bi wê riyê digire û dere li benda nêçîrê disekine da ku nêçîr bi xwe were... Hûn divê xwe bigihînin vî katî. Hûn divê peyv û gotinê bibêjin bi hostehî da ku gotin bi xwe were ber we bi rêz û rêzdarî.

Kêfa şagirtan pir ji ders û gotinên Evdal re dihat. Lê ji hemuyan pirtir, kêfa Meyro û Bengîn dihat.

Em ê niha, dîsan, vegerin ser çiyayê Sîpanê Xelatê û ji wir jî herin cem Meyro û Bengîn, dildarên bextreş ên vê dinyayê.

# ŞEV

# 1
# Agirê şeva çiyayê Sîpanê

Sîpanê Xelatê bilind e û serî bi mij û dûman e. Ew hevalê ewr û esmanan, heyv û stêrikan e. Dengê ba û bahozê, baran û birûskê, rawir û teyr, av û kahniyê û dengê Evdalê Zeynikê jê kêm nabe. Ew çiyayê destan û efsanan, hêlîna Xecê û Siyabendê û warê Evdalê Zeynikê ye.

Evdal, Gulê, Temo, hevalên wan, şagirtên Evdal û gelek kesên din, li serê Sîpanê Xelatê, li kêleka golê, li doraliya agirekî gur rûniştibûn. Derengê êvarê bû. Evarê xwe diqulipand şevê. Esman zelal, stêrk ronî bûn. Heyf dibiriqî û diçû ava. Dinya çiksayî bû. Şewqa êgir û stêrikan li golê dixist û ava golê pê dibiriqî. Dengên ku heval û hogirên Sîpanê Xelatê bûn, bi dengê Evdal re yek dibûn.

Li Evdal beyan bû; ew şev, şeveke pîroz bû. Wê şevê dê tiştine mezin, ecêbine giran biqewimiyana. Jina Temo Zînê li ber welidandinê bû. Keser û kerba Evdal kel dabû. Xwendina quling bêpayan bûbû. Hejmara şênî û xelkê pir û pir zêde bûbû. Ji çiyayê Şengalê, warê Meyro û Bengîn, dengbêj, nûçevan û xeberguhêz, her bîskekê, dihatin û xeberên nû dianîn û gulokên agirê serê Sîpanê

Xelatê, her ku diçû, zêde dibû. Wê şevê dê tiştine biqewimiya...

Ji lewre, Evdal nexwestibû li nav konê xwe yê reş rûne. Ew tevî civata xwe hilkişiyabû serê çiyê, nav şeva reş. Civat û xelkê jî dabûn pey wî, ji konên xwe derketibûn, hilkişiyabûn serê çiyê, li wir, li kêleka golê, bi êzingan vêxistibûn agirekî germ û geş. Lê xelk ewçend pir bû ku ew mecbûr mabûn peregende rûnin û cihê cihê agir vêxînin. Li her alî, xelk, kom bi kom, rûniştibû. Li serê çiyê û li her aliyê pal, quntar û kendalên çiyê agir hatibû vêxistin û di nav şeva reş de, çiya sor dikir. Meriv digot qey, dilê çiyê hildavêt û ew hatibû xezebê.

Wê rojê, ji destê berbangê heta şevê, bêyî ew kêlîkên kin ên xwarin û vexwarinê û çûyin û hatina konê, Evdal her û her gotibû. Geh bi kilam û stran, geh bi tembûr û bilûr, geh bi qise û gotin. Evdal li rojên xwe yên kevn vegeriyabû û bûbû mîna berê. Awaz û dengê wî diheriki û dem, dewr û dewran dida ber xwe. Sîpanê Xelatê bi serîhildana dilê Evdal olan dida. Olana dengê Evdal ji çiyê xwe diguhezand hemû aliyên welêt.

Şev hatibû, Evdal, kulavên şivanan li ser milê wî, li ber êgir rûniştibû û digot,

*Ez Evdal im, ez Evdal im,*
*Ji ber neheqî û bêbextiya vê dinyayê, ji kezeba xwe birîndar im,*
*De hekîm û doxtoran bînin ji bo her du çavan, ez Evdal im,*
*Ez birîndar im, ez heval im...*

Şewqa êgir li rûyê Evdal dixist û rûyê wî, mîna dilê wî, germ dibû. Rûyê Evdal sor dikir. Çavên wî yên nedîtî vekirî, rûyê wî ber bi êgir bû. Wî

dizanîbû, dinya wî bi rengê tarî pêçayî bû û êzingên ber wî bi rengekî sor û xweş dişewitî. Wî dil dikir ku rengê sor zora rengê reş bibe û loma wî digot û digot. Ew pê dihesiya ku stêrk û çirûskên êgir diketin nav hev û serê Sîpanê Xelatê û esman bi hev re dibû yek. Wî dixwest ev xweşiya dinê bidîta. Wî dixwest bibîne, bi çavan li dinê binihêre. Bi dû stranê re, îcar bi gotin, wî ji guhdarên xwe re got,

- Gelî guhdaran... şevê kirasê xwe yê reş avêtiye ser me. Agirê li ber me kirasê şevê dişewitîne. Hûn bîr bi tiştan dibine û dizanine, gava meriv nikaribe bi roniya çavan bibîne, hingê meriv dijî bi daxwaz, xwezî û hesretane. Dîtina hilatina tavê hesreta min e. Lê, şevê ez dîl girtime, li ber çavên min her û her şev e. Şev, şeveke dirêj, bêser û bêber e, kirasê xwe bi ser min de kişandiye, ji min bi dûr nakeve. Ez stranan davêjime ser siya dewranê, şaşiya dinyayê û lehîzvanên vî şaşiyê em merivane. Reşa şevê ez xistime ser rê û rêwîtiyane. Bi stranan, ez digerime li nav gund û bajar û welatane. Dinya ava ye, herkes bi aqilê xwe tê de şa ye. Şahiya min ziman û stranên kurdî ye. Şahiya min agirê dilê min û hûn xort û çelengên welatê me ne. Xweziya dilê min ew e ku agirê dilê min bişewitîne kirasê şevê, tariya zîndanane.

Evdal bi dengekî zîz û melûl dipeyivî. Hesret û qîrîna dilê wî dilê guhdaran dişewitand. Wî pir bi giranî û bi keser gotinên xwe digotin û dilorand. Hin jinên civatê hêdî hêdî digiriyan. Gulê jî, li kêleka Evdal, hêsirên çavan li ser hinarikan, bêdeng, dibarand. Evdal fahm kir ku Gula wî ya dilbirîn hêsir dirijand û gotina xwe dadiqurtand. Hingê Evdal bi destê Gulê girt û gotina xwe lê vegerand,

- Mehrûmê, Gula minê, dilsoza qewlê minê...

megirî, melorîne. Li ser rûyê xweş û sorhinarî hêsiran mebarîne. Ez ê li ser siûda xwe û quling û li ser siûda Tavbanû û Bengîn kilam û stranan bibêjime. Li jor Xweda kerîm e. Ev heft salên min temam e, ez kor bûme, min ji hekîm û doxtoran hêvî biriye, li hêviya quwet û hîkmeta Sîpanê Xelatê mame... Gula minê, şîrhelalê, bila şîrê te li te helal be, ka em binihêrin, dawiya me çawan dibe...

Gulê destê Evdal mist da, ew ramûsî, li ser rûyê xwe gerand û hingê, bi girîn, li Evdal vegerand,

- Evdalo, mehrûmo, sebra ber dilê mino... Ez Gulê me, gula xweşbiharê me. Ez bala xwe didimê, feleka Evdalê min, paşiya hemûşka wê kulek tê. Ez deng lê dikim, dibêjimê, "felekê, tu qet xêrê nebînî, xêr bikî, xêr nebînî, çima tu Evdalê min ê lawê Zeynê dêşînî, nemerd û neçêyan bi wî dikenînî?.. De felek, sed car felek... ev bûne heft sal, ez kil nadim ser çavên belek. Eger bibûya, li dinê biqewimiya, min ê her du çavên xwe, bi helalî û xweşî, bi çavên Evdalê xwe re biguheriya." Evdalo, mehrûmo, bila dil bi dil be, cîhê meriv zîndana sar û tarî, xwarina meriv xwelî, balîva bin serê meriv kevir be. Heta ez hebim, quwet terkî min neke, ez ê li vir bim, li cem te. Ez ê bi bîr bînim wan rojên me, evîna min û te. Ji destê min çi hate, ez ê bikime ku biguhere siûda te.

Wê şevê herkesî pişta xwe dabû felekê, oxira xwe dabû dinê. Dinya, warê tevger, bûyer, guherîn û ecêbên giran bû. Her tişt lê diqewimî. Xelk li hêviya bûyer û guherînên dinê bû. Pêla xelkê rabûbû. Agirên ku ji serê çiyayê Sîpanê Xelatê radibûn, welat ronî kiribû. Bê qîrîn û teşqele, bê lec û şer. "Destê tenê şêrê zozanan be, deng jê nayê", ev gotina Evdal ji guh veguhezîbû guh û xelk pê rabûbû, xwe bi çiyayê Sîpanê girtibû. Bêdeng, bêpejn, bêwest û

bêrawest. Bi germiya dil, hizra heş û heyecana ruh. Di derengê wê şevê de, Evdal loma ji şagirtên xwe re weha digot,

- Şagirtino, dilgeşino... hûn dengê xelkê ne. Hûn bendewarên ruhê wî, qasidên hîs û canê wî ne. Bilivînine, bilezînine, mîna min, gotina do û pêr werbigirine, gotina xwe lê zêde bikine, li gora xwe biguherînine û bi pêşerojê biguhezînine. Hûn bi xwe biafirînine, siûda merivan û halê bûyeran bikine kilam û stranine. Bila kêmaniya hunermendiyê tê de nîn be û ew lihevhatî bine. Li xelkê guhdarî bikine, pê alaqadar bine, bala xwe bidinê û wan seh bikine, bi gotina xwe, bi rabûn û rûniştina xwe nerm bibine, qedrê gotina xelkê bizanine, li zexelî, xeletî û çewtiyên xwe mukir werine, gotina xelkê mebirine, bîhnfireh û bisebr bine. Xêr, feyde û sûda welat, xelk û zimanê xwe li ser her tiştî re bigirine...

Derengê şevê, gava zarok û xort ketibûn xewê û êdî bûk û zavayên nû çûbûn û ketibûn nav konên xwe û civata serê Sîpanê Xelatê sist bûbû, hingê xebereke nû veguhezî civatê. Sê siwar zengû dabûn hespên xwe û heta qonax bînine ser çiyayê Sîpanê Xelatê nesekinîbûn . Ew ji çiyayê Şengalê hatibûn. Li gora xebera wan, şopa Meyro û Bengîn digihîşte heta ber devê çem û newalekî çiyê û xelkê xwe dabû ser şopê. Lê wan nizanîbûn ka Meyro û Bengîn sax bûn yan nesax.

Xwendevanên bîhnfireh û bisebr, niha wext hat... em ê, îcar, bên cem Meyro, keça bextreş, bûka ciwan û bizanibin ka Meyro kî bû û çi pê qewimîbû.

## 2
## Meyro

Siûda keça sêwî Meyro xirab bû. Gava ew hate dinê, nivîsa eniya wê xirab hatibû nivisîn. Meyro keçeke ermen bû. Bav û diya wê du gundiyên ermen bûn û li aliyê serhedê, bakûrê welêt, li gundekî ermenan dijiyan. Ew di halê xwe de bûn û haya wan ji dewrana dinê tune bû. Bi qasî bihustekê erdê wan hebû û pê, bi zehmetî, debara xwe dikirin. Ew li wir çend gundên ermenan bûn û li doraliyê wan, gundên kurdan hebûn. Kurd û ermenan li hev dikirin, diçûn û dihatin ser hev û bi hev re merivatî û kirîbatî danîbûn. Dinya wan bi tenê gundên wan bû û ew jî bi qîma wan bû. Pariyekî nan, seriyekî pîvaz kêfxweşî û şênahiya wan bû. Wan ji kesekî tiştekî nedixwest û dia dikirin ku kesekî ji wan tiştekî nexwaze.

Lê wan nizanîbû ku şûrê dewleta Osmanî ji kalan kişandî bû û li ser serê wan hilawestî bû. Wan ji kesekî tiştekî nedixwest, lê dewleta Osmanî Alî, wekî ji her kesî, ji wan jî her tişt dixwest. Rojekê, gava Osmanî û Uris ketibûn nav şerekî dijwar, hilma agir xwe gîhande wan gundan jî.

Dewleta Osmanî li ermenan jî hatibû xezebê. Li gora gotina dewletê, mafir ermenan jî piştgirtî li ûrisan dikir. Osmaniyan dek û dolap li serê ermenan digerandin. Herkesî pê dizanîbû; kîn, nefret û rika Osmaniyan bêhed û bêhudûd bû. Osmaniyan ew kêfxweşiya pariyekî nan û seriyekî pîvaz ji gundiyên ermenan re pir dîtin û avêtin ser gundên wan, agir li wan barandin, mal û mulkê wan hilweşandin û şewitandin, xortên wan kuştin, kal û pîrên wan nefî kirin pey heft welat û diwêlan, gundên wan bi erdê re yek kirin, talana wan rakirin, pez û dewarên wan bi xwe re birin û tovê ermenan qelandin.

Welat dîsan ketibû nav nalîn û şînê.

Di wan rojên reş de, ji bo gerandina hin kar û şixulên Tahar Xanê, Evdal, tevî çend aqilmend û qumandarên Tahar Xanê, li bakûrê welêt, nêzîkê şer û tofanê bû. Gelek melle, şêx û axayên kurdan jî alîkarî li osmaniyan dikirin û bi karê wan ê kirêt radibûn û ermen dikuştin. Ji ber ku ermen xaçperest bûn. Ol û dîn zora însaniyetê biribû.

Evdal li wan gundan digeriya û hawar li kurdan dikir û digot,

- Kurdino, qasit bêzewal e. Ez dengbêjê xelkê me. Mekine, ermenan mekujine. Ermen pismam û cîranên me ne. Guh medinê, xedar û mêrkuj bê nan û xwê ne. Bêbextiyê li ermenan mekine. Bêbextî ne karê camêran e.

Lê di nav wî agirê lec û şer de, Evdal nikarîbû dengê xwe bi kesî bigîhanda û ji destê wî, ji gotinê pê ve, tu tişt nedihat.

Rojekê, çaxa ew li gundekî bûbû mêvan, wî bihîst ku çend gundiyên wî gundî çar zarokên ermen ji mirinê xelas kirine û ew anîne gund û veşartine. Gundiyan zarok nêzîkê gundekî erme-

nan, di nav daristanekê de, dîtibûn. Zarok li dora miriyekî rûniştibûn û dikirine qîrîn. Welê xuyabû mirî gundiyekî ermen bû û wî zarok bi daristanê gîhandibûn û li wir, ji ber birînên xwe, miribû.

Gava Evdal hebûna zarokan bihîst, wî xwest wan bibîne. Zarok çar bûn, sisê law, yek keç. Umrê wan di navbera du û çar salan de bû. Ew xweşik û şêrîn bûn. Haya wan ji xezeba osmaniyan, tofana qirbûna ermenan, siûda bav û diyên wan nîn bû. Dilê merivan bi wan dişewitî. Gunehê Evdal pir bi wan hat. Çi sûç û gunehên wan zarokan hebû? Çima bayê felekê li ber guhê wan ketibû? Evdal bi dûr û dirêjî li wan nihêrî. Yek ji yekî xweştir bû. Lê xweşa hemûyan keçik bû. Rûyê wê ronî, henarikên wê sor bûn. Porê wê dirêj û zer, endam û awirê wê rind bû. Li serê kincin tenik û qirêj hebûn. Evdal destê keçikê xiste nav destê xwe. Destê wê pir biçûk û wekî pembû nerm bû. Keçik bi hêdîka li hembêza Evdal rûnişt. Evdal lê keniya, destê xwe avêt ser porê wê û ew mist da. Hingê dilê Evdal bi germahiyeke boş tijî bû, nûra hezkirin û şefqatê di hundirê wî de veda.

- Eger we jî qebûl be, ez dixwazim vê keçika mehrûm bi xwe re bibim û bikime keça Gulê û xwişka Temo, Evdal bi carekê got.

Ev gotina Evdal rê li jiyana Meyro beyan kir û qedera wê bi mala Evdal re yek kir. Her çiqas Temo gêjokî bû jî, dîsan, Evdal û Gulê xwediyê lawekî bûn. Eger Gulê bi nexweşiyê neketiba, wan ê ji Yezdanê mezin keçek jî bixwesta. Lê Gulê bi nexweşiyê ketibû... Niha, bûyerên nexweş lê anîbû; keça ku wan ewçend dixwest, hatibû ber wan.

Gava Evdal vegeriya malê, wî keçik danî pêşiya xwe, ser pişta Gogerçîn û hesp da xarê û hate malê. Gulê keçik bi dil û can qebûl kir, ew car bi car

hembêz kir, maç kir. Temo keniya, pêl pêl, li keçikê nihêrî û ji kêfxweşiyê, tiliya keçikê gez kir. Gulê keçik şuşt û paqij kir, porê wê şeh kir, guliyên wê hûnandin û kincên nû lê kir. Welê dixuya ku kêfa keçikê jî, ji germiya malê, hilma şefqetê re hatibû.

Keçik bênav bû û jê re navekî diviya. Hingê Evdal got,

- Gulê, rebenê... êdî diya vê pepûkê tu yî. Tu bi xwe, bi dilê xwe, navekî lê ke.

Bi vî awayî, Gulê navê keçikê lê kir; Meyro. Lê gava keçik hinekî mezin bû û li hev hat, Evdal jî navekî lê kir. Çaxa umrê keçikê gihîşt dehan, keçik bû çilkeke zêr û tava destpêka havînê. Hingê Evdal navê wê kire Tavbanû. Wê mîna tavê şewq dida, dilê merivan germ dikir. Evdal ew, bi tenê, bi Tavbanû bi nav dikir. Evdal digot Tavbanû, heft Tavbanû ji devê wî derdiketin.

- Tavbanûyê, delala minê... Tavbanûyê, porzerê, çavbelekê, sorgula minê... Tavbanû, de were bixwe. Tavbanû, de ji me re strana Kezîzerê bibêje. Temo lawo, de bi destê Tavbanûyê bigire, wê bibe, bigerîne...

Evdal navê Tavbanû ji destaneke navdar a kurdan Memê Alan wergirtibû. Di wê destanê de, lawê çîrokê Memê, keça çîrokê jî Zînê ye. Ew her du dildar û evîndarên hevûdu ne. Lê qedera wan xirab, dawiya wan bi xwîn e. Cara yekî, sê qîzên padîşahê periyan Mem û Zînê tînine ba hev ji bo qise û laqirdiyane. Her sê qîz perî ne, bi pel û bask û perwaz û kezî ne. Stêrbanû navê biçûka xwişkan e. Navê xwişka navîn Heyvbanû ye. U navê xwişka mezin Tavbanû ye.

Bi vê terhê, Evdal navê keça padîşahê periyan veguhezand roja xwe û navê keça xwe Meyro ku mîna periyan bû, kire Tavbanû. Lê bi tenê Evdal jê

re digot Tavbanû. Gulê, Temo û kesên din jê re digotin Meyro.

Meyro, roj bi roj, mezin dibû û mîna gula bexçê Tahar Xanê vedibû. Wê ji Gulê re digot dayê, ji Evdal re bavo, ji Temo re keko. Meyro şên û şênahiya malê bû. Ew, ne bi tenê, bûbû keça Gulê, herweha, bûbû heval, hogir û sirdara wê jî. Ew her gav bi hev re bûn û her tiştê xwe ji hev re digotin. Evdal û Gulê ew hînî kilam û stranê kir. Gulê ew hînî xwarin, vexwarin, lixwekirinê kir. Gava salê wê kete çardehan, Evdal û Gulê li cem wê rûniştin û jê re behsa serpêhatiya bav û diya wê û ermenan kir. Bêguman, tiştên ku wan jê re gotin, dilê Meyro şewitand, lê wan nedixwestin xwe ji rastiyê bidin alî û jiyana Meyro bi teşiyeke zirav û tenik biresin. Ew keça wan, ezîza ber dilê wan bû, lê diviya wê reh û rêçên xwe jî binasiya.

Bi dû aşkerekirina serpêhatiya dê û bavê Meyro re, Meyro kete nav xem û xeyalan. Ew sist bû, bêdeng ma, ji xwarin û vexwarinê ket. Li malê, rûyê wê dîsan bi ken bû û wê ji rêz û rêzdariyê tu tişt kêm nekiribû, lê nêrîna wê bêşewq, heşê wê li derekî din bû. Evdal û Gulê pir li ber vê rewşê diketin û dikirin, nedikirin, nikarîbûn Meyro ji tora xem û keseran xelas bikin. Gulê dihat, dilê wê digirt, lê tika û lave dikir û digot,

- Keça min, porzer û çavbeleka min... gava ez te weha melûl û xemgir dibînim, kezeba min dişewite, agir bi dilê min dikeve. Ez heyran û qurbanê, weha meke. Ez û Evdal dê û bavê te ne. Tu dizanî, ez jî ermen im, lê ez bi yekî kurd re, Evdal re zewicî me û ji min mesûd û bextiyartir kes tune... Navê te, min li te kiriye. Ev nav, navê diya Isa pêxember e. Keça min, her pexemberî dia li nefsa xwe kiriye. Insan însan e, çi kurd, çi ermen, çi muslîm, çi xaçperest...

Qise û gotinên Evdal û Gulê zêde tesîr li Meyro nekir, lê bi hebûna Bengîn û geşbûna evîna wan, wê, hêdî hêdî, xem û keser ji xwe bi dûr xistin û dîsan hate ser xwe.

Meyro bûbû heyva çardê mehê. Keçikeke welê jê derketibû ku her gav li ber çavên meriv bûya, meriv ji dîtina wê têr nedibû. Bejna Meyro, mîna şitla dara henarê, dirêj û zirav bû. Rû û hinarikên wê, mîna pelê sorgulê, sor bûn. Wê lîlok û kereb li ser qirikê girêdabûn û zêr û benî di ser memikan de berdabûn. Her aliyê wê li cîh û lihevhatî bû. Ew xweşik, nazik û tenik bû. Gava Bengîn stran davêtine ser Meyro, wî weha digot,

*Bejna Meyro ji gulan hêşîn e,*
*Li serê wê sîh û sê kezî ne,*
*Di navbera memikên wê de sîh û sê kahnî ne.*

Bi rastî jî, cemal û endama Meyro li gora gotina Bengîn bû. Gava Bengîn stran davêtine serê, wê jî dikir pîrqîn û ji wir direviya. Ew şermok û fedîkok bû. Ew mîna melayikekê masûm û zelal bû.

Niha, em ê Meyro li vir bihêlin û werin cem heval û evîndarê wê Bengîn.

# 3
# Bengîn

Gava bavê Bengîn Biroyê Dengbêj û Bengîn, bi hev re, li ser hespekî kihêl, ji dûr ve xuyabûn û hatin bajarê Tahar Xanê, hingê kesî nizanîbû ku qedera Bengîn û Meyro dê bibûya yek. Wê gavê Bengîn yanzdeh, donzdeh salî bû. Diya wî miribû û ew û bavê xwe, li rûyê dinê bi tenê mabûn. Bavê wî Biro dengbêjekî baş, merivekî dilpak bû. Piştî mirina diya Bengîn, bavê wî nezewicîbû. Ew ji eşîreke koçer bûn û wekî eşîra xwe, ew jî bi awayekî koçerî dijiyan. Bihar û havînan wan berê xwe didan quntarê çiyan, deşt û zozanan û payiz û zivistanan jî, wan xwe dispartin gund û bajaran.

Biroyê Dengbêj dostê Evdal bû. Wan salê carekêdu caran hevûdu didîtin, hal û hewalê hev dipirsîn û bi hev re stran digotin. Gava ku Bengîn û bavê wî hatin bajêr, payiz bû. Ew ê wê payiz û zivistanê li bajêr bimana û biharê xwe dîsan li hûnikahiya çiyan bigirtina. Evdal ji wan re, nêzîkê mala xwe, maleke biçûk peyda kiribû. Ew hatin û li malê bi cîh bûn. Lê Evdal û Gulê bernedidan ku ew li malê bisekinin. Ew bi şev û roj li mala Evdal bûn. Herçî

Bengîn bû, ew ji wir dernediket. Ji ber ku wî, li wir, ji xwe re du hevalên bijarte peyda kiribûn; Meyro û Temo. Meyro, hema çi bigire, di salê wî de, Temo jê mezintir bû. Lê herwekî ku hûn pê dizanin, Temo mîna zarokekî bû. Xwîna wan li hev keliya û ew bûn hevalên dil û can. Bengîn û bavê wî şîva êvarê li mala Evdal dixwarin û pir caran li wir radizan.

Evdal û bavê Bengîn Biro jî, her gav, bi hev re bûn. Evdal Biro bi xwe re dibir dîwana Tahar Xanê û sifre, dîlan û dawetên dost, heval, beg û giregiran.

Biroyê Dengbêj meriveki dirêj û hinekî qelaw û xweşsohbet bû. Wî li henekên meclîsan, sohbeta şevan, strana zozanan û kenîna qise û gotinên xweş hez dikir. Ew şên û bi ken bû. U kêfxweşiya wî ya herî mezin li tayê dinê lawê wî Bengîn bû. Bengîn her tiştê wî bû; lawê wî, hêviya wî, domdarê tov û şopa wî, roniya çavê wî... Wî dixwest ku Bengîn zû mezin bûya û biketa nav refên peya, ciwanmêr, leheng û qehremanan. Loma jî, wî pir zû Bengîn ji şîr da birîn, hê ew pariyekî zarok bû, da sinetkirin, goştê xav dayê, bilûr xiste devê, libas û pêlav lêkiriyê, bi xwe re bir nêçîr û seydê û dîwan û meclîsê, li hespê kir, ew bajar bi bajar, gund bi gund gerand. Bengîn ev hemû tişt pir bi hêsanî hîn bû û pejirand. Gava ew zarokê hembêzê bû, wî tiliya xwe dikir devê xwe, dikeniya û çavvekirî radiza. Hê hingê xelkê digot, "ev tişt nîşanê aqil û fahmê ye." Daxwaza hînbûnê û meraqa wî li ser tiştan pir bû. Wî her tişt dipirsî, dixwest her tiştî bizanibe. Hê di zaroktiyê de, ew hînî mêrî û peyabûnê bû.

Lê li mala Evdal, wî zaroktiya xwe jî peyda û keşf kir. Li wir, wî hevalên mîna xwe, di umrê xwe de dîtin. Kêfa Bengîn û bavê Bengîn bêpayan bû. Her tişt bi dilê wan bû, heta ku rojeke ji rojên zivistanê, bavê Bengîn Biroyê Dengbêj ji nav cîhên xwe

ranebû. Her serê sibê di destê berbangê de, Biro hişyar dibû û ji nav nivînan derdiket. Lê wê rojê, wî kir, nekir, nikarîbû rabûya. Eş û janeke xedar ketibû canê wî û wî nikarîbû li ling û bedena xwe hukimbikira. Evdal hekîm û zane anîn ser Biro. Hingê wan fahm kir ku Biro nexweş bû û nexweşiya wî xedar bû; ew bi jana zirav ketibû. Piştî demekê wî dest pê kir û xwîn verişî. Hekîman derman didayê, lê nexweşiyê kezebên wî vegirtibûn. Ew ji teqet ketibû û roj bi roj fera çavên wî vedimirî. Bengîn her tim li ser serê bavê xwe bû û ew bi tenê nedihîşt. Ew dihat li kêleka nivînên bavê xwe rûdinişt û pê re dipeyivî. Biro jî destê Bengîn digirt nav destê xwe û ew datanî ser dilê xwe.

Di wan rojan de, Evdal, Gulê, Bengîn hê bi nexweşiya bavê Bengîn mijûl bûn, rojekê Bengîn, gava ew li mala Evdal wan bû, kete erdê. Heşê wî çûbû. Hekîm hatin ser Bengîn jî. Nexweşiyê xwe veguhezandibû Bengîn. Ew jî bi nexweşiya bavê xwe ketibû. Lê nexweşiya wî hê nû dest pê kiribû. Bi vî awayî, Bengîn û bavê Bengîn Biro ji hev hatin veqetandin û wan hew hevûdu dîtin.

Bi qasî du mehan, Bengîn di nav ciyan de, razayî ma. Gava ew ji nav nivînan derket û rabû pê, êdî her cîh di nav hêşînahiyeke xweşik de bû. Dinya germ bûbû û ronahiyê hawirdor vegirtibû. Heta hingê jî, haya Bengîn ji mirina bavê wî tune bû. Evdal û Gulê û Meyro jê re her digotin ku bavê wî sax bû û silav lê dikir. Gava ew rabû ser piyan û li bavê xwe pirsî, hingê Evdal jê re got ku bavê wî Biroyê reben çûye rehmetê. Dermanê mirinê tune bû. Kesî nikaribû rê li Ruhistîn bigirta. Dinya, dinyayeke derewîn bû...

Çaxa Evdal ji Bengîn re behsa mirina bavê wî kir, dinya derewîn li ser serê wî hilweşiya. Stûna

hebûna wî, hîmê jiyana wî winda bûbû. Ew sêwî û bêkes mabû. Piştî diya wî, niha jî, bavê wî çûbû... Çend roj li ser hev, ew çû ser gora bavê xwe û ji sibê heta êvarê li wir ma, axa gorê rast kir, kulîlk û gul li dorê çandin. Meyro jî alîkarî lê kir.

Di wan rojan de, Evdal û Gulê jî serî dan ber hev û bi hev şêwirîn.

- Gulê mehrûmê, te dît ka çi bi serê vî lawikê pepûk de hat?.. Heval û dostên me, yek bi yek, ji me xatir dixwazin û derin diyarê rehmetê. Em li vir dimînin bê heval û civat.

- Evdalo mehrûmo, nexweşiya Biro xedar bû û jê re çare nîn bû. Ew mir û xelas bû, lê gunê min bi Bengîn tê ku weha li meydanê bi tenê ma.

- Mehrûma minê, dilê min dibê ku em vî lawikê bêkes bi tenê nehêlin û wî bernedin meydana kambax a dinya bi çerx û felek.

- Evdalo, dilpako, dilê min jî welê dibê. Bila ew li cem me bimîne, em wî bihewînin, em lê binihêrin.

- Zarşêrînê, xweşbêjê, tu xweş dibêjî. Dilê me pak, sifra me comerd, risqê me fireh, nefsa me biçûk, mala me mezin e. Jixwe Bengîn jî elimiye me û mala me. Em, Meyro û Temo jî elimîne wî. Bila yek li me zêde be, em bibine pênc kes.

Li ser vê yekê, Evdal bi Bengîn re peyivî. Bengîn ji wan pir hez dikir, lê nedixwest li ba wan bima. Bi qasî demeke dirêj, Evdal, Gulê û Meyro pê re peyivîn heta ku ew razî kirin. Bi vî awayî, Bengîn jî bû yekî ji malê û pardarê siûda Temo, Evdal û Gulê û evîndarê Meyroyê kezîzerê.

Bengîn jîr û serwext bû, di rabûn û rûniştina xwe de giran û efendî, di fahmkirin û bîrbirinê de lezgîn û sivik, di kar û xebatê de bi înad û sebat bû. Ew hemû tiştên ku Evdal ji Temo hêvî dikirin, li nik

Bengîn hebûn. Loma, Bengîn ji Evdal re bû lawê dudiyan. U di warê edeb, terbiye û perweriya Bengîn de, ji cîhê ku Biro berdabû, Evdal rahişt ders û şîretan. Evdal jê re libas, şal û kirasên nû dan dirûtin, hacetên xwendin û nivisînê kirîn, bilûr û tembûreke xweş dan çêkirin û bi destê wî girt, ew bir qonaxê Tahar Xanê, cem mele û mamosteyên zarok û merivanên Tahar Xanê da ku Bengîn li ber destê wan seyda û mamostan bixwîne û perwerde be.

Bask û perwaz tune bûn ku Bengîn pê bifiriya. Bengîn li qonaxê, li nik seyda û alîman dest bi xwendinê kir. Bi şadî û kêfxweşî. Wî serê xwe ji xwendin û kitêban ranekir û ji pêgirtina qelem û pênûsan nava pêçiyên wî êşiyan. Wî ji sibê heta êvarê dixwend, dinivîsî, digot û guhdarî dikir. Ber bi êvarê, gava ew dihate malê, ji rûniştin û xwendinê navkêlên wî dêşiyan û ji bîrkirina xwarinê zikê wî dikire xurexur.

Gava umrê Bengîn gihîşt çardehan, wekî tava ku nû hildihat, ew mezin, xweş û çeleng bû. Bejna wî dirêj, çavên wî reş, rûyê wî geş, eniya wî fireh û vekirî bû. Nêrîna wî nerm û melûl bû. Mîna bejna wî, rûyê wî jî, hinekî, dirêj bû. Mijangên wî, poz û devê wî zirav û dirêj bûn. Simbêl û rîh hê nû, li ser rûyê wî, reş dikirin. Porê wî yê reş mîna qetranê dibiriqî. Gava ew dimeşiya, bejna wî mîna rihana li ber golê, bal dida.

Ji ken, xeberdan, rabûn û rûniştina wî dixuya ku xem û keser li ser serê wî çerx dibûn. Ew bi edeb û terbiye bû û ji biçûkan hez dikir û rêz û rêzdarî ji mezinan kêm nedikir. Herçend xem, derd û keseran dilê wî êşandibû û mîna barana biharê ji çavên wî hêstir barandibûn, ewçend wan lê alîkarî kiribû ku ew ji xweşiyên dinê hez bike û qedr û qîmet bide

wan. Ji lewre, hîs û pejnên ku li ber dilê wî herî bi qîmet bûn, pêlên hezkirin, xweşî û zanînê bûn. Ew şagirtê zanînê, lawê hînbûnê bû. Bêwest û bêrawest, ew li ser wê riyê bû. Wî dizanîbû; aqilê sivik barê giran bû. Û mamosteyên wî jê re gotibûn; gava tu zana û têgihîştiyekî dibînî, jê re xizmetkar be.

Belê, gava Bengîn kete çardehan, Evdal hespekî kihêlê bezayî dayê. Tevî taximekî bijarte yê hespan. Evdal ji seracanên Qonaxê rica kir ku jê re taximekî xemilandî çêkin. Wan di demeke kurt de taxim çêkirin û ew dan Evdal. Taxim bêkusûr bû; bi rengên kesk, sor û zer hatibû şixulandin û xemilandin. Zengû, zexme, rikêb û hesinê lîwanê hespê mîna tîrêjên tavê diçirûsîn.

Wekî ku Evdal bîr bi bûyerên bêdibir, gava wî taxim da Bengîn, jê re got,

- Bengîno, aqilfahmê mino... Tu niha li zaroktî û xortiyê diqulipî û dibî peya. Ez ji Yezdanê pak û dilovan dixwazim ku serê te bêderd û bêbela be. Lê tecrube dibêjin, çiyayên bilind bê mij nabin, newalên kûr bê av nabin û mêrên jîr û çeleng bê derd û kul nabin... Xwe li hember xirabî, nerindî û kirêtiyê hazir bike û ji xweşî û zanînê rû bamede, ji hînbûnê meweste. Bila xweşiyên vê dinê, pakiya dilê te û îlim û zanîn bibin tîr û mirtalên te, çek û pûsatên te...

Bi dû wê xeberdanê re pir wext nebihurî ku derd û bela li pey hev hatin. Herwekî hûn pê dizanin, ava reş bi çavên Evdal de hat û wan, Evdal, Gulê, Temo, Bengîn û Meyro bajarê rehmetiyê Tahar Xanê terk kirin û xwe li gundan girtin.

Paşê çi bû?

Em ê niha werin ser wê dem, wext û dewrê.

# 4
# Evîna Meyro û Bengîn

Bengîn û Meyro, her du xweşik, nazik û tenik bûn, mîna du parî şekir bûn. Mîna pelên kulîlka rengîn a henarê, ew li hev hatibûn. Gava wan, cara yekemîn hevûdu dîtin, dilê wan li hev keliya û mîna ku ew her tim bi hev re bûne, wan dest bi axaftin, lîstik û henekan kirin. Û wan dest pê kir, bi şev û roj, bi hev re bin. Li malê, li çolê, li deşt û zozanê, li ber av û golê, li dawet û dîlanê, li xwendegeh û meclîsê. Pir caran Temo jî bi wan re bû û wan her siyan, bi ken, lotik didan xwe û bi derine diçûn û dihatin.

Rojekê, gava Tahar Xan ew her du, bi hev re, dîtin, li ber xweşiya wan, ew sekinî û got,

- Xwedayo... ev çi nûra xweşî, masûmî û pakiyê ye ku li ser rû, cemal û bejna van xort û ciwanan dibiriqe! Nûreke saf... Xwedayo, vê nûra pak ku li ser rûyê keç û xortên me ye, ji ser me û welatê me kêm meke.

Kinc û cilên Meyro û Bengîn her gav nû û paqij bûn. Bengîn her gav kincên spî, Meyro jî fîstanên rengîn li xwe dikirin. Ew welê delal bûn ku her

daîm li ber çavên merivan bûna, meriv ji dîtina wan têr nedibû.

Şewqa evîn û hezkirinê zû kete nav dilê wan. Gava bavê Bengîn Biroyê Dengbêj mir û Evdal û Gulê xwestin ku Bengîn li cem wan bima, hingê Bengîn, bêtir, ji bo Meyro mayin qebûl kir. Hingê dilê wî dest pê kiribû û bi germahiyeke xweş hildavêt.

Lê belê, agirê evînê li gund kete dilê wan. Wan terkî bajêr, zengînî û dewlemendiyên Tahar Xanê kirin û hatin gundekî biçûk. Evdal û Gulê bi halê xwe ketibûn. Haya Temo jî ji bayê felekê û dewr û dewranê tune bû. Bengîn û Meyro hîn bêtir nêzîkî hev bûn û evîna wan, hingê, pêl da.

Belê, hingê, gava umrê Bengîn û Meyro gihîşt şanzdeh-hufdan, aqil terka serî da, hiş ji dilê wan rabû, can ji ten bû û taya evînê ew girtin. Lê ew hewqas masûm bûn ku hê mêşên mê û nêr li ser wan veneniştibûn û ew li ber hev rûdiniştin û bêdeng, bi danê rojan, li hev dinihêrîn. Yan jî Bengîn destê xwe davêt ber guhê xwe û ji hilatina rojê heta avaçûna rojê stran digotin û stran û kilam davêtine ser Meyro. Pir caran jî, Bengîn, Meyro, Temo, bi hev re, derdiketin deşt û zozanan, serê çiyan. Carina jî, ew diçûn û li gundên doralî digeriyan. Xelkê xweziya xwe bi wan dianî, didan qise û stran û gotinan.

- Xwedê bi van re be û mirazê wan bi cîh be. Wan spehîtî û xweşî ji kesî re nehiştine. Awir, rewş û tevgera wan ne mîna kesên din e. Halê lêwik halê zana û alîman e. Aqil taca zêrîn e, li serê hemû kesî nîn e, lê li serê vî xortî xwe dibiriqîne. Bîvil, enî, rû, bejn û xeberdana wî, yên leheng û çelengan e. Herçî keçik e, ew narîn û nazdara vê dinyayê ye. Gava ew radibe, dipeyive, xwe dilivîne, dikene, pê re dilê

xortan bi agir dişewite.

Pêde, pêde evîna wan kete devê her kesî û herkes pê hesiya. Agir bi dilê wan ketibû û dû jê hildikişiya. Rojekê, dostekî Evdal hat û bû mêvanê wan û ji Evdal re got,

- Cîhê ku agir lê nayê dadan, dû ji wir hilnakişe. Xelk behsa Bengîn û Meyro dike. Ne bi xirabî ye. Lê xelk dikare loma bike ku çima ew bi dîlan, nîşan, şêrînahî û dawetê aşkere nakine? Tu dizanî, li welatê me, xelk dibêje; her kezîzerekê, simbêlsorekî li berê.

Evdal heq da dostê xwe û bi Gulê şêwirî. Jixwe Gulê li hêviya roja dawet û şênahiyê bû. Hingê Gulê, bi kêfxweşî, got,

- Evdalo, mehrûmo... xwezî te niha bidîta ka çi peyakî çeleng û keçeke spehî ji Bengîn û Meyro derketiye. Bejna Bengîn zirav e, mîna şitil û tek rihana gol û avê. Awirê wî xweş û delal e, mîna nêrîna teyrê sîmir û şêrê çiyayê Sîpanê Xelatê. Meyro ye, nazik û nazenîn e, kevoka birc û zozanan e, xwediya çavên belek, guliyên dirêj e. Tu bibînî, ev çi aşq û mihebet e. Ji derdê tîra aşq û mihebetê aqil ji serê wan çûye, agir bi dilê wan ketiye. De xwe bilivîne, zû ke, evîndaran bi hev bigihîne.

Wê gavê Evdal hêdî hêdî bi simbêlê xwe lîst û bi Gulê keniya. Gotina heval, dost û Gulê û xeberên rind û pîroz dilê wî xweş kiribû. Ew jî li benda wê rojê bû û ji mêj ve, wî di serê xwe de, ji bo roja pîroz stranek çêkiribû. Wî bi kêfxweşî dest bi strana xwe kir,

*Ez im, Evdal im,*
*Wextekê Evdalê Zeynikê bûm, xortekî çarde salî bûm,*
*Siwarê caniyeke sê salî bûm,*
*Li dîwanên hakîm û mîran, beg û begleran bûm,*

*Dengbêjekî serekê dengbêjan bûm,*
*Berdilkê qîzan û bûkan bûm,*
*Iro kor bûme, ji dinyayê bi dûr ketime,*
*Lê, bi siûda rindî Bengîn û Meyro dikenime,*
*Ew ê mala me şa bikine, birînên me*
*bikewînine...*

Bi vî awayî, Evdal û Gulê Bengîn û Meyro kirin destgirtî û kincên nû li wan kirin û ji çavên wan maç kirin. Şeveke xweş a havînê, ew li meydana gund civiyan û şêrînahiya Bengîn û Meyro xwarin. Gelek heval û dostên Evdal jî hatibûn. Wan û şagirtên Evdal heta sibê stran gotin, govend girtin û qesta felekê kirin. Temo jî, li kêleka bavê xwe rûnişt û heta sibê li çepikan xist.

Ji kêfa wan re payan tune bû.

Lê belê, xwendevanên ezîz, hûn ji serpêhatiyên qehremanê çîroka me Evdal dizanin; dinya gewrik e, pûç û betal e, kewna namerd û xiraban e, ew li pey kesî nayê. Di wan wextên şên û şênahiyê de, dinya misûbet û feleka kambax, dîsan, kumê xwe xwar kirin û çerxa xwe zivirandin. Niha jî feleka kambax Egîd Begê û lawê wî Çeto derxistibûn ser riya Bengîn û Meyro û herweha ser riya Evdal û Gulê...

Hûn ê, niha, bipirsin ka Egîd Begê û lawê wî Çeto kî bûn... Wey lê felekê, zalimê... Belê, bi dû sirgûnî û malwêraniya Tahar Xanê re, Egîd Begê hebû, pismamê Tahar Xanê, dostê paşayê dewleta Osmanî Alî Kör Reşîd Paşa, xwediyê bi dehan jin û cariyên kef li devê, dijminê bextê çê û neyarê welatevîniyê...

Çîroka Egîd Begê dirêj e. Lê me dil tune ku em çîrokê dirêj bikin û serê we pê bêşînin. Loma em ê, bi kurtî, behsa Egîd Begê malmîrat bikin da ku em dîsan vegerin û bên cem Bengîn û Meyro.

## 5
## Egîd Begê malmîrat

Berî niha bi bîskekê, me qala Tahar Xanê qedirbilind, nefîbûna wî û wefata wî kir. Niha jî em ê qise û gotinê bînin ser erd, avahî û welatê wî û binihêrin ka piştî Tahar Xanê, çi pê qewimî.

Hezar mixabin, lê Tahar Xan çavvekirî çû gorê. Li welatê xerîbiyê û bê şîn û taziye. Avahiyên ku wî dest pê kiribûn, nîvçe man û daxwaz û armancên wî qurmiçîn. Ew bê şîn çû rehmetê, lê belê, welêt şîna xwe girêda. Osmaniyan nedixwestin welat di nav rehetî, sulh û aşitiyê de be. Pala Osman û Kör Reşîd Paşayên bêbext welat şewitandin. U Kör Reşîd Paşa, qisas û dijminê Tahar Xanê, war û welatê Tahar Xanê kir wêran. Wî kitabxana Tahar Xanê vala kir, hemû kitêb, ewraq û kaxizên tê de, şandin Stembolê, medresa qonaxê da girtin û alîm û seyda û zana belav kirin û çend hebên wan xistin bin qeyd û zînciran û avêtin zîndanan. Wî zana, aqilmend û kumandarên Tahar Xanê belav kirin, hin bi Tahar Xanê re şandin welatê xerîbiyê, hin kuştin û hin jî avêtin zîndanan û şandin deverine dûr.

U Kör Reşîd Paşayê xwînrêj Egîd Beg jî xiste

dewsa Tahar Xanê û ew mîr îlan kir. Herçî Egîd Begê bû, meriveki zikreş, çavbirçî, jixwerazî, xayin, sextekar, zalim û hîlebaz bû. Wî, ji mêj ve, dijminatî li Tahar Xanê dikir û digel ku ew meriv û pismamê Tahar Xanê bû, dek û dolab li dora Tahar Xanê digerand û alîkarî li fêlbazî û sextekariyên Osmaniyan dikir. Navê wî bi sixurî deng dabû û xelkê digot,

- Egîd Begê ye, karê wî navkokî û fetbazî ye. Agir bi mala wî keve. Ew kewê li ber destê nêçîrvan e. Nêçîrvan pê dere nêçîrê û qewmê wî dikuje. Kew e, neyarê qewmê xwe ye. Dinya hemû neyarê kew e, kew jî neyarê qewmê xwe ye. Siya wî her daîm ber bi aliyê Osmaniyan e û darê di ser xwe re dibire... Ew mel'ûn e, gorê lê teng be.

Meriveki weha xirab û nezan li qesr û qonaxa Tahar Xanê rûnişt û dest bi hukim kir. Bi rêdan û şîretên Osmaniyan, wî siyaseta Tahar Xanê ku li ser hukmeki adîlane, şuxil û gerandina aşîtî û dostane ava bûbû, hilweşand û eşîr bera hev dan, eskerên Osmanî xistin her derî, ceza û bac zêde kirin û bira bi bira kire dijmin... û ew li dijî kes û xelkên nemuslîm jî bi kîn, rik û nefreteke bêpayan rabû.

Wî hebûn û dewlemendiya xwe ya şexsî bêhed û bêsînor, zêde kir. Zikbirçî têr dibin, lê belê çavbirçî têr nabin. Egîd Begê jî meriveki çavbirçî bû. Kê çi bidayê, wî werdigirt û çi bi dest ketayê, wî nedigot na. Ew meriveki hesûd, pexîl û zikreş bû. Wî dikir, nedikir, kesî bi rindî behsa wî nedikir û qedr û qîmet nedidayê. Vê yekê ew hîn bêtir har dikir. Wî gisnê ku di çavê wî de bû nedidît, lê belê, derziya hûr di çavê der û dora xwe, şênî û xelkê de didît. Loma, wî dijminatiyeke bêhudûd li dost, heval, nas û hezkerên Tahar Xanê dikir. Ew û Osmanî, bi hev re, bûbûn yek û dixwestin navê merivên çê û qenc û

tiştên ku navê wan bi bîr dianî, ji meydana dinê rakin. Ji bo vê yekê, wî her dek û dolab digerand û daf dadanî.

Berî bûyeran bi çend salan, Evdal ji warê şer û bûyeran bi dûr ketibû û xwe spartibû gundan. Eger welê nebûya, Egîd Beg ê dek û dolab li serê Evdal jî bigeranda. Wî Evdal ji bîr nekiribû û li benda fersendê bû... Kirin û kirêtiyên Egîd Begê dihatin guhê Evdal. Ew li ber bûyeran, serpêhatiya Tahar Xanê û qedera xirab diket û stran davêtine ser wan. Wî Egîd Begê baş dinasî û digot,

- Gava rûn li cem şîrheraman pir be, ez nizanim, ew li çiyê xwe didin...

Ew fersenda ku Egîd Beg li pey bû, lawê wî Çeto, bi nezanî, da Egîd Begê. Ew çawan bû?.. Ev bûyera nexweş ku kete nav çîrok û destanan û dilê her kesî pê êşiya, ne ya gotinê ye. Lê, em ê çavê xwe mij kin û bi gotinên xwe yên nebiha, ji we re, bi kurtî bibêjin.

Çeto lawekî nerm û qenc bû. Ew di umrê Bengîn û Meyro de bû û gava Bengîn û Meyro li bajêr bûn, Çeto hevalê wan bû û wan bi hev re dixwendin. Çeto li bavê xwe neçûbû. Tahar Xanê jî jê hez dikir û ew di medresa Qonaxê de dida xwendin. Lîstik, xwendin û hevaltiya Çeto bi Bengîn û Meyro re xweş bû. Ew hê zarok bûn, lê di wê demê de, bala Çeto li ser Meyro bû û qedr û qîmet didayê, xwe dida ber bayê wê.

Peyva kalemêr û pîrejinan tev cewher in, meriv divê wan navêje bin lingan. Wan gotiye; giya di bin keviran de namîne, hêşîn dibe.

Ew bal û nêrîn û mihebeta Çeto, rojekê, bû belayê serê Çeto, Bengîn û Meyro. Haya Çetoyê reben ji tiştekî nîn bû. Çend sal bi dû barkirina Evdal wan, rojekê Çeto, tevî çend hevalên xwe, hate gundê ku Evdal wan tê de dijiyan. Hingê bavê Çeto bûbû hukimdar û ji pozê xwe mû nedibirî. Lê, awir û

tevgera Egîd Begê qet ne bi dilê Çeto bû û ew jê ne razî bû. Çeto û hevalên wî diçûn seyda xezalan û li ser riya xwe, Çeto xwestibû serî bide Evdal û Gulê û hevalên xwe yên zarotiyê. Ji navberê gelek sal derbas bûbûn. Ew guherîbûn û mezin bûbûn. Ew bûbûn xort û dilê wan bi xurtî hildavêt. Meyro bûbû xezaleke zozanan û çavên wê yên belek meriv sersem dikir, bedena wê heş ji serê meriv dibir, gotinên wê yên xweş meriv mat dikir. Hingê, li wir, ew hîsên Çeto yên zarotiya wî, ji nû ve, vejîn. Niha hîn xurttir, kûrtir û bedewtir. Lê, ew ne kesê xeberdana hîs û daxwazan bû. Wî şerm dikir. Loma, hingê wî tiştekî negot û hîsên xwe bi dernedan.

Çeto û hevalên wî, bi tenê, du roj li nik Evdal, Gulê, Temo, Bengîn û Meyro man. Bi dû du rojan re, wan ji haziriyan xatir xwestin û li ser riya xwe berdewam bûn. Her çiqas Bengîn û Meyro xwestin ku ew çend rojên din jî bimana, lê ew neman û çûn. Digel vê, Çeto soz da ku ew dîsan vegere û li cem wan demeke dirêj bimîne.

Mixabin, Çeto hew vegeriya gund. Em dibêjin mixabin, ji ber ku eger ew bi xwe vegeriya gund, heye ku ew bûyerên kambax neqewimiyana. Belê, ew bi xwe venegeriya gund, lê wî mamostê xwe, du beg û du rîhspî şandin gund. Tîra evînê di dilê wî de çikiyabû. Ew birîndar bû. Bi qasî du mehan, ew li seydê ma û bi dû re vegeriya bajêr. Ew bi careke guherîbû, heşê wî ne li ser hazir û civatê, bala wî ne li ser qise û gotinan bû. Mîna ku ew çûbû dinyayeke din. Ew di nav xem û xeyalan de dijiya û ji xwarin û vexwarinê hatibû birîn. Tevgera wî sist bûbû û rengê rûyê wî qulipîbû rengê xweliyê û çavên wî ketibûn kortê.

Heşê wî li cem Meyro bû. Meyro bûbû nan û ava wî, roj û şeva wî. Dinê hemû li ber çavên wî winda

bûbû, bi tenê, Meyro mabû. Xewa şevan jê re heram bûbû. Lê wî nikarîbû deriyê dilê xwe vekira û derdê xwe ji kesekî re bigota. Carekê, du caran wî xwest qutiya dilê xwe veke, lê zimanê wî negeriya, ji şerm û fediyan xwîdan bi canê wî ket û deng jê nehat. Lê mamostê wî yê îlim û felsefê bi derdê wî hesiya û ji rabûn û rûniştina wî derxist ku birîna Çeto birîna dilan bû. Rojekê, mamoste Çeto xewle kir, qise anî ser qisê û jê re got,

- Çetoyê b'aqil, kesê ku derdê xwe nebêje, nikare derman jî bibîne. Halê te ne tu hal e. Tu ji ber birîna evîneke yeman dinalî. Eziyetê li xwe meke. U tu dizanî, dermanê bixwekiriyan tune. De were, tu derdê xwe ji mamostê xwe re bibêje. Derdê te, derdê min e.

Mamoste, bi vî awayî, xeberdan dirêj kir heta ku Çeto jê re vebû û xwe avête bextê wî û derdê xwe, digel her kit-kitê, jê re got. Çeto nedixwest ku kes pê bizanibe. U haya bavê wî qet jê nebe. Mamoste soz dayê û jê re bi telaqê jina xwe sond xwar ku ji kesî re nebêje. Di dawiya gotinên xwe de, wî hin tişt li ber guhê Çeto xistin û jê re gote,

- Çetoyê efendî û hurmetkar, derdê te ne derdekî bêçare ye. Ez ji derdekî hîn xirabtir ditirsîm. Keçik ciwan e û li ber zewacê ye. Eger tu bi ya min bikî, em ê herin û keçikê ji te re bixwazin. Ma ew ê ji te çêtir bibînin? Xelkê gotiye, dilê tirsoke sînga gewr nabîne. Ji xwestinê xweştir û maqûltir tu tişt nîn e... li serê bifikire.

Çeto nedixwest gaveke şaş bavêje û hinan pê bieşîne û eciz bike. Lê li milê din jî, dil û canê wî bi pêlên evînê radibû û heş ji serî diçû. Wî gotinên mamostê xwe, bi caran û bi mehan, rakir û danî û paşê biryara xwe da û îcar, bi xwe, xwe li mamostê xwe girt û jê re got,

- Mamostê min ê ezîz, min dilê xwe ji te re vekir û derdê xwe got. Agirê evînê zor li min bir. Gotina te rast e, rêbirîn bi gavavêtinê dibe. Eger bi dilê te be, ez dixwazim ku tu çêyiyekê bi min bikî.

Herweha mamoste, du beg û du kalemêrên kurd, bi hev re, çûn gund û bûn mêvanê Evdal. Evdal li şagirt, ders û stranên xwe hûr dibû û Bengîn jî alîkarî lê dikir. Karê Evdal pir bû, ji ber ku şagirt ji her alî dihatin. Aşkere bû ku hatina koma mezinan ne bêsebeb bû. Evdal û Gulê mêvanên xwe ezimandin û di qedr û qîmetê de kêmanî û qusûr nekirin. Sê roj, ji hal û hewalên wan, rewş û tevgera dinê pê ve, Evdal tu tişt ji wan nepirsî. Bi dû sê rojan re, piştî şîva êvarê, vexwarina qahwê, Evdal balgîha pişta xwe rast kir, çoga xwe danî ber çog, dest bi qisan kir û riya qotin û daxwazan vekir.

- Mêvanên min ên ezîz û qedirgiran, hûn dizanin, li ba me kurdan, heqê mêvaniyê sê roj e. Ji sê rojan bi şûn de, mêvan jî dibe xwediyê malê û daxwaz û gotina xwe dibêje.

Lê belê, daxwaz û gotina mêvanan Evdal pir û pir êşand. Ew û Gulê bi Bengîn û Gulê re peyivîbûn ku gava ew dawet û dîlanê li dar xînin, ew divê Çeto jî vexwînin. Lê niha Çeto bi daxwazeke din hatibû meydanê. Dilê Evdal hem bi Çeto, hem bi Bengîn û Meyro êşiya. Evdal bang li Gulê kir û ew ji aliyê din ê malê da anîn û mesele jê re jî got. Lê çare nîn bû, daxwaz xweş bû, lê bicîhanîn bêîmkan bû. Evdal û Gulê bi mêvanên xwe dan zanîn ku Meyro bi Bengîn re destgirtî bû, qewl û qelînê wan hatibû birîn û ew li ber deriyê zewacê bûn. U evîna wan, evîneke yekane bû. Wan hêvî kirin ku Çeto zêde li ber vê yekê nekeve, ji ber ku ew jî, ji bo wan, mîna Temo û Bengîn bû.

Lê, em divê li vê derê bibêjin ku gotinên Evdal û

Gulê ji bo dilgirtinê bû û gotinên xav bûn. Gotinên xav jî nedipijîn li ber tav... Çeto pir li ber wê xebera ku mamoste jê re anîbû û li ber kirina xwe ket. Gava wî xeber bihîst, ew ji xwîn miçiqî û bû wekî meyitan. Eger yekî, hingê, xençerek li ser dilê wî xista, xwîn ê jê neçûya. Wî, bi hêdîka, serê xwe xiste nav destên xwe û bi tenê got,

- Heywax... te dît, min çi kir.

Mamostê wî li ber wî geriya, bi dirêjahiya danên rojê, got û peyivî, lê Çeto tiştekî nebihîst. Wî deriyê dilê xwe, bi carekê, girt û hew vekir û destara dilê xwe hew gerand.

Çeto, bi tenê, daxwazek ji mamostê xwe hebû; tu kes diviya bi hedîsê nizanîbûya û eman, eman, bavê wî, Egîd Begê bi tiştekî nehesiya. [Ji ber ku wî dizanîbû ka bavê wî çi kelp bû]... Dinya li ber çavê Çeto reş bû û li ser serê wî hilweşiya. Wî hêstirên bêdeng li ser çavan barandin, axîn û nalîn ji dil û kezeb kişandin. Birîna Çeto niha kûrtir bû. Li milekî, agirê aşqê bû ku jê bi dûr nediket û wî nikarîbû rê lê bigirta û li milekî jî fedî û şerma wî bû. Wî îş xirab kiribû û hîmê hevaltî û dostiya xwe û Bengîn û Meyro ji dewsê leqandibû. Wan û Evdal û Gulê dê, niha, bi çi çavî lê binihêriya?.. Wî hêdî hêdî xwe ji allem û dinê da alî û kete nav xem, êş, derd û keseran heta ku rojekê, bi dû bûyerê re bi qasî salekê, di seyd û nêçîra xezalan de, li ser hespê xwe, ew ji kaşekî ket bin bihurekê û can da, çû rehmetê.

Kesî fahm nekir ka ew tişt çawan qewimî. Hinan gotin, "qeza ye." Hinan jî gotin, "na, ne qeza ye, wî bi xwe kir û xwe avêt." Herkesî fahm kiribû ku Çeto bi tiştine pir dêşiya, lê nizanîbûn, bi çi. Dê, bira, heval û hogirên wî kirin, nekirin, nikarîbûn jê fahm bikirina. Niha jî, ew bi sirê xwe çûbû diyarê

rehmetê.

Xebera mirina Çeto, Evdal, Gulê, Bengîn û Meyro gêj û sersem kir. Wan tiştekî weha kambax nedipan. Wan meraq li Çeto dikir û ji nas û hevalan halê wî dipirsîn. Heta Bengîn carekê, du caran xeber jî şandê ku ew were cem wan û çendekê bimîne. Bi vî awayî, wan dixwest dilê Çeto bigirin. Lê xeber ji Çeto derneket, dewsa xebera wî, xebera mirina wî hat. Bi dû mirina Çeto re mehekê, xeber bi wan gihîşt. Digel ku êdî dereng bû, Bengîn xwest, ji bo sersaxî û taziyê, here cem dê û birayên Çeto. Wî hespê xwe hazir kir, taxim avête serê, lê siwar bû û berê xwe da bajêr.

Xwezî wî weha nekira û berê xwe neda bajêr. Xwezî qînorên xedar li çîpên hespê derbûna û hespê xwe negîhanda bajêr. Lê xwezî di gewriyê de dibe xezî. Bengîn xwe bi bajêr gîhand, çû cem dê û birayên Çeto, sersaxî li wan kir. Ew li bajêr, li xanekê, çend rojan ma, tiştine ji bo Evdal, Gulê, Meyro û Temo kirîn û paşê, dîsan, li hespê xwe siwar bû û bê hay û tam, vegeriya malê. Lê belê, qiyamet hingê rabû, topa qise, gotin û laqirdiyan teqiya û deng da. Mesela Çeto, Bengîn û Meyro hingê kete devê xelkê û li bajêr geriya. Ev xeber ji devê kê derketin, kê ew belav kirin? Kesî bi vê yekî nizanîbû, lê çav mij bûn, guh vebûn û dev liviyan û gotin,

- Heyra, sebebê mirina Çeto Meyro ye. Çeto alîm û zana û giregir şandine cem Evdalê Zeynikê da ku keça wî Meyro jê re bixwazine. Wan keç nedaye Çeto û keçikê Çeto nexwestiye û elçî bi şûn de vegerîne. Ma derd û kulên Çeto eger ne ev bûne, hingê çi bûne?

Hûn dizanin, gava xebereke xirab derdikeve, feleka bêbavê kêfa xwe pê tîne, govendê girêdide û li xeberê zêde dike û xeberê bi her derî digihîne. Hingê

jî welê bû; xeber bi Egîd Begê malmîrat jî gihîşte... Ma kesî dîtiye ku bar çûye ber kerê? Naxwe ker nare ber barê? Lê îcar bar çû ber kerê. Egîd Begê dixwest çavek, Xwedê danê du çav. Borîn pê ket, dû û dûmana hiddetê jê rabû, taya kîn û nefretê ew girt û kire qîreqîr û guregur. Fersenda ku ew li peyê bû, niha ketibû destê wî. Wî çavên xwe girtin û devê xwe vekir û da qise û gotin, çêr û xeberan.

- Naxwe, qesasê lawê min ew Evdalê kor e? Ew korê pîsê heram çawan dikare lawê min bişkîne û gotina wî bide bin lingan? Çawan ew dêlika kafîr diwêre bibêje na û bide bersîvan? Ma ew nizanin ku ez Egîd Beg im, hakîmê dewr û dewran, dostê Osmaniyan, xwediyê şêr û pilingan? Ma ew nizanin, ez ê wê dêlikê û mêrê wê yê kundê ser kavilan û ew kesên ku alîkarî li wan bikine, têxim heft qat binê erdê û dinyayê li wan bikime heram?.. Lawo, kumandar û siwarino!.. roj ne roja qise û gotinan e. Hemam bi tir û fisan germ nabe. Xwe bilivînine, bilezînine, xwe bi gundê Evdalê kor bigirine û wê dêlika filebavê û segê mêrê wê bi min bigihînine...

Gava siwarên Egîd Begê hatin gund, haya kesî ji tiştekî nîn bû. Wan rojên xwe yên wekane, bi xirecira rojane, derbas dikirin. Bengîn û Meyro zewicîbûn. Evdal gotibû, "êdî roj hate, ez ê Tavbanûyê bikime bûk û Bengîn bikime zava" û wan ew zewicandibûn. Wan daweteke biçûk li dar xistibûn, Evdal stran gotibûn, Gulê serkêşiya govendê kiribû û rojên xwe yên bihurî bi şûn de anîbû, Bengîn û Meyro, mil bi mil, govend girtibûn, dengbêj û stranvanên din bi lec û şerê kilam û stranan rabûbûn û Temo jî, digel ku kesî jê tiştekî fahm nekiribû, destê xwe avêtibû ber guhê xwe û di jiyana xwe de cara yekemîn, stranek gotibû. U heta ku siwar hatin, roj, wext û dewr, bi awayekî aram û

sakîn, derbas bûbû û çûbû.

Siwar hatibûn ku Bengîn û Meyro bi xwe re bibin cem Egîd Begê. Ev xeber hema li doralî û welêt belav bû û beg û giregirên doralî xwe bi gund gîhandin. Herkesî dizanîbû ku eger Bengîn û Meyro bi siwaran re herin, êdî ew hew vedigerin. Ev çi tişt bû bi serê wan de hatibû?.. Beg û giregir ketin navberê û bernedan ku siwar Bengîn û Meyro bidin ber xwe û bi xwe re bibin. Bi tika û mînet û libergerîn û lave, siwar bi vê yekê qayil bûn. Lê, bi şertekî ku heyetekê ji beg û giregiran jî, bi wan re, bihata û hal û hewalê bi Egîd Begê bida zanîn. Jixwe daxwaza dilê Evdal jî ev bû ku çend xwedîqedir û xwedîsoz biçûna û bi Egîd Begê mel'un re bipeyiviyana. Hebû ku dilê Egîd Begê hinekî nerm bûya. Bi vî awayî, heyeta beg û giregiran jî, tevî siwarên Egîd Begê, bi rê ketin û çûn. Gava Evdal ew bi rê kirin, wî spasî li wan kir û got,

- Ji Xwedê hêvî nayê birîn. Bi merivên serwext û xeberdana nerm mar ji qulê tê der.

Lê mar ne mar bi xwe bû, merivekî mîna Egîd Begê ketibû dewsa mar. Beg û giregir çûn û derketin meclîsa Egîd Begê û pê re peyivîn û gotin,

- Egîd Beg, tu merivekî mezin û giran î. Em elçî ne û elçî bêzewal e. Em hatine û xwe davêjine bextê te. Kirin û tevgera Bengîn û Meyro bêsûc û bêgune ye. Hê di zarotiyê de, ew evîndar û dildarên hev bûne. Haya Çeto ji şêrînahiya wan, haya wan ji taya evîna Çeto nîn bûye. Ew jî, bi qasî me û te, li ber Çeto û mirina wî dikevine û xwîn digirîne... Egîd Beg ew sêwî, bêkes û bêçare ne. Ew xwe davêjine ber bextê te... Her welatekî xwediyê adet û ûsilan e. Kes divê van adet û ûsilan nelivîne û neleqîne. Li welatê me kurdan adet û ûsil e, kes dest li kalemêr, pîrejin, birîndar, zarok, jinebî, ketî û sêwiyan ranake. Hele

li evîndar û dilketiyan qet ranake. Li welatê me adet e, gava meriv du maran bibîne ku li hev piçikiyane û bi qesta kêf û henekan rabûne, meriv wan dihewîne, rûyê xwe ba dide û dere. Egîd Begê, tu mezin û xwedî desthilat î. Efû û lêbihurîn karê mêran û mezinan e. Bengîn û Meyro bêsuc û bêgune ne. Eger kêmanî û qusûrekî wan jî hebe, çavê xwe lê bigire, bide bin lingan û ji wan bigere. Heçî Evdalê Zeynikê ye, ji çavan bûye, meriveki kokim e, xirabiya wî bi kesî negihîştiye û bi dengê xwe mala me, welatê me şên kiriye.

Lê belê, ew xeberdan bêfeyde bû. Beg û giregirên kurdan çi jî gotin, nikarîbûn Egîd Beg nerm bikirina. Dilê Egîd Begê ne dil, lê kevir bû. Ew ji kera xwe peya nedibû û qîreqîr dikir û digot,

- Na, nabe, lawê min ê mîna çiya ji bo dêlikekê bimire û ez xwe kerr bikime û çavên xwe bigirim û nekevim pey tol û heyfa lawê xwe! Na, nabe, weha nabe. Çawan devê we digere û hûn dibêjin ku ew masûm û bêgune ne? Çawan hûn bi jinan û qisên wan bawer dibine? Ew dêlik in û dêla wan ber bi jor e. Ma heta dêlik dêla xwe nelivîne û xwe bi bîhna segê no negire, kes dikare seg bi ser dêlikê berde? Jin jin e, parsûya kêm, rûreşiya mal û civatan e. Ew sebebê qise û serhevdan e, bi teşiya xwe, jin sebebê lec û peveçûnan e... Gotina we li ser seran û çavan e, lê ez tu carî ji gotina xwe danakevime û xwîna lawê xwe li erdê nahêlime. Hûn dizanin, herçî ew kesê ku negot û kir, şêr e; yê got û kir mêr e; yê got û nekir, keremêr e. Min carekê gotina xwe gotiye, ew dêlika filehan û mêrê wê yê kûçik ê werin û ceza xwe bibînine... Ma ez keremêr im ku tiştekî bibêm û nekime?..

Gotina dirêj bêkêr bû. Begekî ji heyetê hema siwarekî bi rê xist, xeber şande Evdal û Bengîn û got,

- Keremêrekî mîna vî Egîd Begê hê nehatiye rûyê dinê. Qise nakevine serî, ew bûye mîna kevirê goristanê. Bila Bengîn û Meyro xwe bidine alî, ji ber çavan winda bibin, hê ku Egîd Begê malmîrat gund nekiriye gola xwînê.

Bi gihîştina xeberê, li gund, lez û bezekê dest pê kir. Evdal, Gulê Bengîn, Meyro, gundî, şagirt, dost û heval li hev civiyan, dan muhawele, şîret, rê û çareyan. Çi hebûn li ber dest û îmkanan? Bengîn û Meyro dê biçûna ber bi kîjan cih û deveran? Lê tiştekî bi misogerî bûbû beyan; Bengîn û Meyro hew dikaribûn li gung û doralî bijiyan û diviya ew winda bibûna ji ber rû û çavan.

- Em çawan bikin? Qedera me jî weha ye, li me xirab hatiye, Evdal ji Bengîn û Meyro re got û domand, li van deran jiyan, xweşî û bextiyarî li we heram e. Ji destê me pir tişt nayine. Kurmê darê ji darê nebe, zewala darê nîn e. Lê, kumê felekê li ser me xwar e, Egîd Begê kurmê me ye... De bilezînine da ku hûn nebine kewên dafên malxirabê Egîd Begê û riyên dûr bidine ber xwe û ji vir herine.

Lê ber bi kû? Wê şevê, Evdal bersîva vê yekê jî peyda kir. Evdal bang li Bengîn û Meyro kir, ew li ber çoga xwe dan rûniştin, bi her destekî xwe, destê wan girt, bi qasî bîhnekê bêdeng ma û paşê hêdî hêdî got,

- Tavbanûyê, delalê... Bengîno, çelengo... keç û lawê min ên siûdreşino... Dilê min dibê, riya siûda we ber bi çiyayê Şengalê, cem dostên min ên êzidiyan e. Ew der asê ye, warê teyrên eylo û bazan, direndeyên şêr û pilingan e. Merivên wê derê mêvanperwer û merivên yekane ne. Ew ji dostên xwe re dost, ji dijminê xwe re dijmin, li dijminê dostê xwe dijminên yekta ne. Ew bi sifra xwe dewlemend, bi dilê xwe nerm, bi qewlê xwe zexm, bi

mêraniya xwe navdar, bi dînê xwe perwer, bi şerê xwe asê ne...Bêyî teyr û rawiran, kes nikare, zû bi zû, xwe bi wan deran bigihîne. Meger ku hinekan xwe bi wan deran gîhand, heta ew xwe li ber we nedine kuştin, ew we bi derekî de nahêline... Sibê zû, gava ro hê hilnehatiye, hûn divê bi rê kevine. Bila agir bi mala Egîd Begê keve... îşev, li vir, şeva we ya dawîn e.

Ma ji destê Bengîn û Meyro çi dihat? Wan ê, bi alîkariya Evdal, girêka xwe, bi destê xwe, vekirina. Gotinên Evdal kete heşê wan û Gulê. Wê şevê xew neket çavê kesî. Mala Evdal tijî meriv bû. Ew heta ber destê sibê rûniştin, li ser hal û hewalên welêt, kirinên Osmaniyan û Egîd Begê û rewşa Bengîn û Meyro peyivîn. Serê sibê, gava ro hê derneketibû, hesp ji tewlan derketin û haziriya çûyin û rêwîtiyê dest pê kir. Çend kes ji gundî, şagirt û dostên Evdal jî dê bi wan re biçûna.

Berî ku ew bi rê kevin, Meyro, Bengîn xewle kir, ew bir hundir, bi girî, ew hembêz kir û ramûsî. Bengîn jî delala xwe, pihêt, hembêz kir. Bi qasî bîstekê, ew welê, bêdeng, man. Paşê Meyro, bi hêdîka, jê re got,

- Bengîn, helalê min... Tu mêrê min û hevalê min ê qederê yî. Axirdewran jî were, qiyamet jî rabe, tu peyayê ber dilê min î. Riya me dûr, pêşiya me kûr e. Ez dixwazim ku tu bi hilavêtina dilê min bizanibî; bi dû te re, her tiştê xweş, her tevgerê geş li min heram e. Kinc û fistanên dezî û hewreşîmî, şehkirina porê bi kezî, kildana çav û birû, xwarina girara bi tawaş û nanê bi xwê, xewa li ser text û eywanan, rabûn û rûniştina nav heval û dostan, govenda dîlan û dawetan û mehr û zewaca mêran ê li min heram be.

Li ser van gotinan, Bengîn, çend car li ser hev,

Meyro ramûsa û bi dû re, serê wê rakir û li çavên wê yên belek nihêrî û her du çavên wê maç kirin û bi tenê ev peyv ji devê wî derketin,

- Li min jî...

Hingê ro li taştiyan bû. Wexta çûyinê hatibû. Ji zarokan pê ve tu kes ranezabû û herkes li meydana gund bû. Siwaran hesp anîbûn meydanê. Taximê hespê kihêlê bezayî, zîn û zengû li serê bûn. Bengîn û Meyro ji haziran xatir xwestin û ew, yek bi yek, hembêz kirin û destê mezinan ramûsîn. Wan xwe avêtin hembêz û destê Evdal û Gulê jî. Hingê Gulê, bi girîneke kezebxur, da tililiyan. Jinên din ên meydanê deng dan Gulê û wan jî dest bi tililiyê kir. Evdal jî dengê xwe bilind kir û şagirtan jî bi Evdal re, deng bilind kir. Di nav tililî, deng û stranê de, Bengîn hesp kişand ber kevirê siwarbûnê û Meyro lê siwar kir û paşê, bi xwe jî, lê siwar bû. Bengîn û Meyro bi sê dengan, dîsan, ji gund xatir xwestin û berê xwe dan çiyayê Şengalê, başûrê Kurdistanê.

Gelî guhdar û xwendevanan, em ê jî, niha, bidin pey wan û bi Bengîn û Meyro re herin û bibînin çi bi wan diqewime.

# 6
# Rêwindayên Sêwî

Kerwana fîraran ber bi çiyayê Şengalê, warê êzidiyan bi rê ket û bi rêwîtiyeke bi qasî panzdeh rojan, gihîşt çiyayê asê. Şengal warekî çetin, zehmet, asê û ji dinê bi dûr bû. Der û dor hemû çiya û zinarên bilind, gelî û newalên kûr bûn. Her der şinahî, kahnî û av bû. Teyr û tilûr, rawir û heywan pir bûn, lê meriv kêm bûn. Şengal cîhekî aram, lê bi xof û her tim bi mij û dûman bû.

Xelkê wî deverî kurd bûn, lê ne misilman bûn. Ew êzîdî bûn, law û keçên çiyayê asê, şêr û pilingên tebîetê. Ol û dînê wan kevnare bû, ji kûrahiyên tarîxa dûr hatibû. Wan xwe wekî neviyên Zerdeşt pêxember, law û keçên bijarte yên Rebbê Allemê didîtin. Ji lewre, ew bi hevaltî, peywendî, rabûn û rûniştina xwe nefsbiçûk, bi fikirîn, bawerî, raman û evîna xwe mezin û maxrûr bûn. Mesela wan li ser xwe û misilmanan weha digotin,

*Herçî misilman man û man,*
*Herçî êzidî ne,*
*Cilspî ne*
*Hemû cenetî ne*

Belê, cil, kinc û libasên wan spî bûn û ew nîşana paqijî û rindiya wan bû. Di bawerî, rê û qayidên ol û dînê êzidiyan de, şop, ders û şîretên Zerdeşt, Musa, Isa û Mihemed pêxemberan hebûn.

Ola êzidiyan pir kevnare bû, lê ew bê xwendin û nivisîn, pênûs û defter bû. Ji lewre, wê li ser riya tarîxê, ji eslê xwe, pir tişt winda kiribû û gelek tiştên din ketibûne navê. Kitêbeke wan a dînî û esasî nîn bû, lê gelek telqîn û qewlên wan ên niviskî hebûn. Ezidî koçerên vê dinyayê, mêvanên axretê bûn. Her gava ku kel li dînê radibû û dinya diçelqiya, agir li serê êzidiyan jî dibarî. Herkes li wan dihate xezebê. Ew bêkes û bêpişt bûn û ji gerîna dinê û çerxa felekê fahm nedikirin. Doraliyê wan bi agir pêçayî bû. Ew di nav behra misilmanan de giraveke biçûk a kevnare bûn. Tirk, ereb, ecem, kurdên misilman û ermen bi dijminahî li wan dinihêrîn û şûrê xwe li ser serê wan hildidan. U gava fersend dikete destê wan, bi darê zorê û şûrê xezebê, wan malik li êzidiyan dişewitand, ew ji war û welatê wan bi dûr dixistin û bi zor û kotek û xofê, ew ji ol û dînê êzidî diqulipandin.

Ji ber vê yekê, êzîdî ji dinê xeyîdî bûn û xwe spartibûn çiyayê xwe û li wê derê bêdeng dijiyan. Daxwaza wan jiyaneke azad û serbest û debareke bi qîma wan bû. Wan qîma xwe bi xwarina pariyekê, bi vexwarina ava tasekê, bi kêfa bîstekê, bi axa bihustekê, bi gotina dostekî dianîn. Wan û çiyayên xwe li hev dikirin, qîma xwe bi hev dianîn, bela xwe li kesî nedigerandin û nedixwestin ku kes jî bela xwe li wan bigerîne.

Dinya kambax, her gav, xayintî li wan kiribû. Wan rûyê xwe ber bi kû kiribû, rîha wan hatibû birîn. Ji lewre, wan ayet, telqîn û qewlên xwe yên niviskî, mîna Kitaba Cilwe, Meshefa Reş, Qewlê

Zebûnê Meysûr, Qewlê Sura Efirîna Dinyayê di nav çiyayê Şengalê de, li newalekê, di nav sandoqeke hesinî û kilîtkirî de vedişartin û bi kesî nîşan nedidan. Sandoq li ber destê nobedaran bû û kilît li cem mezinê êzidiyan Ixtiyarê Mergehê bû.

Em gotina xwe li ser êzidiyan dirêj nekin. Ew çiyayî û girtî bûn û ji halê xwe razî bûn. Bi tenê wan jî wekî her kesî, derdekî hebû; Pala Osman û Kör Reşîd Paşayên malikşewitî. Carina Pala Osman Paşa, carina Kör Reşîd Paşa davête ser wan û ew ditirsandin.

Gava kerwana Bengîn û Meyro gihîşte Şengalê, êzidiyan qedir û qîmeteke mezin dan Bengîn û Meyro û ew bi dil û can ezimandin. Evdalê Zeynikê ew şandibûn û ew law û keça Evdal bûn... Evdal dostê êzidiyan ê bav û kalan bû. Wan digot; dostaniya dostê xwe berde, belê dostaniya dostê bavê xwe bernede. Wan pir bawerî bi Evdal hebû û ji deng, hunermendî, însanetî û dilovaniya wî hez dikirin. Evdal jî ew qet ji bîr nedikirin û gava riya wî ber bi wan deran diket, ew diçû û li wan dibû mêvan û bi mehan, li cem wan dima. Niha karê Evdal bi wan ketibû û ji wan tika kiribû ku ew li Bengîn û Meyro xwedî derkevin û wan bihewînin heta ku xezeba Egîd Begê malmîrat dabiketa.

Lê dewsa ku xezeba Egîd Begê dakeve, tewr ew hîn zêde bû. Wî dîsan siwar şandin gund. Lê Bengîn û Meyro winda bûbûn. Siwar ber bi her alî de çûn, ji her kesî pirsîn, şopa her mehlûqî, teyr û rawirî hildan, lê kirin, nekirin, nikarîbûn Bengîn û Meyro bidîtina. Erd qelişîbû û Bengîn û Meyro ketibûnê. Tu kesî tiştekî nizanîbû, nedîtibû û nebihîstibû. Xelk bûbû kor, kerr û lal. Vî tiştî Egîd Beg kir gurê har û kef bi dev xistê. Wî emir û ferman bi her derî firandin û siwarên xwe û Osmaniyan bi

her derî gîhandin da ku Bengîn û Meyro bi dest xîne û bi vî awayî derba mirinê li Evdal, dengbêjê Tahar Xanê rehmetî xîne. Lê Egîd Begê û siwarên wî, tevî zor û zulma xwe, bi tenê mabûn, kesî alîkarî li wan nedikir.

Bi vî awayî roj, meh û sal bihurîn. Mesele li ser mesele qulipîn, wext û dewran li pey hev zivirîn. Lê kîn, nefret û rika Egîd Begê neguherîn. Xelkê mesela Bengîn û Meyro ji bîr kir, lê Egîd Begê di heşê xwe de mor kir.

Wext û zeman bi vî awayî gêr dibû û diçû heta ku rojekê Kör Reşîd Paşayê malikşewitî hate ziyareta Egîd Begê malmîrat. Nîşanê baranê ba bû, nîşanê mirinê ta bû û nîşanê xirabî û navkokiyê Egîd Beg û Kör Reşîd Paşa bû. Eger Kör Reşîd Paşa hatibûya cem Egîd Begê, mana xwe ew bû ku ruhistîn dîsan li pê û li govendan bû. Kör Reşîd Paşa çend rojan li cem Egîd Begê ma û ew li ser rewşa dewleta Osmanî, hukmê Egîd Begê, gerandina kar û şixulên dewletê peyivîn. Her du alî ji hev razî bûn. Şeva dawîn Egîd Begê şênahiyeke mezin li dar xist. Reqase û qeşmer, pehlîwan û leheng, tembûrvan û stranvan ketin nav hev. Bi dehan kahr û berxên birajtî hatin xwarin û wekî ava kahniyê şeraba yaqûdî hate vexwarin. Derengê şevê, Kör Reşîd Paşa destê xwe avêt rîha xwe, pê lîst, bi darikekê, goştê navbera diranê xwe paqij kir û bi pîqe pîq li Egîd Begê ku li kêleka wî rûniştibû, vegerî û got,

- Egîd Begê, Egîd Begê... xwediyê navê xwe be... Ka egîdiya te? Me bawer dikir, destê te dirêj, hukim û qudreta te giran, gotina te qanûn e. Lê em dibînin ku kes li te guhdarî nake û xelk gotina te dide bin lingan... Egîd Begê tu bilind firiyayî, nizm ketî. Te nikaribû du sêwiyên kuçe û kolanan bibînî. Xelk bi te dikene, qirf û henekên xwe bi te dike... Egîd Begê,

şixul û kar bi zirt û fortan nayên gerandin. Tu dê hûr binihêrî, kûr binihêrî û dûr binihêrî. Ma tu bawer î ku ew sêwiyên îxtiyarê kor li van deran, nêzîkê min û te ne?.. Egîd Begê, dûr binihêre, dûr...

Li ser van qiseyan, Egîd Begê têgihîşt ku haya Kör Reşîd Paşa ji tiştina hebû. Dotira rojê, gava Kör Reşîd Paşa bajar terk kir, Egîd Begê jî, bi qasî barê çend bergîran yadîgar, mucewher, kinc û libas, cil û xalîçe, çerm û xençer, li bergîran bar kir, bi xwe jî, tevî siwarên xwe, li hespê xwe siwar bû û da pey Kör Reşîd Paşa û pê re heta bajarê Erziromê çû. Wî xwe li ber Paşa kire erd, wekî gogekê, li pey Paşa reviya, çû û hat. Paşa, bi qasî têra xwe, Egîd Beg westand, pê keniya û pê lîst û her gotina xwe xiste heşê wî û bi dû re jê re weha got,

- Egîd Begê, Egîd Begê... mêr be, mêr. Hinekî dest bibe xwe, bigure, şixul bigerîne. Egîd Begê, ji bîr meke, destê dewletê dirêj, bi her cîhî digîhe, guhê wî vekirî, bi her tiştî dibihîse. Ew sêwiyên ku tu li pey î, li çiyayê Şengalê, nik êzidiyan in. Egîd Begê, we kurdan gotiye; ecelê nêrî tê, dere nanê şivan dixwe. Welê dixuye ku êzîdî, dîsan, ders û kotekan dixwazin. Egîd Begê, me şermezar meke, kirin û gotina dewletê pûç dermexe. Dest bibe xwe, dest...

Bi gotin û beyankirina Kör Reşîd Paşa re, kêfeke boş bi serê Egîd Begê re hat. Niha rê lê, bi her awayî, vebûbû... Ew vegeriya warê xwe, delal derxist bajêr û da beyankirin ku hefteyekê kêf û şênahî ye, xwarin û vexwarin li ser qonaxê ye, dawet û dîlan û govend serbest e. Kesî fahm nekir ka ev çi tişt e û çima rehm û çilka rindî û xweşiyê ketiye dilê Egîd Begê. Bi dû sê heftan re, Gava Egîd Begê çek û pûsatên xwe hildan û sîh tabûrên nîzamî ji eskerên xwe û Osmaniyan, bi top û qumberên giran hilanî û berê xwe da başûrê welêt, hingê sebebê şênahiya wî

fahm bû. Wî şopa Bengîn û Meyro hilanîbû û sefer dibir ser çiyayê Şengalê. Niha kîn û nefreta wî qulipîbû ser êzidiyan û weha digot,

-Nexwe, nevî û torinên şeytên wan dêqehpan dihewînin û ji min vedişêrin. Pîncên şeytên li bela xwe digerin, jixwe ew gunehkarên dînê Mihemed in.

Wî jî, mîna xedar û neyarên êzidiyan, êzidî bi "lawên şeytên" bi nav dikirin. Wî riya kambaxa Şengalê li ber xwe danî û sefer li xopana Şengalê hilanî. Li rê, wî du kumandarên xwe, di zûtirîn wext de, şandin cem mezinên êzidiyan, Ixtiyarê Mergehê, Şêx Xelef da ku Şêx Xelef Bengîn û Meyro teslîmî kumandaran bike. Wî dizanîbû ku kes Bengîn û Meyro teslîmî wî nake. Lê wî, digel vê yekê, meriv dişandin da ku nîşan bide ku ew şer naxwaze.

Sefera Egîd Begê li her alîyê deng da. Xebera kambax gihîşte gund jî. Evdal û Gulê bi xeberê veciniqîn. Wan, mîna her kesî, bawer dikirin ku êdî mesele xelas bûye û ji bîr bûye. Niha Egîd Begê malmîrat, bi quweteke mezin, davête ser Şengalê, warê Bengîn û Meyro. Kîn û nefreta Egîd Begê ewçend xurt bû ku wî ji ber kerba du sêwiyan, ev tişt dikirin. Evdal xeberek bi beg û giregirên kurdan gîhande ku ew rê li Egîd Begê û xwînrijandinê bigirin.

Ev yeka ku Egîd Begê dikir ne li gora adet û ûsilên kurdan bû. Egîd Begê her celeb adet û ûsil dabûn bin lingan. Beg û giregir, qor bi qor, kom bi kom, diçûn û li ser rê, xwe bi Egîd Begê digîhandin, carina jê lome dikirin, carina jê tika dikirin ku ew dev ji seferê berde û vegere. Beg û giregiran digotin,

- Egîd Begê... ev kirin û sefer bi mezin û giregirekî mîna te nakeve. Ji ber du masûm û sêwiyan, te alay û tabûr rakirine û te rebenê welêt daye ber xem û derdan. Egîd Begê, xwîn bi xwînê nayê şuştin. Roj,

roja aqil û fahmê ye. Tu mezin î, mezinahî û dilovanî ji te ye. Wan kir, tu meke û êzidiyên bêgune jî pê re meşewitîne...

Mezinê êzidiyan Şêx Xelef jî, bi kumandaran, bersîv şandibûyê û gotibûyê,

- Gotina Egîd Begê li ser seran û çavan e. Lê, me û welatê me jî adet û ûsil hene. Ma Egîd Begê bi van adet û ûsilan nizane? Ma eger yek here û xwe bavê tor û bextê Egîd Begê, ew ê wî zilamî bide bi şûnde? Ma Egîd Begê nizane ku Bengîn û Meyro hatine û xwe avêtine ber bextê me êzidiyane. Ew mêvanên Yezdanê dilovan û mêvanên me ne. Qedr û qîmeta Egîd Begê li cem me zahf e. Bila ew her tiştî ji me bixwaze, lê bişûndedayina Bengîn û Meyro ji me nexwaze. Bila ew were, bibe mêvanê me, em keç û lawên xwe ji bo wî serjê bikine, lê em nikarin mêvanên xwe bidine. Herçî şer e, em jê direvine û em bi Egîd Begê û dewleta Osmanê Alî nikanine û em li ber wan ranabine, lê em li ber allemê şermezar nabine û bi adet û ûsilan nalîzine...

Xeber û silavên ku Şêx Xelef şandin, hatin û libergerîna beg û giregiran pere nekir. Fersend bi destê Egîd Begê ketibû û wî pişta xwe bi gotinên Kör Reşîd Paşa şidandibû. Wî li kesî guhdarî nekir û avête ser Şengalê. Çiya asê bû, bihur tune bû, tê re çûyin çetin bû. Egîd Begê top û qumberên xwe li cîh hîştin û bi siwaran kete Şengalê. Ezidiyan li ber xwe nedan, wan xwe bi şûnde vekişandin, ber bi navenda çiyê, Newala Laleşê çûn. Wan Bengîn û Meyro mîna çavê xwe diparastin û cîhên wan her tim diguherandin. Newala Laleşê kahniya ola êzidiyan bû û cîhê wan ê miqedestirîn bû. Mala Ixtiyarê Mergehê, mezinê êzidiyan li wir bû. Hemû avahiyên miqedes ên êzidiyan û kitab û defterên wan ên veşartî li wir bûn. Li wê derê, bi navê Berê-reşê Mieleq, Kaf,

Zimzim û Kaniya Spî çar ziyaretgehên êzidiyan hebûn û heta êzidiyekî ew cîh ziyaret nekirina olperwerî û heca wî qebûl nedibû. Newala Laleşê ewçend miqedes bû ku êzidiyan di Qewlê Sura Efirîna Dinyayê de weha gotibûn,

*Xudavendê me hoste ber e,*
*Lalîş jorde anî xware,*
*Lalîş bû xweş cîh û war e,*
*Li erdê şîn bû nebat e,*
*Pê zeyinî zêndî qinyat e.*

Newala Laleşê dilê êzidiyan bû.

Lê belê, ma ev yek bi xema Egîd Begê bû? Wî û siwarên wî xwe bi Newala Laleşê girtin û bi dirêjahiya mehekê di çiya û zinaran de bihurîn û xwe bi doraliyê Laleşê gîhandin. Hingê wî, ji nû ve, xeberek bi Şêx Xelef gîhand da ku êzîdî Bengîn û Meyro teslîmî wî bikin. Lê herwekî gotina Egîd Begê, gotina êzidiyan jî gotin bû. Hingê Egîd Begê û siwarên wî bi ser êzidiyan de girtin. Lê ne rasterast li cîhên miqedes, li doraliyên cîhên miqedes. Şerekî mezin li wir qewimî. Ezidiyan bi mêranî li ber xwe dan û Bengîn û Meyro parastin. Lê biserketina êzidiyan bêîmkan bû. Siwarên Egîd Begê êriş birin doraliyên Newala Laleşê û gund xirab kirin, jin, mêr, kal û zarok kuştin, agir bi dar û ber xistin, pez û dewarên wan serjê kirin.

Ezidiyan fahm kir ku halê wan dijwar bû. Ew li hev civiyan û biryar dan ku hemû quwetên xwe vekişînin navenda Newala Laleşê û newalê hem ji bo xwe hem jî ji bo Egîd Begê malmîrat û eskerên wî bikine goristan. Kesî diviya destê xwe neda kitab, defter û cîhên wan ên miqedes!.. Mirin ji wê kirêtiyê çêtir bû. U hebûn, jiyan û parastina Bengîn

û Meyro ji canê wan girîngtir bû. Loma wan Bengîn û Meyro, tevî çend siwaran, ji meydana şer û Newala Laleşê bi dûr xistin û şandin aliyê din ê çiyayê Şengalê.

Lê hin sextekar û fêlbaz li çiyayê Şengalê jî hebûn... Xebera çûyina Bengîn û Meyro, bi leza birûskê, bi Egîd Begê gihîşt. Egîd Begê keniya û simbêl bada û taximekî siwar bi ser riya Bengîn û Meyro de şand. Siwarên Egîd Begê hema êriş nebirin ser sêwiyan. Dewsa êrîşê, wan rê da ku kerwana biçûk a rêwindayiyan ji Newalê bi dûr keve. U şevekê, wan avêt ser kerwan û di şikefteke de ew girtin. Siwarên xwînrêj êzidiyên canfeda ku bi Bengîn û Meyro re bûn, kuştin û Bengîn û Meyro bi saxî girtin û bi xwe re birin cem Egîd Begê malmîrat.

Egîd Begê bi ser ketibû. Wî sêwiyên stûxwar girtin û ji ber çavan winda kirin. Dîsan wekî ku erd qelişîbû û ew ketibûnê. Bengîn û Meyro bêreh û bêşop winda bûbûn. Kesî nizanîbû ka ew mirine yan mane. Rîcacî û elçiyên ku diçûn cem Egîd Begê û jê halê Bengîn û Meyro dipirsîn, destvala vedigerîn. Egîd Begê bi simbêlê xwe dilîst û bi ken û qerf ji wan dipirsî,

- We negot, ma halê Evdalê kor niha çawan e?

Bi qasî deh rojan berî wê roja Newroza ku Evdal xwe li çiyayê Sîpanê Xelatê girt, Evdal xebera girtina Bengîn û Meyro bihîst. Dinya wî ya reş, bi carekê, bû dojeh, agirê cehenemê bi beden û ruhê wî ket. Gulê kir qîrîn û nalîn. Mala Evdal û medresa wî bûn cîhên şîn û tahziyê. Bi sedan, bi hezaran kes hatin û halê wan pirsîn û bêdeng hêstir barandin, axîn kişandin.

Ji destê Evdalê kokim tiştek nedihat.

Kirin û tevgera Egîd Begê malmîrat li bajar,

gund, cîh û deverên welêt belav bû. Xelk li ber bûyeran diket û lanet li Egîd Begê dibarand. Lê ji destê kesekî tu tiştek nedihat. Li welêt kes nîn bû ku bikaribiya li hember kîn û nefreta Egîd Begê rabûya û dengê girîn, qîrîn û nalîna xelkê bilind bikira.

Xwendevan û guhdarên xwedî sebir û bîhnfireh, aha, gava ku Evdal biryara xwe da û xwe li çiyayê Sîpanê Xelatê girt, hal, hewal û rewş weha bû û loma xelkê jî bi dû wî dabû.

Em ê, niha, dîsan, xwe bi Sîpanê Xelatê bigihînin û werin cem Evdal, Gulê û xelkê.

# BERBANG

# 1
# Xebera Xweş

Rojeke xweş û bendewar qulipîbû. Berbangekê çûbû, yeka nû hatibû. Di dirêjahiya wê rojê de, ew xeberên ku Evdal, Gulê û xelk li bendê bûn, hê jî nehatibûn. Dinya sayî bû û dest bi ronîbûnê kiribû. Germahiyeke tenik û sivik, ji dûr, dihat û xwe bi serê çiyayê Sîpanê Xelatê digîhand. Dinya bêdeng bû, ji dengê Evdal pê ve, tu deng nîn bû. Xew hê bi çavê Evdal, Gulê û yên mayî neketibû. Ew ji serê çiyê daneketibûn û neçûbûn, neketibûn nav konên xwe yên reş û nebûbûn hevalên xewa xweş. Ew li benda xeberan bûn. Ew westiyayî bûn û li dora agirê li kêleka gola spî rûniştibûn û li Evdal guhdarî dikirin. Gulokên agirê êzingan hê xwe dilivand û ber bi jor dibûn. Li wir, ji xweliya êgir, girekî biçûk hatibû pê û agir ji gir radibû. Agir li ser ava spî ya golê şewq dida û dibiriqî.

Berbangeke nû, rojeke nû dest pê dikir. Jiyaneke nû dest pê dikir. Stêrk vedimirîn û diçûn ava. Tîrêjên royê, bi giranî, serî hildidan. Kulîlkên nû dibişkuvîn. Çûk û çivîkên nû hêkên xwe dişkandin û bi wîçewîç dest bi jîna vê dinê dikirin. Dilopên

sayiya sibê li ser giya, kulîlk, pel û daran dibiriqîn. Golê rengê xwe diguherî, ji rengekî girtî yê şevê diqulipî ser rengekî vekirî yê gewrê taştiyan. Li jêr, nêzîkî konan, hespekî hîrehîr dikir û diza û cahniyek dianî dinê. Teyrekî, ji jor, dixwend û xêrhatin li roja nû dikir. Dinya hişyar dibû.

Evdalê Zeynikê, jina wî Gulê, lawê wî Temo, şagirtên Evdal, heval û dostên Evdal û xelkê Evdal, li serê çiyayê Sîpanê Xelatê, li kêleka gola spî, rûniştibûn û şahîdî li çerxa dinyayê û leza dewr û dewranê dikirin û dipan; jina Temo Zînê li ber welidandinê bû, rêber û gundî şop biribûn ser Bengîn û Meyro û li rê bûn ku xwe bi wan bigihînin. Ji bêxewî, west, kerb, derd û keseran, çavên Evdal, mîna çiyayê agir bi dev ketî, dêşiyan û dişewitîn. Bîhn û hilma bihara teze û heyama nûbişkuvî û hatina teyr û qulingan, qulingê baskşikestî dîn kiribû û ew nedihewiya.

Wan dipan û guh didan stranên Evdal.

Li jêrê, di nav konan de jî, jiyanê dest pê kiribû. Xelk hişyar dibû û ji konên xwe yên reş derdiketin û bi ava sar a kahniyê dest û rûyê xwe dişuştin. Konên doraliyê Sîpanê Xelatê reş dikirin. Kon ji mûyên bizinan hatibûn risandin û hûnandin. Kurdan ji konên reş pir hez dikirin û digotin, "konê reş, warê xweş." U weha, bi vî awayî, li çarmedora Sîpanê Xelatê, konên reş vegirtin û doralî bi reşahiya konan pêçandin, celebeke dengdan bû. Dengdaneke bêdeng. Xelkê singê konan kutabûn û serê konan hildabûn û bi bêdengî deng dabûn.

Dengê dengdana bêdeng Evdal bû. Wî bêwest û bêrawest, her û her, dengê xwe bilind dikir û digot. Wî berbanga nû, roja teze nedidît, lê bi dengê xwe, xêrhatinî lê dikir,

*Hey li min feleke,*
*Te çima li min weha kir?*
*Te teyrê xwe berda, koma refê min belav kir,*
*Te ez kirim qutîkî pole, dev û lêva wî şima kir,*
*Herçî dost bû, te li min melûl kir,*
*Herçî dijmin bû, te li min şa kir,*
*Hey li min feleke,*
*Zozanê Sîpanê Xelatê xweş e, li siya darê,*
*Felekê ez şaş kirime, berdaye, geh li jorê, geh li xwarê,*
*Felek xayin e, dewran bêbext e, dikime-nakime, qet nayê li karê,*
*Hey li min feleke...*

Evdal bi deng, pejn û hîsan dijiya, ne bi çavan. Di nav çend salên dawîn de, hem ew, hem Gulê pir ketibûn û bi qasî kulmekê mabûn. Bi xêra deng, gotin, kilam û stranan, ew hê jî dikarîbûn li ser piyan bûna. Evdal, niha, kalbûn û pîrbûna kambax, bi cavan, nedidît, lê dilê wî, ruh û canê wî, wekî çola li bin tava germ, qewirîbû. Li milekî din, hêz û pejna bi bîranîn û li pey dewr û dewranên bihurî ketin, li nik Evdal, pir bi pêş ve ketibû. Wext, dem, dewr û heyamên bihurî, niha, mîna dilopên zelal, yek bi yek, dihatin bîra Evdal. Wî do û îro, heyamên kevnare û heyamên nû, bûyerên qewimî û hedîsên diqewimîn, serpêhatiyên bav û kalan û siûda xwe, Gulê, Temo, Bengîn, Meyro, Tahar Xan, Şêx Silê, quling, bi hostehî, dixiste nav hev û jê kilam û stranên giranbiha dianîn pê. Pir caran, wî stranên kevn, serpêhatiyên qedîm digotin, lê belê, di esasê xwe de, qesta wî roja wî û hedîsên heyama wî bûn. Loma wî rewş, tevger û hedîsên roja xwe jî li stran û serpêhatiyan zêde dikir û ew, li gora xwe, dixemiland, dikemiland û ji nû ve, dirêsand. Evdal merivê kêf û henekan bû. Lê mixabin ku ew li wela-

tekî dijiya ku derd û keserên pir kûr, jê bi dûr nedibûn. Ji ber vê yekê, piraniya stranên wî zîz, melûl, xemgir, keserkûr û bişewat bûn. Ji roja ku ew kor bû û vir ve, kesî nebihîstibû ku wî straneke bi kêf û henek gotibû. Heft sal wî dengbêjiya xem, keser û derdan kiribû. Stran û eserên wî neynika jiyana wî, dengê ruh û dilê wî bûn.

Di wê berbanga nû de, wî dil û hêvî hebû ku stranên bi kêf û henek bigotina.

Tevgera xelkê, çûyîn û hatinê dest pê kiribû. Deng zêde bûbûn û şêniyên ku li dora Evdal rûnişibûn, dîsan, zêde dibûn. Zarokan dest bi qîrînê kiribû. Gava tîrêjên royê xwe bi bilindahiyên Sîpanê Xelatê gîhandibûn û bi şewqa xwe zora reşahiya şevê biribûn, hingê xortekî û sê pîrejin, ji aliyê konan, derketin û bi qîreqîr û xirecir, ber bi serê çiyê, koma şênî hatin. Çaxa wan nêzîkî li civata mezin kir, hemûyan, bi dengekî û bi qîrîn, bang li civatê kirin û gotin,

- Mizgîniya me li we, mizgîniya me li we... Zarokekî Temo û Zînê bû, zarokek hate dinê... Zînê mala Evdal û Gulê şên kir, lawekî mîna topa nûrê anî dinê...

Bi vî awayî, wan xebera xweş bi cimatê gîhand. Hingê bedena Evdal a jar heziya, ew ricifî û nefes lê çikiya. Wî xebereke weha xweş nedipa. Ev heft sal bûn ku şevereşekê bi ser wî de hatibû, nan û av lê herimîbû, derd û keserê nefes lê çikandibû, xewa şevan lê heram bûbû û ew bi xebereke xweş hesret mabû. Bi qasî kêlîkê, ew bêdeng, bênefes ma. Hay lê dinyayê... pîrozbayî û bextiyariyê nefes li Evdal çikandibû û deng jê dernediket... Bi dû bîskekê re, Gulê deng li Temo kir û got,

- Temo, lawo... rebeno, şîrhelalo... tu bûyî bav, ez bûme pîrik, Evdal bûye kalik. Xweş e, roja nû xweş

e, xweş dest pê kiriye. De rabe, lez ke, bilezîne, bireve û xwe bi kon bigihîne, lawê xwe bibîne, ji çav û eniya Zînê maç ke.

Temo xebera xweş têgihîştibû. Wî bi ken li doralî nihêrî. Herçî Evdal bû, bêdeng bû, lê ji kêfa wî re payan nîn bû. Temo rabû ser xwe, Gulê û pîrejinan dan tilîliyan û Temo dest bi revê kir. Lê ne ber bi konan. Wî dest pê kir, li dora golê reviya û zivirî. Wî tiştine digotin, lê kesî fahm nedikir. Ew kêfxweş bû. Ew bi têra xwe, çend caran, li dora golê zivirî. Paşê ew hat û di ser serê bav û diya xwe re sekinî, li wan û li şênî, bi dirêjahiya çend hilmên qelûnê, nihêrî û ji nişkekê ve, berê xwe da konan, reviya û çû. Tîrêjên royê ji aliyê ku Temo ber biyê direviya, hildihatin. Temo zerahiya asoyê û sorahiya tîrêjan da ber xwe û ber bi wan reviya û ber bi aliyê konan ji ber çavan winda bû.

Xeber xweş bû, lê dinya jî bi dor bû, geh li jor, geh li jêr bû... Niha jî, em ê bên ser xebera nexweş.

## 2
## Xebera Reş

Qeda li dinê bikeve. Ew birînan nacebirîne, nexweşan sax nake, nexweşiyan ji meydanê ranake, kêfxweşî û dilxweşiyê daîm nake. Xebera ku pîrejinan bi Evdal û doralî gîhand, kêfxweşiyeke boş li ser civatê û xelkê reşand. Bi dû xem, keser û bîhntengiya mehan re, ev xeber bû mîna barana biharê ku xêr û bêr jî pê re dihat. Gulê û jinan dan tilîliyan, xort rabûn govendan, dengbêj û stranvanan dest dan ber guhan û awaza stranê gîhandin bi esmanan, xelkê da çepikan û Evdal jî, ji kêfxweşiyê, kete nav xewn û xeyalan. Gelo hebû ku siûda wan qulipîbû? Hebû ku feleka kambax rû ji wan badabû? Hebû ku ew tiştên ku li gund lê beyan bûbûn, niha dest pê kiribûn... û Sîpanê Xelatê hatibû hawara wan?..

Gelo hebû ku çavên wî jî vebûna û bask û perwazên quling sax bûna û quling xwe refên heval û dostan bigîhanda?

Bi dû demeke bêdengiyê, Evdal dîsan destê xwe bir ber guhê xwe. Niha kêf û heyecana wî bilindtir, bawerî û hêviya wî têkûztir, deng û awaza wî xurttir

bû.

*Konên me derketine Sîpanê Xelatê, van deran,*
*Evdalê Zeynikê kor e, ew maye li ser fîraran,*
*De wayê, li min wayê,*
*Qeda bê li serê te dinyayê,*
*Erê qulingo, erê, li Sîpanê Xelatê diqîrînî,*
*Dil û cigera min tev dihelînî,*
*Xweziya wan salan, wan zemanan,*
*Perwazên te sax bûn, ez jî bi selametî li zozanan,*
*Qulingo de bibêje, biqîrîne,*
*Derdên te zahf in, baskên te şikestî ne,*
*De were, em xwe bidin ber hîkmet û qudreta Sîpanê Xelatê,*
*Bila çavên min sax ke, baskên te bicebirîne.*

Quling jî dest bi qîreqîr kiribû, dengê wî jî li dengan zêde bûbû... Kela Evdal rabûbû. Di berbanga wê sibê de, wî got û got. Stran li pey stran, serpêhatî li ser serpêhatî, hedîse li ser hedîse. Kurdistan bû straneke bêhudûd û kete devê Evdal. Dinya bi peyvên Evdal hate hûnandin. Siûd bûn rêzên stranên Evdal. Egîd Beg û namerdiyên wî, li ber lehiya stranên Evdal, bi xîçekî biçûk. Evdal digot,

- Lo, lo, şagirtino, lo, lo... dilê xweş her lê bihar e. Xwediyê dilê xweş nemir e û her lê qaleqal e. Li şaîrê me yê mezin Ehmedê Xanî binihêrine û lê hûr bibine. Bi dû Seydayê Ehmedê Xanî re, gelek mîr, beg û giregir hatine û çûne. Ka ji wan kîjan nav mane? Lê navê Seydayê mezin abadîn e, li ser birc û kelehên welatê me nivîsî ye. Kirina Egîd Begê, kirina kesên bênav, bêtov û bêrê ye. Egîd Begê îro heye, sibê tune.

Di lehiya stran û gotinan de, bêguman, sing û sitûna esasî Bengîn û Meyro bû. Heşê Evdal her li

ser wan bû. Gelo çi bi wan qewimîbû? Bi dû xebera pîroz a lawê Temo re, roja nû dê xebera xêrê ji aliyê çiyayê Şengalê bi wî negîhanda? Dengê Bengîn û Meyro dê, dîsan, bi guhê wî neketa? Wî dê, dîsan, ew li ber coga xwe neda rûniştin û ji wan re stran negotina? Evdal qise û gotin li hev dianî, li hev digerand û bi siûda Bengîn û Meyro digîhand.

- Gelî hevalan... dostino... hogirên payiza umrê mino... ez neketime ber girtinê. Girtin, girtina mêran e. Qeyd xirxalê şêran e. Derdê min rabûn û hilweşîna adet û ûsilan e. Ma we dîtiye, bihîstiye ku mezin û beg li pey sêwiyan e, bi dû dilgir û evîndaran e? Welatê me mîna berfê spî ye, paqij û delal e, warê adet û ûsilan e. Lê îro ker û kûçik li serê dizirine û diewitine. Li min bibihurine ku ez niha vê qisê dikime, lê belê, ji berfê spîtir tişt tune û ker û kûçik hatine û li serê dirîne... Lê min ji Yezdanê pak û dilovan hêvî heye ku ew Bengîn û Tavbanûya min bi min bigihîne.

Evdal hê weha dipeyivî, hin pîrejin, ji aliyê konan, hatin û bêdeng dest li Gulê kirin. Wan bi dest nîşan dan ku Gulê, bi hêdîka, bêdeng rabe û ber bi wan here. Gulê rabû û ber bi wan çû. Bi qasî bîstekê, wan, ji Evdal û civatê bi dûr, pistepist kirin û paşê, bi hev re, ber bi aliyê konan vegerîn û çûn. Evdal pê hesiya ku Gulê çû û wî bi ken got,

- We dît... mehrûma Gulê nehewiya. Ew çû neviyê xwe bibîne.

Piraniya kesên ku dabûn pey Evdal û hatibûn serê Sîpanê Xelatê, gundî bûn. Gelek dengbêj, stranvan, govengêr, çîrokbêj, mitrib, sazbend, bilûrvan û hunermend jî piştgirtiya xwe nîşan dabûn û hatibûn ba pîrê xwe. Beg û giregirên ku qedr û qîmet didan Evdal û ji rewşê û kirinên Egîd Begê û kesên wekî Egîd Begê nerazî bûn, silavên xwe dişandin û bi xwarin, vexwarin, kinc û cil radibûn.

Wê gavê, li welêt, ecêptirîn tişt tora ku dengbêjan li seranserê welêt risandibûn, bû. Wan hevûdu dinasîn û haya wan ji hev hebû. Wan gotin, fikir û xeberên xwe diguhezandin hev. Xebereke, gotineke, daxwazeke dikarîbû, di nav rojeke de, ji milekî welêt bigihîşta milê din. U di navbera çiyayê Şengalê û çiyayê Sîpanê Xelatê de, wan xeber dibirin û dianîn. Loma xeber zû diçûn û dihatin.

- Alîmekî bi alleme ye, Evdal got û peyva xwe domand, birîndar bi birîna xwe dizane, hekîm çi jê dizane? Li welatê me alîm kêm e, ew bi tiliyên destan tên hijmartine. Li alîkî Osmanî, li alîkî Egîd Begê û kesên mîna Egîd Begê welatê mîna berfê spî û paqij kirine seyrangeha cahîl û nezanane, ne meclîs û dîwana xwendan e, ne aqilmend û alîman e... Dijminên kitab, defter, adet û ûsilan li ser hukima ne. De werin, ji min, evdalê Xwedê re bibêjine, ev hal çi hal e?.. Min bihîstiye, Egîd Begê gelek xirabî bi êzidiyan jî kiriye...

Di wê navberê de, Gulê, bi komeke jin û mêr û xort, vegeriya cem Evdal û civatê. Rûyê wê sar, çavên wê bi girî bûn. Ji komê deng dernediket. Ew, bi hêdîka, hatin û peregende rûniştin. Gulê jî li kêleka Evdal rûnişt. Civatê dît ku tiştekî ne bixêr hatibû pê. Lê, Evdal Gulê û kom nedidît. Ew pêhesiya ku Gulê tevî hinekan hate. Wî gotina xwe birî û li Gulê vegeriya,

- Gulê, mehrûmê... Te lezand û xwe bi torinê xwe gîhand. De ka bibê, torinê te çawan e, bi kê dişibe? Zînê di çi halî de ye?

- Evdalo, mehrûmo... torinê te pariyekî şekir e, çilkekî zêr e. Ew diqîre... û girîna wî mîna stranê ye. Ew li kalikê xwe, dengbêjê welêt Evdalê Zeynikê çûye. Çavên wî mezin, eniya wî vekirî ye. Nûr li ser rû dibarine. Herçî Zînê ye, ji kêfan difire, lawê xwe

kiriye hembêza xwe û dilorîne. Dê û law, her du di nav cîhekî de, mîna melayikan, radikevine... Lê ez çi bikim, qeda li dinyayê keve, kêfxweşiya me di gewriya me de diqurmiçe. Hal ne hal e.

Gulê li wir sekinî, ew hew dikarîbû bipeyiviya û bigota.

- Gulê, mehrûmê... tu jina min a çend salan î, şirîka jîn, can û ruhê min î. Veşartî û diziyên me nîn in. Tu qise û gotinê digerînî, qesta tiştina dikî. Tu bi xwe pê dizanî; eger av di golê de bimîne, dibe genî. Tu bi qise û gotinên xwe yên vekirî, bi nav û deng î. De were mehrûma min... eger çi be jî, tu dê gotina xwe ji min re bibêjî.

- Ma ez çi bibêjim, Evdalo, mehrûmo... Tiştê ku bi serê me de tê, bila bi serê kesî de neyê. Berî niha bi bîstekê, rûyê me bi ken, dilê me bi kel nû, me şukir û hemd bû. Niha rûyê me bi girîn, devê me bi qîrîn, dilê me bi birîn e. Xwedê li me xirab aniye. Ma ez çi bibêjim, çawan bibêjim, ji kû dest pê bikim? Hawirdor geremol e, li aliyekî nûr e, li aliyekî tarî ye. De ez çi bibêjim Evdalo! dil bi kulo, ji hundir birîndaro!..

Gulê destên Evdal xistin nav destên xwe û ew guvaştin. Evdal, niha, dîsan, dest bi hezînê kir. Digel ku dinê hê sayî bû, dilopên xwîdanê li ser eniya wî civiyan.

- Mala minê, wî got, niha mala min şewitî, pergala min belav bû. Niha Egîd Begê pişta min şikand, ruh û canê min guvişand. Wey li min... Tavbanûyê, çavbelekê, kezîzerê... Bengîno, çelengo, delalo, lawo... axxx... Gulê, mehrûmê Gulê, de bibê ka çawan bûye, we çi bihîstiye, Gulê...

- Evdalo, siûdxirabo, te dît çi bi serê me de hate? Mala me şewitiye, ocaxê me belav bûye. Egîd Begê malmîrat Bengîn û Meyro bi kuştin dane... ha ho...

ma ev qise dê jî ji devê min derketa, haho... Niha, berî bîskekê, du siwarên êzidiyan xwe bi me gîhandine û xebera reş gotine. Ezîdî, gundî û dengbêj li ser şopa Bengîn û Meyro bûne. Wan Bengîn û Meyro, li kêleka çiyayê Şengalê, li bihurekê, di nav şikefteke de dîtine. Bengîn û Meyro li kêleka hev razayî bûne. Destên wan li ser hev, rûyên wan bi ken û bi huzûr bûne. Di şikefta tarî de, rûyên wan ronî û aram bûne. Li ser laş û bedenên wan şopên lêdan û birînê nebûne. Ew di nav kincên xwe yên spî û paqij de, mîna du perî û melayikan, raketî bûne. Porê Meyro gulî û kezîkirî, simbêlê Bengîn badayî bûye. Li gora gotina siwaran, Bengîn û Meyro bi jahrê mirine. Zalim û malmîratan jahr bi wan dane. De bibihîse, Evdalo, bibihîse, ka zaliman çi bi law û keça me kirine û sêwiyên me ji me girtine... Mezinê êzidiyan, dostê te, Şêx Xelef bi xwe çûye û meyitên Bengîn û Meyro girtine û birine Newala Laleşê û li wir ew veşartine. Niha çiyayê Şengalê reşa xwe girêdaye û li şîna xwe rûniştiye... De ez çi bibêjime, xwe bi kû de bavêjime... Mehrûmo, Evdalo, de destê xwe bavê ber guhê xwe, bistrê û bibêje; royê bigirîne, ewran li hev biqulipîne, baranê bibarîne, agirê li serê malmîratan bibarîne, çiyan li hev bîne û deng û awaz û şîna xwe bi hemû allemê bigihîne...

Evdal bêdeng li Gulê guhdarî dikir. Hezîn û lerizînek bi canê Evdal ketibû. Ew diricifî. Destên wî, di nav destên Gulê de, wekî hêlekanekê, diçûn û dihatin. Hundirê wî dişewitî. Germahiyekê bi ser bedena wî re hatibû. Wî carekê-du caran, xwe livand, hewl da xwe û xwest rabe ser piyan. Lê, digel ku Gulê jî alîkarî lê kir, ew nikarîbû rabûya. Ew, bêgav, li şûna xwe rûnişt. Wî devê xwe vekir û xwest tiştina bibêje, lê peyv û gotin jî, ji devê wî derneke-

tin. Gulê têgihîşt ku halê Evdal, ne tu hal bû. Wê, bi qîrîn, bang li doralî kir,

- Evdalo, Evdalo... zû kin, bilezînin, çend kulav û lehîfan bînin û bavêjin ser Evdal. Evdal ji dest dere, zû bilezînin... lo, lo, Evdalo, sebra ber dilê mino...

Gulê bi Evdal girt û serê wî danî ser çoga xwe. Şênî li serê civiyan. Hinan çend kulav anîn û avêtin ser Evdal û ew baş pêçan. Hê jî, Evdal dixwest tiştina bigota. Lê Gulê devê wî girt, "mepeyive, mehrûmo, mepeyive" got, eniya Evdal paqij kir û enî û rûyê Evdal, hêdî hêdî, mist da û di dewsa Evdal de, wê dest bi gotinê kir û bi dengekî pir nerm û zîz, li ser Evdal, lorand.

Xwendevan û guhdarên ezîz, herwekî hûn dibînin, berbanga wê sibê, berbangeke têkel û têvel bû. Meriv dikarîbû bi zehmetî melayikan ji îblîsan, malavayan ji malmîratan, nûhatiyan ji windabûyiyan, kêfxweşî û bextiyariyê ji xem û keseran veqetandina. Halê rebenê Evdal ne besî wî bû, di ser de, xebera reş bû serbarê wî...

Bêguman, em ê Evdalê Zeynikê di wî halî de neterikînin û wî bi tenê nehêlin. Niha em ê pê re herin û binihêrin ka roya ku di wê berbangê de, hêdî hêdî, hildihat, ê çi nîşanî me de.

# 3
# Ronahiya Rojê û Xweşiya Esmanan

Evdal ji xwe çûbû, heş li serî nemabû. Ma bedena Evdal a kal û jar ê çawan bikaribûya xwe li hember ewçend bûyer û hedîsên giran rabigirta? Di dewsa wî de kevir bûya, kevirê bi keviriya xwe biheliya. Çavên wî vekirî, li erdê dirêjkirî û serê wî li ser çoga Gulê, Evdal hêdî hêdî nefes digirt û dida. Taqet û quwet di can û bedena wî de nemabû. Çavên wî ketibûn kortê, rûyê wî yê qermiçî bi qasî kulmekê mabû. Ji ber deng, gotin û stranan, lêvên wî terikîbûn û qelişîbûn. Simbêl û rîha wî dirêj bûbû û wekî pembû spî bû. Enî, rû û binçavên wî bi qermîçokan tijî bû. Reh û damarên wî di bin çermê tenik de xuyabûn.... Wexta kambax, bi her awayî, şopên xwe li ser rû û bedena wî berdabûn.

Destê Gulê, hêdî hêdî, li ser enî û rûyê Evdal digeriya û Gulê, bi hêdîka, jê re dinehwirand. Şagirt, heval û dostên Evdal û xelk, hinekî jê bi dûr, rûniştibûn û bi dilekî zîz û rûyekî bi endîşe, li Evdal dinihêrîn û nifir li Egîd Begê xwînrêj dibarandin. Jin û pîrejin jî, hêdî hêdî, hêstir dirijandin.

Bêyî Gulê, çend kesên din jî li ser Evdal bûn. Gundiyekî lezandibû û ji konan, şîr û mast anîbû. Gulê, pêşî, xwest tasa şîr bixe devê Evdal. Lê wî devê xwe pê nexist. Paşê Gulê tasa mast ber bi devê wî kir, wî devê xwe vekir û çend dilop mast daqultandin. Gulê hêdî hêdî mast dayê heta wî hemû tas vexwar. Ro bi qasî bihustekê-du bihustan hilatibû. Hawirdor bi tîrêjên royê dibiriqî. Taya royê li ser rûyê Evdal dixist û simbêl û rîha wî dibiriqand. Di bin taya royê de, rûyê wî bûbû rûyekî nûranî. Niha hezîn û lerizîna wî, hinekî, daketibû. Wî bi awayekî sakîn, rehet û bêdeng li Gulê û li dengên din guhdarî dikir. Welê dixuya ku ew hinekî bi ser xwe de dihat.

Bi dû bîskekê re, wî destên xwe ji bin kulavan derxistin û destê Gulê girt û ew danî ser sînga xwe. Dev û lêvên wî, bi hêdîka, liviyan û wî pir bi giranî weha got,

- Gulê... mehrûmê... te dît... heş û bedena min jî xayintî li min kir. Dinya ye, Gulê, dinya ye. Heta min can û laşê xwe nas kir, umrê xwe xelas kir...

Gulê û kesên din ên ku li serê bûn, nedixwestin ew bipeyiviya. Peyv bi zehmetî ji devê wî derdiketin. Rûyê wî reng guherîbû, gewrî û qirika wî vekişîbû. Gulê destê xwe, bi hêdîka, da ser devê wî û jê re got,

- Evdalo, dewlemendiya dilê mino... de xwe rabigire, dengê xwe bibire, hinekî îstirihet bike, bîhna xwe bide û rakeve. Gotinên te, jixwe, her li ber guhê me ne. Gava tu hişyar bûyî, dîsan, gotinên xwe bibêje.

Evdal destê Gulê guvişand, serê xwe hinekî bilind kir, zimanê xwe li ser lêvên xwe gerand û qiseyên wê birîn.

- Gulê, mehrûma minê... hêz û quweta min dengê min e, îsreheta min kilam û stranên min e. Bi xêra

stranan can germ e, ruh nerm e, dil berdewam e. Gava deng ji min dernekeve, strana min xwe bi dil û canan negihîne, hingê ruh ê ji can derbe, min biterikîne... Gula minê... hêvî di ser her tiştî re ye. Hêvî her gav, li her warî, digel her tiştî, hebûna min e. Kiretî pir e, nizmahî, biçûkahî, xirabî bêpayan e. Şûr û dermanê wan bawerî û hêvî ye...

Li wê derê, Evdal gotina xwe birî, bîhna wî, dîsan, çikiya. Wî hinekî din mast xwest. Gulê taseke din mast dayê û bi dû mast re, enî û rûyê wî, bi ava sar şuşt. Hingê Evdal çavên xwe girtin û di xew re çû. Gulê û hevalên Evdal, bêdeng, li hev nihêrîn. Wan bawer dikir ku Evdalê ku xewa şevan jê re bûbû heram, ê niha biketa nav xewa şêrîn. Lê piştî bîskekê, Evdal dîsan xwe livand û bi destê xwe, li destê Gulê geriya. Wî çavên xwe venekirin. Jixwe, çavên wî vekirî yan girtî bûna, tiştekî nediguherî. Dinya wî, bi tenê, yek bû; tariya şevê. Ev rastî dê çawan biguheriya? Gulê jê re got,

- Evdalo... de dengê xwe meke û rakeve, her tiştî ji bîr bike û rakeve. Wext li ber me pir e, zeman li me fireh e. Gava tu hişyar bûyî, em dipeyivine...

Evdal gotina Gulê, dîsan, birî,

- Gulê, mehrûmê... wext ne wexta razan û xewan e. Miriyên me hene, şîna me li benda me ye. Wext, wexta girêdana reşa şînê ye. Em divê li şîna xwe rûnine û Bengîn û Tavbanûyê di mezelên wan de sêwî û stûxwar nehêline. Kesê ku li şîna xwe rûnene, qedr û qîmeta miriyên xwe negire, ne mirov e û ne kurd e. Tavbanû û Bengînê siûdxirab çûne diyarê rehmetê, serê xwe danîne ser axa gorane... Gulê, Gulê, wey li minê, Gulê... Ew ji kîsê me û kurdan çûne. Gulê, bextreşê... Min niha tikane ji te hene. Şîna Bengîn û Tavbanûya me divê şîneke bêpayan be ku kesî hê nedîtiye... U dilê min dibê, bi dû şînê re, ez ê jî bidim pey wan û çavên xwe bigiri-

me. Lê niha şîn e, reş şîn e. De tu rabe û xwe bi konê Temo û Zînê bigihîne û Temo û lawê wî, bi xwe re, bîne...

Li ser gotina Evdal, Gulê û çend pîrejin, bi hev re çûn û Temo û lawê wî yê nûbûyî, wergirtin û anîn cem Evdal. Zarok digiriya û dikir qîrîn. Temo, rû bi ken, li dora xwe dinihêrî. Evdal pişta xwe dabû ber kevirekî û rûniştibû. Gulê zarok anî û da Evdal. Evdal ew hembêz kir, lê xwar bû, ew bîhn kir, destekî xwe li ser rûyê zarok gerand û ji rû û eniya wî maç kir.

- Xwedayo, bîhna zayin û jînê ji lêwik difûre, Evdal got. Bîhn e, xweş bîhn e, nîşana tevgera dinê, hewalê merivan e. Xwedayo, ev çi îş e? Işê te ne îşê aqilan e. Li milekî tu zarokekî didî me, li milekî tu zarokên me ji me digirî, xezeba te li ser me ye. Ro hilatiye, li her kesî hilatiye, lê li me hilnehatiye... Ev çi dewr e, ev çi dewran e!.. Temo, lawo, bila siheta te xweş, ger û tevgera te bi heş be. Li min baş guhdarî bike. Gulê, mehrûmê, hevalno, dostino, şagirtino, qedirgirino... Hûn bi çavan dibînin, bi guhan dibihîsin. Bengîn çûye, Bengîn hatiye. Ro ava çûye, ro hilatiye. Bengîn binax e, Bengîn li cem me, li serê Sîpanê Xelatê ye. Bengîn mir, Bengîn vejiya... Eger we jî, mîna min, dil û daxwaz hebe û qebûl be, min navê vî mehrûmî, lawê Temo û Zînê, torinê min û Gulê, Bengîn lêkiriye. Bi hêviya ku ew li ser şopa Bengîn be, mîna wî jîr û zane, zirav û tenik, delal û çeleng, qedirgir û hurmetkar be... û tola Bengîn û axîna Tavbanûyê li erdê nehêle.

Gotina Evdal li gora dilê civatê bû. Gulê û civatê, bi dengekî û bi qîrîn, gotin,

- Gotina te ye. Navê lawê Temo Bengîn e. Bengîn namire. Bengîn û Meyro dijîne. Bengîn namire... Bengîn nemir e.

Gulê zarok ji hembêza Evdal wergirt, ji çavên wî ramûsîn û paşê zarok da kalemêrê kêleka xwe. Kalemêr jî eynî tişt kir, ji enîya lêwik maç kir û ew da jina kêleka xwe. Jinikê jî, eynî tişt kir. Herweha Bengînê biçûk li ser destan geriya, ji hembêzê çû hembêzê. Ev tişt di nav bêdengiyeke boş de hate pê. Ji deng û qîrîna Bengînê nûhatî pê ve, tu deng dernediket. Wekî ku civat û şênî di nav tevgereke dînî de bû. Bêdengî pêl bi pêl fireh bû. Bi vî awayî, xelkê zarok bi diya wî, Zînê, gîhandin. Bêdengiya civat û şêniyên Sîpanê Xelatê hawirdor jî dabû ber xwe. Ro, bêdeng, hildihat. Dar û ber, bêdeng, bi hêdîka, dilivîn. Bayê sibê, bêdeng, radibû. Quling, bêdeng, li kêleka Evdal, nikulê xwe li erdê dida. Şînê dest pê kiribû.

Evdal perda bêdengiyê dîsan xira kir,

- Hevalno... adet û ûsil, tarîx û zeman singê konê milet û welatan e. Bêbext û telaqreş dijminê vî tiştî ne. Xelkê ku li vî tiştî xwedî derkeve, rûgeş e, xelkê ku lê xwedî dernekeve, rûreş e. Bila rûreşî ji me dûr, rûgeşî amanca me be. Li welatê me adet e, di destana Memê Alan de lê bûye, şîn bi darê şînê heye. Darê şînê dixemile û xelk li şînê rûdine. Loma, de xwe bilezînine, daran jêbikine, bi rengên kesk, sor û zer û rengê reş bixemilînine... û hûn xortino, bengînên welatê mino... hûn jî hespan hazir bikine, taximan li hespan xînine, darê şînê bi destê xwe bigirine û heta ro tê û li ser serê me disekine, hespan li ser û doraliyên Sîpanê Xelatê bi xar dine, piştî ku ro di ser me re qulipî, hûn, bi darê şînê, xwe bi deştê berdine û reşa me, hawara dilê me bi welêt û allemê bigihînine...

Piştî peyivîna Evdal, tevgerek kete nav civatê. Haho û girînê dest pê kir. Hin ji xelkê, kom bi kom, bi hin aliyan de çûn. Hinan li bin daran, li kêleka

kahniyê cîh û war hazir kirin û cil û kulav lê raxistin. Pîrejinan gotin li gotin, bûyer li bûyer zêde kirin û hahoya şînê bi esman gîhandin. Dengbêj û stranbêjan dest bi stranên şînê kirin. Xort ber bi jêr çûn, alif û av dan hespan, ew hazir kirin, taxim lê xistin...

Gulê, Temo, çend hevalê Evdal û quling li ser serê Evdal bûn. Gulê cilekî li hev pêçandibû û li paşla Evdal danîbû. Evdal bêhal bû. Wî hinekî din mast vexwar û pariyek nan xwar. Wî ji dostê xwe yê kêlekê xwest ku ew jê re li bilûrê xwe. Dostê wî, giran giran, li bilûrê xist. Dengekî zîz, melûl û dirêj ji bilûrê rabû û li dengan zêde bû. Dostê wî, bi bilûrê, ahenga şînê lêxist. Dengê bilûrê hê xelas nebûbû, Evdal serê xwe rakir, rûyê xwe ber bi tavê kir û got,

- Gulê, mehrûmê... dengê Sîpanê Xelatê di mêjiyê min de olan dide, rehm û qudreta Sîpanê Xelatê di hundirê min de pêl dide. Çavên min dêşine, gewriya min zuha bûye, dengê min ketiye û şevereşa min cîh li min teng kiriye. Dilê min dibê, tu û hevalên vir min bi kevir û zinarê herî bilind ê Sîpanê Xelatê bigihînine da ku li wir, ronahiya tavê û germiya royê li rûyê min xîne û ez, ji wir, dengê xwe yê ketî li hemû welêt bigihînime. De rabe, tu û hevalên vir çêyiyeke din bi min bikine... û quling jî bi xwe re bînine.

- Evdalo, bêhalo... tu qey fahm nakî, tu bêhal î, Gulê got. Tu nikarî ji cîhê xwe rabî û xwe bi derina bigihînî.

- Gulê, mehrûmê... Evdal got û lê vegerand, li min beyan bûye; ez divê bi kevirê bilintirîn hilkişime û bi hemû hêz û quweta xwe li ser siûda me stranan bibêjime. Eger mirina min bi dilê we ye, fermo, min mebine... ez divê, her çi jî be, xwe bi cîhê bilintirîn bigihînime...

Çare nîn bû, wan ê Evdal bibirana. Gulê kete bin milekî wî, dostekî wî kete bin milekî wî, bi hev re, ew hêdî hêdî, ber bi bilindahiya Sîpanê Xelatê hilkişiyan. Temo jî, quling li hembêzê, da pey wan. Gava ku ew gîhan bilindahiyê, êdî hal di Evdal de nemabû û nefes, bi temamî, lê çikiyabû. Wan ew, li wir, li ser kulavekî, dirêj kirin û Gulê, dîsan, rûnişt û serê Evdal danî ser çoga xwe.

Cîh teht bû, li serê tu hêşinahî nîn bû û bi qasî gola serê Sîpanê fireh bû û warê teyrên mezin bû. Ji wê derê, her alî dixuya û li bin lingan bû; ava Miradê pihêt diherikî, rê û xaçerê diketine nav hev û li dûr, pir dûr winda dibûn, gund mîna keviren xîç dixuyan û deşt, deşta bêser û bêber, hêşîn dikir. U ro û tava royê, li ber wan bû û mîna agirekî çîkî sor dişewitî û dibiriqî. Ro, niha, bi qasî çend bihustên din, hilatibû û hawirdor, bi ronahiya xwe, vegirtibû. Li serê dinyayê, kesî hê bergeheke weha xweş, weha aram, weha lihevhatî, weha rengîn û weha germ nedîtibû. Xweşiya hemû dinê li wir bû û li ber çavan bû.

Lê çavên Evdal ev xweşî nedidît. Çavên wî vekirîbûn, lê dinya wî kor bû. Piştî bîskekê, wî, bi hêdîka, xwe livand, destê xwe da ser çoga Gulê û rabû, rûnişt. Tava royê rûyê wî germ kir. Quling jî xwe livand û qîre qîr kir. Li wir, tava royê û bayê sibê diketin nav hev û Evdal û yên din vedijandin. Evdal ji Temo xwest ku ew quling bidiyê. Quling nedihewiya û deng dida. Wî hewl dida perwazan jî, lê her di hembêza Evdal de dima. Evdal hêdî hêdî serê xwe zivirand û li dora xwe nihêrî wekî ku wî tava royê didît û bayê sibê hîs dikir... Guhê wî li ser dengan bû. Refekî teyran, bi wîçewîç, di ser serê wan re firiya. Jinekê ji nav koma jinan navê Meyro, çend car, got û nalîna şînê dirêj kir. Ji jêrê,

ji aliyê konan, hîrehîr bi hespan ket. Çend zarok, bi qîrîn, giriyan. Dengbêjekî ji dengbêjan navê Evdal bi lêv kir û got, "malmîratê Egîd Begê dimire, Evdal dimîne." Ji jêr, xuşîna ava Miradê xwe gîhand dengê dengbêj.

Wext hatibû.

Evdal destê xwe bir ber guhê xwe û bi hêdîka dest bi stranê kir...

*Lê... lê... lê...*

Bi gotina stranê û bilindbûna dengê, gewriya Evdal vebû, hilm û nefesa wî vebû. Wî rûyê xwe û çavên xwe ber bi royê û tîrêjên tavê kir û got...

Bi strana wî, dengbêjên din sekinîn, pîrejinan dengê xwe birîn, xortên ku li ser hespan bûn, serê xwe dirêj kirin û ber bi dengê Evdal zivirîn. Dengê Evdal, dîsan, doralî vegirtibû, pêl bi pêl, xwe bi her derî gîhandibû; rawir hişyar kiribûn, teyr firandibûn, dengê bilbil û şalûran biribû, dar û ber û giya livandibû, av û kahnî bi pêlan rakiribû.

Çerxa felekê jî, li Evdal hukim nekiribû. Heyecan, coş û kela Evdal rabûbû, Evdal hişyar bûbû, ji nû ve, xwe dîtibû, dengê xwe peyda kiribû.

Dengê Evdal li ser Sîpanê Xelatê, li nav zinar û çiyan, di bin gelî û newalan de, li seranserê deşta ku li ber lingan, olan dida. Deng, pêl bi pêl, helqe bi helqe, fireh dibû, bilind dibû û xurttir dibû. Herkes şaş mabû, Evdalê ku li ber mirinê bû, niha, bi dengê xwe, mirî ji qebr û goran radikir.

Evdal bi stranê re çûbû. Ew çûbû diyarekî din, dinyayeke din. Li jorê, li bilintirîn cîhê Sîpanê Xelatê, Evdal diherikî. Li jêrê, li ber lingê Sîpanê Xelatê, av û kahnî diherikî. Roya ku li hember Evdal bû, firehtir, sortir, germtir dibû. Germahiye-

ke boş bi ser Evdal re hatibû, reh û damarên wî fireh bûbûn. Dilopên xwîdanê li ser eniya wî, rûyê wî, qirika wî, canê wî civiyabû. Xwîdan jê diçû. Destê wî radibû... Ew bi firê ketibû, ew li ser ewran bû. Ew heft qat li ser esmanan bû. Bask û perwazên wî û qulingê şîn hatibûn û ew bi hev re firiyabûn.

Ew Evdalê ku bi qasî kulmekê mabû, niha bûbû ferişte. Sîpanê Xelatê bûbû gewriya wî, deşt bûbû devê wî, lehî bûbû dengê wî. Ew bêhed û bêhudûd, mezin bûbû.

Guhdar û xwendevanên delal, ew ecêba ku niha mesela çîroka me ye, ew ecêba giran, hingê, li wê derê, li spêda welatê Kurdistanê û li serê çiyayê Sîpanê Xelatê qewimî; şevereşa Evdal winda bû, perda taritiyê qelişî, bextê reş lê qulipî... Çavên Evdal vebûn... Pêşî, bi qasî misteke ronahî bi çavên wî ket. Wî pê bawer nebû. Bi wî welê bû ku germahiya canê wî leylan lê didayê. Lê paşê, ronahî hêdî hêdî firehtir, kûrtir û xurttir bû. Tariya şevê çû, şewq û ronahiyê çavên wî tijî kirin. Niha her der, hawirdor di nav şewq û ronahiyeke ecêb de bû...Her alî ronî bû, her cîh spî bû. Ronahî pêl bi pêl bi ser Evdal re dihat. Evdal newêrîbû çavên xwe bigirta. Evdal ditirsiya xwe bilivîne û bizivirîne. Wî her li hember xwe, li ronahiya royê dinihêrî û stran digot.

Kesî fahm nedikir ka çi dibû. Evdal ji xwe nedizivirand. Dengê Evdal her kes mat û sersem kiribû. Evdal, niha, stran qulipandibû ser ronahiya tavê û roniya çavan. Ronahiyê zora reşahiyê biribû. Hingê Gulê û doralî fahm kirin ka çi diqewimî. Hingê Gulê da tilîlî û çepikan. Hingê heval û dost li Evdal civiyan û ew hembêz kirin. Hingê Evdal got,

- Ronahî ye, xweş ronahî ye. Ji ronahiyê xweştir tiştekî nîn e. Gelî hevalan... bi dinê û allemê

bigihînine, ronahiyê zora tariyê biriye û şewqê reşahiya şevan bi şûn de xistiye.

Lê belê, hê tiştine hebûn... Ecêba giran, bi tenê, bi ronahiya royê û bi vebûna çavên Evdal nediqediya. Quling jî dest pê kiribû û xwe dilivand. Wî pihêt, pir pihêt, dida bask û perwazan... Gulê û heval hê bi Evdal re dipeyivîn, ji nişkekê ve, tiştekî din qewimî; quling dest bi firînê kir... Quling difiriya. Quling dida perwazan. Baskên quling cebirîbûn. Quling dixwend û difiriya û Evdal jî, bi çavan, lê dinihêrî...

Ew tişt, ku li Evdal beyan bûbû, niha, qewimîbû. Ronahî li Evdal vegerîbû, bask li qulingê şîn hatibû. Evdal dida çepikan û li quling dinihêrî. Quling li ser serê Evdal difiriya. Ew ber bi jêr û ber bi jor dibû, li ser teht dizivirî. Paşê, ew ber bi esmanan firiya, çend car li wê derê, zivirî û doş bû û ji wir jî, wî berê xwe da civatê û şînê.

Gava ew bi civata şînê gihîşt, ew nizm bû û di ser civatê re firiya. Xelk û şênî, bi ecêbî, li jor nihêrîn. Qulingê ku difiriya, qulingê birîndar û baskşikestî bû... Xwedayo, baskên wî cebirîbûn! Ew difiriya û dida bask û perwazan!..

Piştî ku quling, bi dirêjahiya bîskekê, li ser civatê firiya, ew, dîsan, ber bi jor bû. Niha ew li ser golê, gola spî difiriya. Ew baş, pir baş, ber bi jor bû û ji wir, ji nişkekê ve, xwe bera jêr da û hate, noqî ava golê bû. Çend car weha, ew ber bi jor bû û hate, noqî avê bû... Avê pêl da. Pêlên avê xwe bi civatê gîhandin. Xelk û şênî rabûn ser piyan û li vê ecebê nihêrîn û bi ava golê ku pir sar bû, dest û rûyê xwe şuştin.

Quling, ji wir jî, dîsan, ber bi Evdal firiya û hate li ser serê Evdal zivirî û kir qîrîn... Evdal dikeniya... Gulê dikeniya... Temo dikeniya û li çepikan

dida... Dost û heval dikeniyan... Xelk û şênî dikeniyan... Quling jî, bi qîreqîr, difiriya.

Quling firiya. Ew bi qasî xwe û têra xwe firiya. Û paşê, ew li Evdal zivirî û xwe li Evdal girt û hate li ser çoga wî venişt... Evdal dikeniya... Gulê dikeniya. Temo dikeniya... Xelk û şênî dikeniyan...

Herçî em in, ji me re jî hew gotin ma...

PIRTÛKEN ME YÊN KU DERKETINE

* *A.S. Pûşkîn* / KEÇA KAPİTAN/Roman
* *A.P. Çêxov* / MIRINA KARMEND/Novel
* *Hesenê Metê* (Nivisende) / ARDÛ /Ji çîrokên gelêrî
* *Redwanê Alî* / TILÛRÊ BÊGANE/Novel
* *Hesenê Metê* / SMIRNOFF/Novel
* *Mûsa Anter* / HATIRALARIM/Bîranîn


***

PIRTÛKÊN ME YÊN KU DERKEVIN

* *F. Dostoyevskî* / MERIVÊN REBEN/Roman
* *Heinrich Böll* / HERIMANDINA JIYANA KATHARINA BLUM/Roman

Adresa xwestinê:
**Weşanên Welat**
*c/o KFH, Box: 4088*
*141 04 Huddinge/Swêd*

WÊŞANÊN WELAT



Îro li dunyayê tiştê herî dijwar kurdbûyîn e
û em jî wê dixwazin...

...